



# Kurdiyat



e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2024 Sayı/Hejmar/Issue: 9

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>





Year/Sal/Yıl: 2024, Issue/Hejmar/Sayı: 9  
e-ISSN: 2717-8315

Kurdiyat is an international scientific peer-reviewed journal  
Kurdiyat kovareke navneteweyî, zanistî ya bihekem e  
Kurdiyat uluslararası bilimsel hakemli bir dergidir

### Period | Peryod | Periyod

Biannually, June and December  
Salê du hejmar, Hezîran û Kanûna Pêşîn  
Yılda iki sayı, Haziran ve Aralık

### Scope | Vegirî | Kapsam

Kurdish Language, Culture, Literature, History and Art  
Ziman, Çand, Wêje, Dîrok û Hunera Kurdî  
Kürt Dili, Kùltürü, Edebiyatı, Tarihi ve Sanatı

### Language Publication | Zimanê Weşanê | Yayın Dili

Kurdî • English • فارسی • عربي • Türkçe

Articles should include a title, abstract (250-450 words), keywords (at least 5 concepts) in at least two languages, especially Kurdish and English, and should be prepared in accordance with APA 6 citation system.

Gotar divê sernavê, kurteyê (250-450 peyv) û peyvên sereke (herî kême 5 têgeh) bihewîne ku ew kême bi du zimanan bê nivîsîn, bi taybetî jî kurdî û inglîzî, herwiha gotar divê li gorî sîstema jêderan a APA 6ê bê amadekirin.

Makaleler Kürtçe ve İngilizce başta olmak üzere en az iki dilde başlık, özet (250-450 kelime), anahtar kelimeler (en az 5 kavram) içerir ve APA 6 atf sistemine uygun olarak hazırlanır.

### Executive Office | Rêvebirî | Yönetim Yeri ve Adresi

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van  
e-mail: kurdiyat@yyu.edu.tr | web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdiyat>  
Tlf: 04322251452 | Fax: 04322251228

### Design | Rûpelsazî | Dizgi

Öğr. Gör. Erdal YILDIZ | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-5285-3492 | [erdalyildiz@yyu.edu.tr](mailto:erdalyildiz@yyu.edu.tr)

### Abstracting and Indexing Services | Dizinlenme ve Kataloglama Bilgileri

DRJI, ACARINDEX, Index of Academic Documents, Academic Resource Index (ResearchBib), ASOS, EuroPub, OpenAIRE, Google Scholar, Idealongline, İSAM, ResearchGate.



### Publication Date | Tarîxa Weşanê | Yayın Tarihi

June 2024 · Hezîran 2024 · Haziran 2024

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

**Publisher | Weşanger | Yayıncı**

Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages  
Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl Enstîtuya Zimanên Jîndar  
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü

**Owner | Xwedî | Sahibi**

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-6887-6223 | atimurtas@yyu.edu.tr

**Editor in Chief | Edîtor | Editör**

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-2602-484X | yakupaykac@yyu.edu.tr

**Field Editor Board | Edîtorên Biwarî | Alan Editörleri**

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-4621-435X | hozdas@yyu.edu.tr

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0002-6315-6075 | nesimsonmez@yyu.edu.tr

Dr. Öğr. Üye. Ömer DELİKAYA, Bingöl Üniversitesi  
ORCID: 0000-0001-6505-5107 | odelikaya@bingol.edu.tr

Dr. Ziyattin YILDIRIMÇAKAR, Mardin Artuklu  
ORCID: 0000-0003-4809-511X | ziyayildirim@artuklu.edu.tr

**Language Editors | Edîtorên Zimanî | Dil Editörleri**

Dr. Nevzat AĞÇAKAYA, Arş. Gör., Van YYÜ (English)  
ORCID: 0000-0002-4606-9279 | nagcky@yyu.edu.tr

Dr. Sinan ÇAKAR, Arş. Gör., Van YYÜ (Persian)  
ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr

Dr. Mahmoud ALNAFFAR, Öğr. Gör., Van YYÜ (Arabic)  
ORCID: 0000-0001-8044-3685 | mahmoudalnaffar@yyu.edu.tr

Sami ÇELİKTAŞ, Doktora, Bingöl Üniversitesi (English)  
ORCID: 0009-0005-3190-7179 | samihezil@hotmail.com

**Writing Editors | Edîtorên Rastnivîsê | Yazım Editörleri**

Dr. Mehmet Nur YAVUZER, MEB/Van  
ORCID: 0000-0002-5648-5743 | mehmetroniyavuzer@gmail.com

**Final Reading | Xwendina Dawî | Son Okuma**

Mehmet YILDIRIMÇAKAR, Doktora, Bingöl Üniversitesi,  
ORCID: 0000-0003-3565-1156 | mehmetyildirimcakar@gmail.com

**Sekretariat | Sekreterî | Sekreteryâ**

Hacı YILMAZ, Öğr. Gör., Van YYÜ  
ORCID: 0000-0003-4034-8565 | haciyilmaz@yyu.edu.tr

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'nün bilimsel bir yayım organı olan Kurdiyat, uluslararası hakemli bir dergi olup yılda iki sayı (Haziran- Aralık) olarak yayımlanır. Dergide Kürt dili, kültürü, edebiyatı, tarihi ve sanatı alanlarında akademik nitelik taşıyan ve Türkçe, Kürtçe, İngilizce, Arapça ve Farsça dillerinde yazılan bilimsel çalışmalara yer verilir. Kurdiyat'da yayınlanan makalelerin içeriğinden yazarları sorumludur.

### Editorial Board | Lijneya Weşanê | Yayın Kurulu

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-6887-6223 | atimurtas@yyu.edu.tr

Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN | Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0003-3519-9892 | zahirertekin@hotmail.com

Prof. Dr. Mehmet Salih GECİT | Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-7212-2291 | msgecit@agri.edu.com

Prof. Dr. Serdar ŞENGÜL | Kırşehir Ahi Evran Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0003-4709-3745 | serdar.sengul@ahievran.edu.tr

Prof. Dr. Tahirhan AYDIN | Dicle Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-2586-2956 | tahirhan.aydin@dicle.edu.tr

Doç. Dr. Bakhtiar SADJADI | University of Kurdistan, Iran  
ORCID: 0000-0002-6483-5803 | b.sajadi@uok.ac.ir

Doç. Dr. Kemal KAYA | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-8797-5980 | kemalkaya@yyu.edu.tr

Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0003-1856-6494 | mahmutlardan@hotmail.com

Dr. Hewa Salam KHALID | Indiana University, USA  
ORCID: 0000-0003-4513-6596 | hewasalam@gmail.com

Dr. Nevzat AĞÇAKAYA | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-4606-9279 | nagcky@yyu.edu.tr

### Advisory Board | Lijneya Şêwrê | Danışma Kurulu

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK | Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0002-9124-1605 | abdurrahmanadak@artuklu.edu.tr

Prof. Dr. Abdullah KIRAN | Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-9136-7665 | a.kiran@alparslan.edu.tr

Prof. Dr. Farouk ISMAEL | Universität Hamburg, Germany  
ORCID: 0000-0002-0574-6050 | farouk.ismail@fu-berlin.de

Prof. Dr. Halit DEMİR | Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-5598-2601 | halitdemir@yyu.edu.tr

Prof. Dr. Hayrullah ACAR | Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0001-5263-7765 | hayrullahacar@artuklu.edu.tr

Prof. Dr. Mustafa ÖZTÜRK | Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye  
ORCID: 0000-0003-0637-8760 | mustafaozturk@artuklu.edu.tr

*Kurdiyat, which is a scientific publication of Van Yüzüncü Yıl University, Institute of Living Languages, is an international refereed journal and is published twice a year (June - December). The journal includes scholarly works in the fields of Kurdish language, culture, literature, history and art written in Kurdish, Turkish, English, Arabic and Persian. The authors are responsible for the content of the articles published in Kurdiyat.*

## Contents/Naverok/İçindekiler

### Research Articles | Gotarên Lêkolînê | Araştırma Makaleleri

- 1- **DESTPÊKEK JI BO ŞÊWAZÊ DI LÊKOLÎNÊN EDEBÎ YÊN KURDÎ DE**  
*An Introduction to Style in Kurdish Literary Studies*  
*Kürt Edebiyatı Çalışmalarında Üsluba Giriş Denemesi*  
**Şerif GÜZEL & Hemin Omar AHMAD** **5-24**
- 2- **KIRDEYA HOŞDARİKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA**  
*The Fact of Admonition in Proverbs*  
*Atasözlerinde Uyarı Eylemleri*  
**Araz Khalaf AMO** **25-38**
- 3- **KARWAN, EŞÎR û BAZINBELEK: NÊRÎNEK LI VARYANTÊN FILÎTÊ QUTO**  
*Caravan, Tribe and Rifle: An Overview of the Variants of Filîtê Quto*  
*Kervan, Aşiret ve Tüfek: Filîtê Quto'nun Varyantlarına Bir Bakış*  
**Tarık YORĞUN** **39-76**
- 4- **بنية الأسلوب والعاطفة في قصة "ممو زين" للبوطي**  
*The Structure of Style and Emotion in The Story "Mam And Zein" by al-Bouti*  
*Avahîsazîya Şêwaz û Hestan li Çîroka "Mem û Zîn" a el-Botî*  
**Hasan MORAD** **77-94**
- 5- **رەخنەى رەخنەى كۆمه‌لایه‌تى له شیعری كوردیدا (پاشكۆى رەخنەى چاودیر به‌نمونه)**  
*Criticism of Social Criticism in Kurdish Poetry (The Appendix of Chawder as an Example)*  
*Kürtçe Şiirde Toplumsal Eleştirinin Eleştirisi (Çawder Eki Örneği)*  
**Mohammed Omar IBRAHIM & Hemin Omar AHMAD** **95-112**

### Symposium Review | Nirxandina Sempozyûmê | Sempozyum Değerlendirmesi

- 6- **V. SEMPOZYÛMA NAVNETEWYÎ YA KURDIYATÊ**  
**MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ & ALEKSANDRE AUGUSTE JABA û MÎRASA WAN**  
*5<sup>th</sup> International Kurdiyat Symposium Mullah Mahmoud Bazîdî & August Kśociésza-Żaba and Their Legacy*  
*Uluslararası V. Kurdiyat Sempozyumu Molla Mahmûd-i Bayezîdî & Aleksandre Auguste Jaba ve Mirası*  
**Sinan ÇAKAR** **113-120**



# DESTPÊKEK JI BO ŞÊWAZÊ DI LÊKOLÎNÊN EDEBÎ YÊN KURDÎ DE

Şerif GÜZEL & Hemin Omar AHMAD

## Kürt Edebiyatı Çalışmalarında Üsluba Giriş Denemesi An Introduction to Style in Kurdish Literary Studies

### Şerif GÜZEL

ORCID: 0000-0003-3837-3155 | serifguzel@bingol.edu.tr  
Lecturer, Faculty of Arts and Sciences, Oriental Languages  
and Literature, Bingöl University, Türkiye.

Hemin Omar AHMAD | ORCID: 0000-0003-1985-9512 |  
heminaahmad40@gmail.com  
Associate Professor, Institute of Living Languages, Depart-  
ment of Kurdish Language and Literature, Bingöl University,  
Türkiye.

### Citation/Jêgir/Atîf:

Güzel, Ş. & Ahmad, H. O. (2024). Destpêkek ji bo şêwazê  
di lêkolînên edebî yên kurdî de. Kurdiyat (9), 5-24. DOI:  
10.55118/kurdiyat.1461410

### Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 29.03.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 13.06.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi:  
30.06.2024

### Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

### Reviewing and Plagiarism/Nirxandin û İntihal:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism  
website./ Ev gotar di malpera İntihalê ya iThenticate ra hati-  
ye derbaskirin. / Bu makale iThenticate adlı İntihal sitesinde  
taranmıştır.

### Ethical Statement/Beyana Etîk/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been  
followed while carrying out and writing this study and that  
all the sources used have been properly cited./ Hatîye be-  
yankirin ku di pêkanî û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên  
zanîstî û etîk hatîne şopandin û hemû çavkanî bi awayekî  
têkûz hatîne referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılır-  
ken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kay-  
naklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

### Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any  
parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti  
alîyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile maka-  
lede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması  
bulunmamaktadır.

### Grant Support/Alîkarîya Darayî/Maddî Destek:

The authors acknowledge that they received no external  
funding in support of this research./ Nivîskar beyan dîke  
ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./  
Yazarlar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış  
fon almadıklarını kabul etmektedirler.

### Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their  
work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsan-  
sa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./  
Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında  
lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

\* Ev xebat bîngeha xwe ji teza doktorayê ya bi navê Şêwaza Helbesta Berken Berehî werdigire.

## Kurte

Di vê gotarê de pênase û giringiya şêwazê û lêkolînên girêdayî wê di wêjeya kurdî de hatine lêkolîn kirin. Şêwaz ji hêmanên wekî awayê bikaranîna ziman, şeweya vegotinê û vegotina hestan a nivîskar pêk tê. Di vê çarçoveyê de şêwaz pêk tê ji wan alav û teknîkan ku nivîskar ji bo afirandina nivîsa xwe bi kar tîne, wekî bijartina peyvan, bikaranîna rêzimanê, ristesazî û deng. Bi saya van alav û teknîkan nivîskar an jî vegêr vegêraneke şexsî û taybet dide berhem û vegotina xwe. Ev gotar hewl dide ku pênaseyên cuda yên şêwazê ragihîne û bide zanîn ka di wêjeya kurdî de li ser şêwazê çi lêkolîn hatine kirin. Bi vî awayî gotar dixwaze balê bikişîne ser cih, wate û bandora şêwazê di edebiyata kurdî de. Rewşa edebiyata kurdiya kurmancî û giringiya lêkolînên li ser wê ji hêla şêwazê ve çarçoveya vê xebatê diyar dike. Digel wê ev gotar bi kurtî behsa dîroka şêwazê jî dike. Helbet di çarçoveya teng de em dê li ser xebatên akademîk û zanistî yên li bakur rawestin. Di encama vê xebatê de jî dê îşaret pê bike ku şêwaz yek ji hêmanên bingehîn ên wêjeyê ye û vegêrana taybet a nivîskar nîşan dide. Her wiha gotar ji bo lêkolînên siberojê pêşniyazan xwe jî pêşkêş dike.

**Peyvên Sereke:** Ziman, Edebiyata Kurdî/Kurmancî, Helbest, Şêwaz, Dîroka şêwazê.

## Özet

Bu makalede, edebiyatta üslubun tanımı, önemi ve Kürt edebiyatındaki ilgili çalışmalar incelenmektedir. Üslup, bir yazarın dili kullanma biçimi, anlatım biçimi ve duygu aktarımı gibi öğelerden oluşur. Bu bağlamda üslup bir yazarın metnini oluşturmak için kullandığı kelime seçimi, dilbilgisi kullanımı, cümle bilgisi ve ses gibi unsurlardan oluşan araçların ve tekniklerin tümüdür. Yazar ya da anlatıcı bu araç ve teknikler sayesinde eserine ve anlatısına has bir üslup oluşturur. Makalede, üslubun farklı tanımları sunulmakta ve Kürtçe'deki ilgili literatur incelenmektedir. Bu şekilde makale, üslubun Kürt edebiyatındaki yeri, anlamı ve etkisine dikkat çekmek istemektedir. Kürtçe/Kurmancî edebiyatının üslup açısından durumu ve üzerinde yapılan araştırmaların önemi bu çalışmanın kapsamını belirlemektedir. Ayrıca bu makalede üslubun tarihçesi kısaca ele alınmaktadır. Bu anlamda çalışma sadece Kuzey'deki akademik ve bilimsel faaliyetlere yönelmektedir. Bu çalışma sonucunda üslubun edebiyatın temel unsurlarından biri olduğu ve yazarın özgün anlatımını yansıttığına dikkat çekilecektir. Makalede ayrıca gelecekte yapılacak araştırmalara yönelik öneriler de sunulmaktadır.

**Anahtar Kelimeler:** Dil, Kürtçe/Kurmanca edebiyat, Şiir, Üslup, Üslup tarihi.

## Abstract

This article explores the definition and significance of style within Kurdish literature, exploring its components such as linguistic usage, expressive manner, and emotional expression. Style encompasses various tools and techniques writers employ to craft their texts, including word selection, grammatical structure, stylistic devices, and tone. Through these tools and techniques, the writer or narrator crafts a unique style for their work and narration. The article presents various definitions of style and examines related literature in Kurdish studies. In this way, the article wants to draw attention to the place, meaning, and effect of style in Kurdish literature. The stylistic situation of Kurmanji Kurdish literature and the importance of its research determines the scope of this study. Additionally, the history of the style is briefly discussed in this article. Of course, we will focus on academic and scientific activities in the North. In summary, it seeks to establish that style is one of the essential elements of literature and illustrates the author's distinctive narrative. The article also provides suggestions for future research.

**Keywords:** Language, Kurdish/Kurmanji literature, Poetry, Style, History of style.



## Destpêk

Şêwaz ji dewrên berê de bala xatîb û şairan kişandiye. Di awayê vegotinê, usûla îfadekirinê, rêbaza çîrokbêjîyê, kartêkeriya li ser muxatab, estetîka gotinê, hêza zimên û danûstandinên ragihandinê de bala mirovan çûye ser şêwazê. Ji ber vê yekê ji mêj de gelek tişt li ser şêwazê hatine gotin. Heta îro jî ku wek şaxeke zanistî bişkiwî, şêwaz hem çarçoveya xwe berfirehtir kir hem di gelek qadên cuda cuda de xwe nişan da.

Di edebiyatê de jî gelek teorî û nêrîn peyda bûn di vî warî de. Ev teorî û ekol bûn sebeb ku edebiyat pêş bikeve. Lewra guherînên civakî, felsefî û çandî nêrînên xwîneran jî diguherîne. Helwest û hestên xwîneran di edebiyatê de serdem bi serdem cuda dibin. Tam û çêja edebî û estetîk û xema ji edebiyatê di şêwazê de jî bi awayekî reng vedidin.

Edebiyata kurdî li bakur ji ber rewşên sîyasî û nebûna navendeke xurt ya edebî serdemek di bîdengiyê de mabû. Her çend bi rêya wergeran û hewlên ferdî di van 40 salên dawî de li ber xwe dabe û îro jî xwe gihandibe astekê jî mixabin di teorî û rexneya edebî de bi nîsbeta hewlêdanên nivîsariyê ewqas pêş neketiye. Ji ber vê yekê gelek pêwistî bi xebatên bi vî rengî hene.

Şêwaz hem bi zimannasiyê hem jî bi edebiyatê re têkiliya xwe heye. Di vê xebatê de li ser pênaseya şêwazê hatiye rawestandî. Çemka peyvê ji aliyê ferheng û qada zanistî ve hatiye behskirin. Gotar hewl dide ku guherîn û berfirehbûna wateya şêwazê ji destpêkê heta îro bi kurtî raxe ber çavan. Di edebiyata kurdî/kurmancî ya Bakur de bi çend xebatên akademîk rewşa lêkolînê vê qadê dide nasandî. Hat dîtin ku babeta şêwazê di edebiyata kurdî/kurmancî de zêde nehatiye nîqaşkirin û lêkolandin. Ji ber vê yekê me xwest em balê bikişînin ser vê mijarê û ev xebat ji bo lêkolînê şêwazê wekî pêngaveke biçûk bê dîtin.

Di vê xebatê de şêwaz ku paşê wek stîlistîkê dê bibe şaxeke serbixwe bi têkiliyên xwe yê dîrokî ve hatiye ravekirin. Xebata me li ser van pirs û meraqan hûr dibe: *Ji dema Arîsto heta qernê navîn û dema me li ser geşedan û pêşketinê di vî warî de çi hene? Serdema navîn li Ewropayê şêwaz çawa dihatê şîrovekirin? Têkiliya şêwazê bi edebiyatê re li Amerîkayê çawa hatiye îzahkirin û di edebiyata kurdî de rewşa îroyîn bi çi awayî ye?* Ji bo vê jî hin xebatên di vî warî de yê di van salên dawî de hatine kirin wekî nimûne hatine hilbijartin. Ev nimûne ji xebatên akademîk pêk tên. Esasen gelek gotar û parçênivîs hene ku dikare bê behskirin. Lê hem jî bo ku gotar zêde dirêj nebe hem jî me xwest xebatên xisûsî yê li ser şêwazê bikeve nav gotarê, me ji bilî lêkolînê akademîk, gotarên din niha li aliyekî hiştin.

### 1. Xebatên li ser Şêwazê di Edebiyata Kurdî de

Lêkolînê li ser şêwazê di esasê xwe de heta dîrokeke qedîm diçe. Ji dewra Arîsto û Platon bi navê retorîk û di destpêka serdema îslamê û vir de bi navê belaxat, beyan û bedî gelek xebat hene ku bi biwara şêwazê ve têkildar in. Şêwaz wekî şaxeke zanistî bi navê şêwaznasiyê (stylistics) di sedsala XXî de pêş dikeve. Li dor edebiyata modern teorî û ekolên nû reng vedidin. Heçî edebiyata kurdî kurmancî ye li bakur bi vebûna enstîtu û beşên kurdî babetên şêwazê bi awayekî akedemîk di nav lêkolînê zanistî de cih digirin. Hin tez rasterast li ser şêwazê hatine nivîsandin hin lêkolêr jî di nav xebatê xwe de beşek terxan kirine ji bo şêwazê. Belê ji van xebatan yek jî

şêwaz an şêwaznasîyê bi temamî venekolaye. Derbarê helbestkar û nivîskarên de li dor babetên wan, xwe spartine teoriyek an beşeke ji şêwaz û şêwaznasîyê. Helbet li Başûr û Rojhilatê gelek xebat dikare bê behskirin di vî warî de lê ji ber ku mijara me bes kurmancî ye û li ser edebiyata li Bakur e û hem tesbîtîkirina van xebatan hemû bi hev re dê ji hedê vê gotarê bibihurin em ê tenê bi lêkolînên li Bakur behsê li vir girê bidin. Hin lêkolînên li ser şêwazê û peywendî bi wê li Bakur ev in;

Li Zanîngeha Mardîn Artûklûyê bi navê *Îmaj di Helbesta Kurdî ya Nû ya Bakur de* ji terefê Roger Acûn ve di sala 2016an de tezeke masterê hat amadekirin. Ev tez ji sê beşan pêk tê. Ji nimûneyên helbestên Arjen Arî Berken Bereh, Fatma Savcî û Gulîzerê têgeha îmajê û bikaranîna wê vedikole. Di berhemên van helbestvanan de îmajên takekesî, îmajên civakî û siyasî ji aliyê maneyê ve analîz dike. Di çêkirina van îmajan de rola hunerên ciwankariyê destnîşan dike.

Di sala 2016an de li Zanîngeha Van Yuzuncuyilê ji aliyê Hemin Karîm M. Salih ve bi navê *Runbêjî di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de* li ser rewanbêjîyê tezeke masterê tê amadekirin. Tez ji sê beşan pêk tê. Di destpêkê de derbarê rewanbêjîyê û jiyana Ehmed Muxtar Caf de agaghiyan dide. Beşa yekem babeta şibandîne ye; beşa duyem behsa mecazê vedike û beşa sêyem jî mijara kînayeyê ye.

Li heman zanîngehê di sala 2017an de ji aliyê Hareem Hajî Sulaiman bi navê *Hozanetî di Hozanên Sebrî Botanî da* tezeke masterê hatiye amadekirin ku behsa poetîkaya Sebrî Botanî dike. Ev tez ji sê beşan pêk tê beşa duyem û sêyem pênase û binbeşên poetîkayê rave dike û ji helbestên Botanî digel mînakên îzahatan tîne. Rave dike ka Botanî di şî'rên xwe de zimanekî çawa bi kar tîne.

Dîsa li heman zanîngehê di sala 2019an de bi navê *Di Xezelên Wefayî yên Kurdî de Rengvedana Taybetmendiyên Sebka Iraqî* ji aliyê Ameer Nasih Ahmed ve li ser berhemeke klasîk tezeke masterê hatiya nivîsandin. Ev xebat berhemeke klasîk ji xwe re kiriye armanc ku bi rêbazeke ji serdema klasîk a bi navê Sebka Iraqî lê hûr dibe. Tez sê beş e: beşa yekem behsa derketina Sebka Iraqî û taybetmendiyên wê dike. Beşa duyem behsa jiyan û berhemên Wefayî dike. Beşa sêyem jî dixwaze tesbît bike bê ka Sebka Iraqî di helbestên Wefayî de çawa reng vedaye ku sebka Iraqî yek ji êkolên şêwazê ne ku di dewra klasîk de li Îran û Xorasanê belav bûbû.

Di sala 2020î de ji Mem Artemêt ve bi navê *Îmaj di Şî'ra Fêrikê Ûsiv da* li Zanîngeha Bîngolê tezeke masterê hat amadekirin. Îmaj ku beşek ji şêwazê ye poetîkaya helbestkarî radixe ber çavan. Di vê tezê de beşa yekem ji bo helbestkarên kurd yê Qafqasyayê hatiye terxankirin. Beşa duyem behsê tîne ser çarçoveya teorîk. Beşa sêyem nimûneyên cureyên îmajê tesbît dike ji helbesta Ferîkê Ûsiv.

Ömer Orhan di sala 2020î de li Zanîngeha Yuzuncuyilê bi navê *Temayên Bingehîn ên Poetîkaya Şikoyê Hesen* tezeke masterê amade kir. Poetîka ji bo fahmkirina fezaya raman û hestên şair û awayê vegêrana wan têkilî bi şêwazê re heye. Di vê beşê de lêkoler di sê beşan de babeta xwe dabeş kiriye. Beşa yekem behsa kurdên Qafqasyayê û kurdolojiyê wê dike. Di beşa duyem de jiyan û helbestkariya Şikoyê Hesen rave dike. Di beşa sêyem de jî temayên helbestkar bi nimûneyan îzah dike.

Dîsa li Zanîngeha Van Yuzuncuyilê wek teza masterê di sala 2021î de bi navê *Şêwaz di Helbestên Abdulla Peşêw de* ji aliyê Arsalan Abdullah Hamad Ako ve hatiye amadekirin. Di vê lêkolînê de şêwaza şaire modern Abdulla Peşêw di warê şêwaza ziman, mosîqa, kêş, teknîk û taybetiyên xweser yê helbestkariya wî hatiye lêkolandin. Ev lêkolîn ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de jiyana û berhemên helbestkarî hatiye nivîsandin; di beşa duyem de têgeh û binbeşên şêwazê wek teorî hatiye behskirin; beşa sêyem jî şêwaza helbestkarî dinirxîne û analiz dike.

Li heman zanîngehê di sala 2023an de bi navê *Şêwazên Derbirîna Hizrê -Mînak: Devera Duhokê* ji aliyê Rozhhelat Sulaiman Omer Gawdan ve tezeke masterê hatiye amadekirin ku lêkolîneke sehayî ye li ser awayê vegotinên zimanî yê li qezayên Duhokê. Rêbaza şêwaza wesfî (şîkarî) hatiye sepandin di vê xebatê de. Xebat ji du beşan pêk tê: Beşa yekem teorî ye ya duyem tevbîqa teoriyê ye.

Ji bilî van hin gotar hene ku şêwaz an jî beşek ji wê kirine mijara xwe wekî;

*Vegotina Hêmayî û Metaforîk di Mamikên Kurdi de*; Kenan Subaşî di sala 2016an de di kovara Nûbihar Akademiyê de balê dikişîne ser vegotina mamikan. Hêmayên mamikan ji aliyê çawanî û çendaniyê ve di du beşan de dabeş dike.

*Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê* ku ji aliyê Mehmet Yildirimçakar ve hatiye nivîsandin û di sala 2017an de ji Nûbihar Akademiyê di hejmara 7an de hatiye weşandin. Ev gotar derbarê şêwaza heyranokan de sernavek vekirî ye.

*Dengê Ahengê di Helbestên Melayê Cizîrî de* gotareke din e ku ji aliyê Abdurrahman Adak ve di sala 2017an de di kovara Mukaddîmeyê de hatiye weşandin. Tê de beşek ji qada şêwazê aheng (binbeş îade, eks, tekrîr, alîterasyon û hw) bi nimûneyên ji helbestên Cizîrî hatiye ravekirin.

*Taybetiyên Sebka Iraqî di Helbestên Îbn Adem (Wacim) da* wekî xebateke hevpar ji terefê, Hemin Omar Ahmad û Nurettin Ertekin ve di sala 2020an de di kovara Bingöl Üniversitesi Yaşayan Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi de hatiye weşandin ku tê de yek ji ekolên rojhilatê yê şêwazê Sebka Iraqî bi nimûneyên helbesta Wacim hatiye îzahkirin.

*Estetîk û Cureyên Wê di Şiûrên Melayê Cizîrî de* ku ji aliyê Nevzat Eminoğlu ve hatiye nivîsandin di sala 2022an de di kovara Nûbihar Akademiyê de behsê ser estetîka helbesta Cizîrî. Ji hela estetîkê ve şêwaza vegêrana Cizîrî bi van hêmanan tê ravekirin: îhtîşam, hessasiyet, xwebawerî, ciwanî, baldarî û hw.

## 2. Şêwaz

Şêwaz peyveke pirhêl e. Di gelek qadên jiyana de bi kar tê bo wate û armancên cuda cuda; çawa ku di maneya terz, tewr, liv, tevger û sincê kesekî de tê gotin, ji bo libas û hunera yekî/ê jî tê gotin. Her wiha di mîmarî û avahiyê de ji bo stîl, teşe, awa û formê avahiyekê jî li kar e. Şêwaz di warê edebî û zimannasiyê de jî ketiye lîteraturê. Li Bakur şêwaz wek peyv ji soranî derbasî kurmancî bûye û di van salên dawî de belav bûye û ji berhem û weşangeriyê em têdighên ku êdî roj bi roj şûna uslûbê digire. Gelek wate û şîrove ji bo şêwazê hatine kirin. Ne pêkan e ku em li vir yek bi yek behsê jê bikin. Em ê li vir bi awayekî kurt serpêhatiya vê peyvê ji mêj ta serdemaya modern pêşkêş bikin bê ka ji guherînan çawa bihuriye ta ku niha bûye wek şaxeke ji şaxên zanistekî serbixwe.

## 2.1. Şêwaz ji Aliyê Ferhengî ve

Di kurdî de heta nivê sedeya bîstem her bêjeya *uslûba* erebî li kar bûye, lê belê piştî helwestên xwerûkirina zimanê kurdî bi taybetî li başûrê Kurdistanê bêjeya *şêwazê* cihê bêjeya erebî girtiye. Ta vî wextî bêjeya *şêwazê* bi wateya *stylea* rojavayê di tu ferhengên kurdî de cihê xwe negirtibû. Di ferhenga *Henbaney Borîne* ya Mam Hejar de *şêwaz* bi wateya, *şêwe*, *şikl û terh*, *rahatin*, *heyet û qiyafe de* hatiye (1369). Di *Ferhenga Kurdistan* a Gîwî Mukriyanî de bi wateya *şêwe*, *destûr*, *tore*, *rêçûn* hatiye (Mukriyanî, 1999). Di ferhenga *Îngilîzî-Kurdî* a Selah Se'dulla de li hember *bêjeya styleê* wateya *rêbaz*, *awa*, *şêwe* û *şêwaz* hatiye nivîsandiye (1998). Her wiha ji bo *stylisticsê* wateya *tur rêbazanî* daye ku tê wateya yek ji rêbazên zanista vekolîna edebiyatê.

Belê *şêwe* û *şêwaz* di nav gel de ne li kar e. Husein Muhammed di ferhenga xwe de dibêje ku *şêwe* ji farisî ye wek *şive* (devok) derbasî tirkî jî bûye. Ji ber ku di nav gel de peyda nabe, nabe ku em bibêjin peyveke îranî ye û di soranî de jî peyveke nû ye (<https://zimannas.com/ferheng/%C5%9F/%C5%9F%C3%AAwe>).

Di berhemên klasîk de peyva *uslûbê* li kar e ku ji erebî derbasî kurmanciyê bûye. Di van salên dawî de peyva *stîlê* belav bûye ku ew jî ji latînî tê û *eslê wê stylus* e û wek *stîlistîk* li cihanê bûye navê zanista *şêwazê*. Di *îngilîzî de stil* û *style* di fransîzî de jî wek *style* di maneya *uslûbê* de li kar e. Di destpêkê de navê amûrekê bû ku serê wê tûj bû û rûxên hişk pê dixeritandin û diterişandin ji bo xêzkirinê. Paşê di fransîzî de bi peyva *stylo* ku di wateya pênûsa hibrî de bû, hat bikaranîn (Divlekçi. 2007: 117-133).

## 2.2. Şêwaz wekî Têgeh

Wek têgeheke zanistî Tahir-ul Mevlevî di ferhenga xwe de ji bo *şêwazê* wiha gotiye: “*Us-lûb terza beyanê*” ye. Her kesek xwedî awayê vegotîneke şexsî ye bo ku fikr û hest û xeyalên xwe, yanî hizirîn û dilzîzî û sêwirînên xwe vebêje. Ji vê *şêweyê* re *uslûb* tê gotin. Carinan *eda* jî dibêjinê (1994: 177).

Îdrîs Ebdulla (2010: 12) di berhema xwe de dibêje ku dema kesekî diyar bo karekî diyar dest bi şûlekî dike, heke encamekî baş peyda bike, dibêjin “wî *şêwazekî* baş heye, yan bi *şêwaz* e, bi *uslûb* e” an na ku kar bi nebaşî encam bû, dibêjin “*şêwaza* wî nîne, bê *uslûb* e”. Ebdulla, wateya bikaranîna *şêwazê* di nav gel de bi maneya marîfet, zanîn û serkeftin an sernekeftina di karekî de *şirove* dike.

*Şêwaz* yan *uslûb*, reng û teher û awayê tevger an gotinê ye. Di klasîkan de wek *uslûb* tê bikaranîn. Di nav referansên gelêrî yên kurdî de peyvên wek *kar*, *tevger*, *hereket* ji bo *şêwaza* kesekî tê bikaranîn.

Di ferhengên kurdî de ji bo peyva *şêwazê* ev pênase hene:

Di Ferhengî Zanistgay Kurdistan (1397: 2017) da wateya *şêwazê* wiha ye:

“1. Bîçim û şikl

2. Hevot; çonyetî, rahatîn

3. Rêkilaş; anew; şêweyekî taybet le berêwebirdinî karêk yan pêkhênanî şitêk da

4. Rêbaz; şêweyekî diyarîkiraw û taybet bo dariştin, hondinewe w pêkhênanî berhemêkî hunerî.”

Di ferhenga tirkî de ji bo wateya şêwazê ya ferhengî wiha tê gotin: “Vegotin, awayê bûyîn, gotin û çêkirinê, terz.” (TDK, 2011:2161).

Beşîr Botanî (1995: 45-46) di kovara Helwestê de peyva *mor* di şûna stîlê de bi kar anîye. Peyva morê li vir bi kesayet re têkildar e. Lewra şêwaz kesayeta nivîskar û şairan nîşan dide.

Şêwaza her şairekî şêwaza jiyana wî ye, binyada çand û felsefeya wî ye, nêrîna wî ya di barê jiyandê de û rewşa derûniya wî ye ku diherike ser zimên (Karabulut, 2019: 42). Ji ber vê yekê gotina Buffon *Le style est l'homme meme* (Şêwaz însan bixwe ye) di mijara uslûbê de gelek caran wek referans tê bikaranîn. Lewra şêwaz wek pencemorê di tevger, axaftin, miamele tiştên wek wê de her şexsekî ji yên din cuda dike. Şêwaz kesayeta edebî ya her nivîskar û helbestvanekî/ê ye, wî ji yekî din vediqetîne. Têkiliyeke xurt heye di navbera kesayet û şêwazê de.

### 2.3. Şêwaz di Navbera Ziman û Edebiyatê de

Şêwaz (uslûb) du alî ye; yek jê zimannasî û ya din jî edebiyat e. Kesên ku ji hêla zimannasiyê ve li şêwazê nihêrîne têgehê jî di vê çarçoveyê de nixandine. Wekî Spitzer ku dibêje şêwaz fenomeneke zimannasiyê ye û ew zanist e ku derfetên bikaranînê vedikole ji bo wan kesên ku wî zimanî bi kar tînin (1964: 151).

Gelek hokarên karîger hene li ser ciyawazbûna şêwazê. Ji van hokaran du, yên sereke ne. Yek, kesayeta nivîskar e ku ji taybetmendiyên derûnî, hest û soz û cesteya wî pêk tê. Ya din babeta nivîsê ye ku bestî ye bi cureyên edebî (janr) û derbarê van hêmanan ve wekî mirov, siruşt, dîn, bawerî û hwd. Hin hokar hene ku çawabûna form û wergirtina nasnameya kesayetî ya nivîskar diyar dikin. Ev jî wek jîngeh (civakî û siruştî), bawerî, nijad, regez û rewşenbîrî ye. Ji bilî vê dabeşkirinê, bi nêrîna hin kesan, hokarên karîger yên li ser şêwazê li gor şexs (sinc, kirdar, hest, şewq, bawer, tendurustî, nexweşî, ...) , civak (aborî, çînî, çandî, dînî, ramiyarî, cografî, niştîmanî, pîşey, perwerde û fêrkari, ...) û ziman (ziman û yasayên edebî) jî tê dabeşkirin (Xusrew Ferşîdwerd, *Derbarey Edebiyat we Neqdî Edebî*, 1378: 220; ‘Elî Bû Melham, *Fi’l-Uslûb’ul-Edebî*, 1968: 22-26).

Wekî ku li jor hat diyarkirin, şêwaz di şûna stîla rojavayê de tê bikaranîn. Helbet stîla ku di edebiyatê de li kar e û wateya wê ya îro û ya demên berê ferq ji hev hene. Divlekçi (2007: 119) vê proseya dîrokî ya li ser wate û têgeha stîlê ji dewrên qedîm heta ber bi serdema modern ve digel mînakên bikaranîna stîlê qonax bi qonax wek gotarekê weşandiye. Destpêka peydabûna stîlê di wateya şêwazê de xwe dispêre tekstên sedsala XIVem. Peyva stîlê di dewrên qedîm de ji bo wê navgînê tê bikaranîn ku ji metal, hestî an tişteke wek wan tê çêkirin ku aliyekî wê tûj e ji bo nivîsandinê û aliyê din jî pahn e ji bo serrastkirin û jêbirina nivîsê, da ku li ser tabletên ji şimayê çêkirî pê binivîsin. Wales (2014: 397) jî behsa guherînên wateyî dike û 10 wateyên stîlê rêz dike di berhema xwe de. Vê yekê jî bi têgeha guherînên metonîmîk rave dike. Ew, *styleê* pêşî ji hêla etîmolojîk ve şîrove dike bê ka çawa ji maneya pênûsê ber bi şêweya nivîsînê çûye û serdem bi

serdem û qonax bi qonax wateyên nû çawa lê peyda bûne. Vê demajoya ku Wales bi berfirehî rave dike em dikarin bi kurtî wiha bidin ser hev.

Bi awayekî sade, çawa ku şêweyên ji hev cuda diteyisin di xêzkirina wêneyan an jî listina *squashê* de wekî wê, şêwaz jî ew awa vegotin e ku di nivîs û axaftinê de jihev cudabûna wê tê fahmkirin. Ev, wateyeke giştî ye ku di destpêkê de ji bo şêwazê nixandînan wiha dihatin kirin: Şêwaza baş û şêwaza nebaş, şêwaza hîcwî û hwd. Li gor Arîsto û yên wekî wî difikirin ev şêwaz, şêwazeke nixandêr e. Pûtepêdanên aşkere hene di xala jor de, ew jî ev e ku di rewşên cuda de şêweyên cuda xwe nîşan didin. Çawa ku du kes *squashê* bilîzin an jî goterekê binivîsin şêwazên wan, dê wek hev nebin. Ji heman çalakiyê ciyawaziyên stîlistîk dikare peyda bibe. Ji ber vê yekê çî edebî çî ne-edebî şêwaz wek guhertoyekê dixuyê di bikaranîna zimên de. Belê di qadên ne-edebî de wekî spor, reklam û zimanê hiqûqê de taybetiyên zimanî yên hevpar tên dîtin ku ew jî xwe-diyê şêwazekê ne. Guherîna şêwazê ne ku tenê ji rewşekê bo rewşeke din diguhere, her wiha ew li gor asta fermiyet û derdorê jî diguhere û ev yek wek guhertina şêwazê tê binavkirin. Axêver jî şêwazê bi kar tînin li gor rewşa mixatabên xwe. Dibe ku şêwaz di zimanê edebî de an jî di navbera janr, serdem û tekstan de ji hev cuda be, wekî şêwaza rojnameyan di navbera sedsalan û ya îro de. Heke wiha be wê demê peyva şêwazê beramberî paşxaneyê berfireh an qadên kartêker an jî çarçoveyekê tê. Şêwaza rojname û kovaran her yek bi xwe jî heye, çawa ku şêwaza serdemekê heye. Şêwaz taybetiyên zimên in. Ev ziman li gor herem, diyalekt, çîn, îdeolojî, qadên zanistî diguhere (Wales, 2014: 397-399). Wekî mînak dema şairek ji torê be zimanê wî di şîra wî de bi awayekî xwe nîşan dide. An jî botî û serhedî be dê her wiha bi vî rengî be. Helbestvanên bawermend û nebawermend şêwaza wan ne wek hev in. Helbestvanek, femînîst be şêwaza femînîzmê li ser wî/wê karîger e. Xaleke din ji bo şêwazê ev e ku têkiliyê xurt bi şêwaz û naverokê re heye û ev her tim mijara nîqaşê ye. Hilbijartina mijarê, şêwaza wê jî diyar dike. Helbestvanek çima û çawa mijara xwe hildibijêre, hokarên wê çî ne? Ji vir rengê şêwazê jî diyar dibe. Her hilbijartinek ji bo naverok û zimanê babetê, ladanê bi xwe re tîne. Ji bo ladan bê diyarkirin şêwaza serdem û helbestvanên hevçerx jî divê bê zanîn.

#### 2.4. Dîroka Bikaranîna Şêwazê

Graham Hough (1969: 1) di destpêka xebata xwe de bikaranîna têgeha stîlê dibe heta destpêka hizra edebî ya Awrûpayê. Di wê serdemê de stîl ji helbestê zêdetir bi retorîkê re têkildar dixuyê. Şêwaz beşek ji metoda îqnaşê tê hesabandin û di nav xîtabetê de tê ravekirin. Retorîka berê xîtabeta dadî, polîtîk û rêûresmî ji hev cuda dinirxand. Û her yek di nav xwe de amrazekê xwe ya cuda hebû. Ji bo bikaranîneke cuda, dewlemendiya peyvan, ristesazî û hunerên ciwankariyê xizmeta armanca kartêkeriyê taybet pêk dianîn.

Retorîk di berhema Arîsto de wek hunerê tê bikaranîn. Rê û rêbazên axaftinê, xwe baş îfadekirin, îqnaşkirin, xweş ravekirin, estetîk, başî û kêrhatina axaftinê wek nixên retorîkê derdikevin pêş. Ji ber vê yekê retorîk dibe hunera xweşbêjîyê. Retorîk û diyalektîk wek hev in. Lewra her du jî bi mirovan û fezaya zanîna wan re têkildar in û ne mexsûsê zanistekê ne. Ev yek jî rê li ber wê yekê vedike ku herkes bikaribe van tiştan (nixên li jor navborî) bi kar bîne. Herkes bi awayekî nêrînan nîqaş dike, erê dike, xwe û fikrên xwe diparêze an jî li hember yekî din radibe. Kesên ji

rêzê vê yekê ya bi awayekî hînbûyî yan jî bi xweberî pêk tînin. Her du awa jî pêkan e û lewma divê her du rê jî bi zelalî bêne lêkolînkirin. Arîsto ji vê lêkolînê derdikeve rê û di xebata xwe de tesbîta sê cure retorîkê dike ku ew jî ev in: *Epîdeîktîk* (vegêrana xwepêşandana rêûresmî), *Polîtîk* û *Adlî* (Aristo, 1995: 33).

Bi ya Arîstoyî, şewazeke baş bi zimanekî zelal û fesîh pêkan e. Ne zêde ji rêzê û ne jî bêyî pêwîstî hebe bala, lê divê di cî de be. Ev yek wateya belaxatê tîne bîra mirov ku di ferhengên de ji bo gotina di cih de ya li gor dem û mekanê tê ravekirin. Nejrêzêbûna zimanê helbestê ji bo pexşanê ne guncan e ku Arîsto ji ber vê dibêje di hunera helbestê de xemla rast bi emilandina peyvên dîtir çêdibe ku nehînbûyî ne û diyar in. Lewra mirov hez ji tiştên balkêş dikan. Tiştên nû bala wan dikişîne. Ev jî di helbestê de gelek li ber çavan dikeve (Aristo, 1995: 167).

Di beşa sêyem ya *Retorîka* xwe de Arîsto behsa sê xalên giring dike di axaftinê de ku yek ji wan, ziman û şewaz e. Li gor Arîsto bi diyarkirina mijarê (yanî tu yê çî bibêjî) mesele safî nabe ev jî heye ku divê ji bo îfadekirina wê çawa pêwîst be em wisa bibêjin. Lê Arîsto li vir balê dikişîne ser sê kêşeyan. Kêşeya yekem ev e ku îqnakirin ji diyardeyan bixwe, dikare çawa bê temînkirin. Ya duyem; ev diyarde di nav zimên de dê çawa bîn serrastkirin. Ya sêyem jî rêbaza axaftina guncan e. Ev yek di serkeftina axêver de xwedî pareke gelek mezin e lê Arîsto dibêje heta niha hatiye piştguhkirin (Aristo, 1995: 165).

Bi diyarkirina metnê, şewaza wê jî diyar dibe. Helbestvan dê çî bibêje û çawa bibêje hem naveroka metnê hem jî şewaza wê diyar dike. Nexwe dikare bê gotin ku şewaz wek kirasê metnê ye û terziyê xwe nîşan dide.

Karakaya (1996: 117-133) di gotara xwe de şewaz û teoriyên şewazê ji aliyê binyad û fonksiyonê ve dinirxîne û tê de behsa nêrînên gelek kesan dike ku di vê qadê de pispor in. Karakaya, berî ku şewazê tarîf bike li ser pênaseya metnê radiweste. Bi ya wî di tesnîfkirina metnê de diyarkirina xeta jor ya metnê gelek dijwar e. Xeta jêr ya metnê jî wiha disenifîne: metna yekpeyvî (biwêj, gotinên pêşyan, wecîze); metnên kurt (çîrok, anekdot, pêkenok, gotar); metnên navîn (çîrokên dirêj, novel...) û metnên dirêj (roman, şano û hwd). Metn ne wek zimannasiyê ye. Di zimannasiyê de rêziman, fonetîk, morfolojî, riste û hêmanên riste yê ji qaîdeyên giştî pêk tên ku li gorî kesan naguherin. Belê metn wek şewazê (hunerên edebî, ladan) derdikeve pêşberî me û ne mecbûr e ku li gorî hemû qaîdeyên zimên tevbigere. Tevî vê metn, şeweyên vegêranê diguncîne ku ji yekî bo yekî din ciyawaziyên xwe hene. Karakaya şewazê wek hunereke vegêranê dibîne. Bi ya wî heke zimên ji aliyê teoriyên erkî (teswîrî/fonksiyonel) û binyadî (pêkhatayî/oluşumcu) ve bê vekolandin, divê hokarên zimanî û derzimanî bîn şênberkirin û van pirs û hokaran li pey babetê rêz dike: Hokarên takekesî çî ne? Di esasê wê de çî heye? Ê hêza kartêkirinê çiqas e? Xencî wê, mercên fizîkî, temen, rewşa hizrî û hestî, îmkanên dewrûberê, rewşa civakî û pergala zimên di şewaza takekesî de xwe dide der. Her wiha gencîneya peyvên, peyvsazî, rêzimana ku di nav taybetiyên zimannasiyê de cih digire û demajoyên van xalan jî wekî fonksiyona ragihandinê nîşanên şewaza takekesî ne.

Takekesîbûna şewazê ji hilbijartina takekesî tê. Yanî her şair an nivîskarek li gor van şert û mercên li jor hate bilêvkirin peyvên xwe û riste yê xwe hildibijêre. Hilbijartin, li gor kapasîteya

bikaranîna zimên an jî qabiliyeta zimên tercîhkirina bikaranînekê ye ji layê nivîskar ve. Gelek îmkân hene ji bo vegêranê ku ziman vê yekê dide destê axêver an nivîskarên xwe. Ji bo girtina derî gelek cure îfade hene. Wek mînak:

Je kerema xwe derî dade!

Keko derî!

Bala te li derî be!

Derî bigire!

Destê te nagihîje derî qey!

An derî bigire an jî bicehime!

Ji bo van îfadeyên hîlbijartî pêk bèn, xelekên zimanî yên li jêr giring in:

1. Hîlbijartina armanca ragihandinê (agadarî, îqna, bi zorê...)
2. Hîlbijartina amrazê (amrazên verbal/devkî û nonverbal/nedevkî)
3. Hîlbijartina kodê (yek zimanî an bîlîngual; devok)
4. Hîlbijartina risteyê (gramer) (risteya erênî, risteya pirsîyarî...)
5. Hîlbijartina şêwazê (şêweya vegotinê) (Karakaya, 1996: 125).

Derbarê vê de di astên cuda cuda de rexneyên curbicur hene. Diyar e ku şêwaz hîlbijartînek e ku ji derfetên ziman an jî cureyên edebî peyda dibe. Li vir qesta me ji derfetên ziman û cureyên edebî ew e bes ne ku yên pêk tînin, yên guncan e ku pêk bîn jî di nav de ne. Îro hin taybetiyên ku ne guncan in bîn îfadekirin dibe ku bi demê re di nav cîhana zimên de bîn îfadekirin û ev jî ne tişteke nedîtî ye. Ji ber vê yekê derfeta îfadeya zimên dikare di du kategoriyan de bê cudakirin: yên pêk hatine û yên dikarin pêk bîn. Sînorên ya ewil di pirtûkên rêzimanê de diyar dibin digel mînakên wê. Ya duyem ev derfeta îfadeya zimên çawa ku di axaftinê de dikare peyda bibe her wiha di berhemên hunerî de û di nimûneyên nivîskî yên dîtir de jî dikare bê dîtirin (Aktaş, 2014: 75).

Armanca axaftin û nivîsandinê lihevkerin e. Her du fonksiyonên zimên jî derbirîna qewameke ji cihana derveyî û ragihandina rewşa mirovên axêver e. Ku wiha be ji van her du fonksiyonên maqûl e ku xwerûtirîn derbirîna peyamê wek norm bê pejirandin û hêlên ku ji derbirîna xwerû veqetin wek ladan bîn pênasekirin (Aktaş, 2014: 77).

Wekî ku diyar bû derbarê şêwazê de gelek wate, pênasê û nêrîn hene. Ev yek qada lêkolînê hem berfireh dike hem jî dijwar dike. Lewra dema ku li ser şêwazê bê lêkolînkirin pîvan û sînorê xebatê dê çawa be, kîjan babet ji bo çî dê were diyarkirin? Têkiliya şêwazê bi zimannasî û edebiyatê re dê çawa bê zelalkirin? Ev pirs kêşeyan bi xwe re peyda dikin. Digel vê, nêrîna klasîk û modern û rojhilat û rojava jî di nav xwe de cîyawaziyan diguncunîn. Belkî tenê pênaseyek ji bo şêwazê ne guncan be lê jêrnavên ku dikevin bin sîwana şêwazê ji bo lêkolîna li ser vê babetê, lêkolera pêdivî bi tehlîlên zimanî û edebî û vekolînên berfireh heye. Hem ji aliyê naverokê ve hem jî ji aliyê poetîka, metod û zimanê helbestvan ve bi rêya vekolînên li ser şêwazê sînorê qadê



dikare bê tesbîtkirin.

## 2.5. Dîroka Lêkolînên li ser Şêwazê

Dîroka şêwazê bi xebatên şêwazê re dest pê dike. Di gelek çavkaniyan de ev xebat xwe dispêrin *Retorîk* û *Poetîkaya Arîsto*.

Mêjûya lêkolînên li ser şêwazê di erebî de bi du hokaran ve vebestî ye. Ya yekem: Qur'ana pîroz bû ku zanayên musulman bo zêdetir li ser bikolin pêwistî bi vekolîna li ser ziman û şêwazê dîtîn. Ya duyem: Tevgerên wergêranê bûn ku di serdema Ebasiyan de dest pê kir û gelên vê deverê bi berhemên Yewnana qedîm hesiyan bi taybetî piştî wergera *Hunera Şi'rê* û *Retorîkaya Arîsto* (Zerrînkub, 1369: 150-170.)

Li Rojhilatê îlmê belaxat dabeşî sê binbeşan dibe wekî meanî, beyan û bedî. Ev her sê binbeş jî jênavên xwe û metodên xwe hene ku pê ziman û şêwaza berhem û helbestvanan dinirxînin. Bi hatina Îslamê giringiya lêkolînên metnê zêdetir li ser Qur'ana Kerîm bûye. Esasên ilmê tefsîrê hatine diyarkirin. Pêşveçûna zanînen *tefsîr*, *nehîw* û *belaxatê* rê daye ku berhemên derbarê hunera helbestê de jî peyda bibin. Li ser vê peywendiyê di dewra Ebbasiyan de ji bilî wateya ferhengî ya helbestê wateya istilahî jî ketiye rojevê û hunera helbestê bi berfirehî hatiye lêkolînkirin (Çobanoğlu: 2018: 27).

Divlekçi bi têbiniyekê belaxat û retorîkê ji hev cuda dike û dibêje ev, wek egereke ji esasên zanistî pêwist e. Lewra her du têgeh ji hev cuda li hunera vegêranê nêzîk dibin. Çawa ku nêrîna wan cuda ye serpêhatiya wan ya dîrokî ya di nav çandên xwe de jî bivê nevwê ji hev cuda qewimiye. Ji ber vê hindê jî Divlekçi dema behsa çand û edebiyata rojavayê dike peyva retorîkê bi kar tîne û dema behsa çand û edebiyata îslamî dike belaxatê bi kar tîne. Her çend ku Divlekçi wan ji hev cuda bike jî ji aliyê qaîde û formatan ve retorîk û belaxat dişibihin hev. Lewra serdema klasîk û antîk, hem axaftin û hem nivîsînê di nav qaîde, qalib û forman de dixwaze bibîne û metnek çiqas bi van qaliban bê nivîsandin û li gor van qaliban bi hostatî bê honandin ewqas jî serkeftî tê qebûlkirin. Retorîka serdema antîk, di serdemên paş de di nav dîroknas û nivîskarên pexşanê de nîqaşa xwe didomîne. Di serdema navîn û ronensansê de prensîb û qaîdeyên sereke yê retorîkê ji asta rexneya hizrî dibihurin digel wê li ser binyada helbestê jî tesîreke mezin dihêlin û dikevin nav mijarên poetîkayê û teoriya helbestê. Ev nêrîn heta sedsala 18an xwe diparêze (Divlekçi, 2007: 121).

Mekanîkbûn û hişkbûna qaîdeyan di zimannasiyê de xwendekarê edebiyatê Spitzer aciz dike û li ser lêkolîna şêwazê ji xwe re rêbazeke nû difikire ku ji bo bi berhemên edebî û hunerî re bibeke nav temaseke nêzîktir û kûrtir. Zimannasên wek Charles Bally bi nêrîneke ji edebiyatê dûr li vê meseleyê hûr bûn û wan, şêwaznasî wek lêkolîneke jêderkên vegotinê yê zimanekî dît. Di vê nêrînê de zimanê edebî yê ku xema estetîkê ji xwe re dike armanc hêjayî lêkolînê nehat dît. Lêbelê xwendekarên Bally (Cressot, Marouzeau û Devoto) vê yekê nepejirandin û bi diyardeyên edebî yê zimên re jî mijûl bûn (Hough: 1969: 13).

Hough (1969: 2) dibêje êdî giringiya van qaliban nemaye. Lewra ev hemû di nav dîrokê de winda bûne. Rexneya qalibparêz (prescriptive criticism) ji 300 salî zêdetir e nekariye bibe navendeke edebî ji bo tevgerêke edebî. Piştî serdema romantîk bes ji bo fêrgehên nivîskariya afirîner,

dibistanên nûçegihaniyê hebûna xwe didomînin. Xebatên edebî yê modern cesaret nakin ku tiştekî li ser şairan ferz bikin, ji bo pêkanîna şewazekê rêzikan pêşkêş nakin. Bes şewazên ku hatine bikaranîn dinirxînin. Ji vî aliyê ve hevterîb in bi xebatên zimannasiyê re ku ji bo gramereke rast qaîdeyan danaînin lê vedikolin li ser wan qaîdeyan ku hin komên çandî bi awayekî aktîf pê ve girêdayî ne. Armanç ne ew e ku ji bo gotina mirovan yasayan daînin, lê dixwazin fahm bikin wan gotinan ku di pratîkê de tene der. Zimannasî û rexne dikare vegere ser erka xwe ya yasadanîne lê edebiyat êdî durr e ji vê şeweya hizrî ji bilî welatên di bin fişara siyasî de ne.

Ya ku Hough dibêje, heke guherînek hebe ew jî guherîna edebiyat û naveroka wê ye. Ev guherînen qalibî û naverokî, şewazên cuda jî bi xwe re anîne. Edebiyata kurdî ya klasîk jî di dawiya dewleta Osmanî û di destpêka avabûna komarê de rastî ceribînen nû tê di edebiyatê de. Qalib û teşeyên klasîk zû bi zû terka helbesta kurdî nakin lê naverok her ku diçe zorê li wî kirasî dide ku heta qalib li wê nayê, vediçire û hildiweşe. Heta helbestvanên wekî Cegerxwîn, Qedrîcan helbestên xwe bi arûz û formên klasîk dinivîsînin. Lê paşê hin ji wan terka van qaliban dikin. Hin jî li ser qalibên klasîk devam dikin. Lê naverok û şewaza xwe diguherînin, wekî Hecî Qadirî Koyî.

Divlekçi (2007: 119-121) pêvajoya guherîna wateya şewazê bi berfirehî behs dike ku em ê li vir bi kurtî pûte pê daînin:

Şewaz di destpêka sedsala XIVan de bi wateya *metnên nivîskî, telîfên edebî û telîfên gufteyan* tê bikaranîn. Digel wê, bi wateya *şewaza serdem, kom an nivîskarekî* jî tê bikaranîn (Wek şewaza Frengî). Sedsala XVan şewaz bi wateya *rêza peyvan û şeweya veguheştina tiştêkî a ji bo ser nivîsa fermî* tê bikaranîn. Di destpêka sedsala XVIan de wateya *efsane û kîtabe* li şewazê zêde dibe. Dîsa di vê serdemê de ev wate jî lê zêde dibin: *şeweya axaftinê û vegêrana di axaftinên rojane de ya ku dema bi muxatab re têkiliya ragihandinê pêk tê, destpêk an jî beşeke ji nivîsa fermî*. Di heman serdemê de ev wate jî derdikeve; *bi wateyeke giştî taybetiyên berhemên edebî ji aliyê naverokê zêdetir yê ji bo şeweyê*. Zêdetir bi awayê *şewaza baş, xweş* tê bikaranîn. Di dawiya sedsala XVIan de bi van wateyan tê bikaranîn: *şeweyên risteyê, vegotin, peyva ku pê ramanek an hizrek tê îfadekirin*. Di sedsala XVIIan de şewaz û mirov wek hev tînin ku paşê wê bi gotina meşhur ya Buffon “*Le style c’est l’homme même*” (Şewaz, mirov bixwe ye) bikeve lîteraturê ku Divlekçi dibêje ew bi ihtîmaleke xurt ji biwêja latînî ya “*Stylus virum arguit*” (şewaza me, me kifşe dike) tê ku dema veguhast ser zimanê îngilîzî bi maneya *şewaz insan bixwe ye* wiha hate wergerandin; *The style is the man*. Di destpêka sedsala XVIIIan de şewaz di huner û mîmariyê de jî tê bikaranîn û bi stîla hunermend û serdemên wan re têkiliyek peyda dibe.

Hough (1969: 12) du navend û du hokaran derdixe pêş ku geşbûna xebatên şewazê bi wan ve girê dide di serdema modern de. Ji her du hokaran yek rexne ye ku zêdetir li Anglo-Amerîkayê berbelav bû, ya din meyla zimannasiya dîrokî bû ku ev jî li parzemîna Awrûpayê belav bû û ji filolojiya romantîk bingeha xwe digirt. Îroroj her du hokar jî bi hev re bûne yek ku Hough vê yekê wek kêmasiyekê dibîne. Lewra li gorî Hough armanca her duyan jî hev cuda ye û xebatên ku armanca wan jî hev cuda bin giringiya lihevkirina wan jî tune ye. Lê bi awayekî balkêş ev her du qad jî li ser heman babetê hûr dibin û divê rêyek hebe ji bo ku her du jî bi heman perspektîfê bînin. Bi her du awayan jî hêza motîvasyonê (motive force) bertekek bû ji bo dîsîplînen skolastîk

ku mekanîk û xaricî dixuya û eleqeya wê bi tevna zindî ya edebiyatê re zêde tunebû.

Rexneya edebî li Awrûpa û li Amerîkayê ji egerên cuda peyda dibin. Rexneya Amerîkî zêdetir wek îtirazekê ye ji edebiyata Awrûpayî re ku navenda wê Fransa bû. Di heman demê de ev nîqaş rê li ber edebiyata berawirdî jî vekiriye. Edebiyata kurdî ya wê serdemê ji van nîqaşan dûr, mîhraq û boçûnên pêşketina wê gelek cuda bûn. Hem di bin tesîra edebiyata tirkî de bû hem hêlên wê yên serbixwe hebûn. Fikra neteweyî û hişyarkirina gel armanca sereke bû ji bo helbestvanên kurd. Xwe bi folklorê ve girê dida ku ev yek şêwazeke romantîk bi xwe re dianî. Helbestvanan tarîxa neteweya xwe heta bi dewra Nûh Pêxember ve girê didan (Wekî nimûne helbesta Ebdurrahîm Rehmî Hekarî ya bi navê *Perek Zêrîn ji Tarîxê*). Lê digel vê neecibandina ziman û şêweya helbestê jî di kovarên wek *Rojîkurd*, *Hetawî Kurd* û *Hawarê* de dibûn mijara nîqaşê. Ev babet di mijara *Helbesta Kurdî ya Modern* de dê bi berfirehî bê behskirin.

Li Îngilistanê rewş kêr zêde wek Fransayê bû. Lê belê tevgerê ji akademiya û ji lêkolînên edebî yên mektebî (Scholastic) dûr berî sala 1914an zîl dabû ku paşê dê bibûya biyaveke edebî. Di destpêkê de *helbesta T. S. Eliot û rexneya wê*, *helbesta Ezra Pound û propagandaya wê*, *pexşana Joyce û polemîkên Whyndham Lewis* wek tevgerê ve şartî (underground movement) bû li dij sazûmana edebî ya heyî lê paşê ew jî bûn wek dezgeheke edebî. Êdî romanên hest û azweriyê yên serdema navîn û kartêkirina Şoreşa Fransayê ya li ser Wordsworth û Coleridge û mijarên bi vî rengî ji rojevê ketibûn û bala lêkolêr û xwîneran li ser hunermendiya edebî (literary craftsmanship) û honaka berhema hunerî ya devkî bû. Meraq li ser zimanê helbestvanan bû ku diyardeyeke hêza xeyala wan bû. Bi vî awayî meyleke xurt hebû li ser şêwazê ku bi wateyeke berfireh hatibû binavkirin (Hough: 1969: 14-15).

## 2.6. Rêbaza Lêkolîna Şêwazê

Çawa ku nêrînên derbarê şêwazê de cuda cuda ne, rêbaz jî li gor van nêrînan diguhere. Esasen diyarkirina metnê çî helbestvan û çî nivîskar, cureyê rêbazê jî diyar dike. Ji ber ku her kesekî xwedî şêwazeke cuda ye, teknîk û rêgehên wî jî li gorî wê teşe digirin. Cureyên edebî jî rêbaza lêkolîna şêwazê diyar dikin. Em ê li vir bi awayekî giştî derbarê rêbazên şêwazê de agahî bidin.

Çima ku du hêlên şêwazê hene -hêla zimannasî û hêla edebî- rêbaz jî bi van her du hêlan ve divê bimeşe. Ji aliyê zimên ve çî taybetiyên zimanî pêk hatine û ji aliyê edebî ve huner û vegêranên edebî û hêmanên wê çî ne divê bîn raçavkirin.

Aktaş, di xebata xwe ya bi navê *Edebiyatta Üslûp ve Problemleri (Şêwaz û Kêşeyên Wê di Edebiyatê de)* de lêkolînên li ser şêwazê di nav du koman de dabeş dike. Ji her du koman yek derbarê lêkolîna şêwaza teswîrî (descriptive) de ye. Ev cure şêwaz derbirînê (îfade) ji xwe re dike bingeh. Bi awayekî giştî hûr dibe li ser hêmanên bi teşe û têgehê re têkildar ku ev jî bi peyva ramanê tê îfadekirin. Ev şêwaz têkiliyên di navbera bikaranîna keresteyên zimên de vedikole. Ev yek lêkolîneke zimanî ye ku radiweste li ser awa û fonksiyona zimên ku di metnê de cih girtiye. Ji ya duyem re lêkolîna şêwaza tekewunî (oluşumcu) tê gotin. Ev jî lêkolîna li ser peywendiyên di navbera derbirîn (îfade) û ferdiyetê de ji xwe re dike armanç. Dixwaze di asta ferdî de wate di asta nivîskar û xwîner de li ser sebebê qalib û teşeyên derbirînê raweste yên ku di nav metnê de em li rastî wan tên. Ji vê hêlê ve nêzikî rexneya edebî ye (2014: 45).

Di derbirînekê de hem hest û hem jî qaîdeyên zimannasiyê têkelî hev in. Yanî nabe ku îfade bes ji hêla zimannasiyê ve bê nixandî an jî bi temamî ji hestan hatibe şuştin. Û hestek jî bêyî qaîdeyên zimannasiyê ji îfade û derbirînekê nayê diyarkirin. Lewra metn bi her du hêlan ve dibe metn. Aktaş (2014: 51) vê yekê bi mînaka avê rave dike. Av, bi oksîjen û hîdrojenê dibe av. Heke tu wan ji hev cuda bikî êdî av namîne. Ew dibe du tiştên cuda. Wek du rûpelên pêş û paş ên pelekî.

Her kesek xwedî şêwazek e ku ji aliyê bikaranîna zimên ve an jî di bikaranîna zimên de taybetiyên xwe yê takekesî hene ku wî ji kesên din vediqetîne. Şêwaza hin kesan şêwaza xemgîniyê ye û ya hinên din şêwaza coş û perosê ye û hinên din şêwaza dîdaktîk an jî lîrik bi kar tînin. Mînak Cegerxwîn şêwaza xwe ya coş û perosê heye, Berken Bereh şêwazeke xemgînî bi kar tîne, Melayê Cizîrî bi şêwazeke alî emel dike û hwd.

Rousseau (Altınörs, 2012: 1-10), bingeha peydabûna zimên bi mecazan (tropes) ve girê dide. Mirov hest û arezû û daxwazên xwe bi jest û mîmîkan îfade dikirin, nedigotin, nîşan didan. Siruştî bûn ne ku komele. Ew, rayeka ziman û muzîkê wek hev dibîne. Ziman û melodî li gor kirpandinê bandorê li hev kirine. Jêderka melodîyê hemû şanîdankên bideng yê xemgîniyê û qerînên şanazîyê ne. Ev jî bi awayekî tabîî teqlîtkirina frekansên dangan e.

Hin lêkoler ji sê aliyên ve şêwazê vedikolin: hem ji aliyê avahiyê ve hem ji aliyê fonksiyonê ve û hem jî ji aliyê tekewunê ve. Jixwe ev her sê alî jî bi awayekî têkelî hev dibin û di nav hev de ne. Di asta derbirîn û metnê de bersiva van pirsan divê: Kî xîtabî kê dike? Bergehên dinyaya derve bi sexbêriya kê ve tê tesbîtkirin û ji terefê kê ve tê vegotin? Têkiliya mirovê di pozîsyona vegêranê de ye û yê bûyerê dibîne û yê dijî, ji ku xwe dide der? Vegêr taybetiyên zimanê xwe bi kar tîne an yekî dîtir teqlîd dike? Cudahiyên di navbera cih û dema metnê de û dema qewamên ku wateya xwe di derbirînê de nîşan didin, çawa tîr pêşkêşkirin? Hilbijartina peyvên bi rêya çand û kêfa kê ve di kîjan rewşê de pêk tê? Di peyama ku wateya xwe di derbirînê de vedişêre kîjan fonksiyona zimên li pêştir e? Axirê awayê peywendîya derbirînan bi derbirînen berî xwe û piştî xwe re çawa diqewime? Ev awa peywendî di nav metnê de dubare dibe an na? (Aktaş, 2014:39-42).

Di berhemên klasîk de şêwaz di bin banê retorîk û belaxatê de dihat lêkolînkirin. Qaîdeyên xweşgotin û vegêrê hebûn. Yanî ewil qaîde hebûn. Nivîskar li gor van qaîdeyan berhema xwe dinivîsand. Kesên rexnegir û lêkoler jî li gor van qaîdeyan, berhem dinixandî. Ji ber vê yekê nivîskar çiqas li gor van qaîdeyan berhema xwe nivîsandiba dê ewqas berhemeke hêja û bihuner ba. Dikare bê gotin ku nivîskar sepînerê qaîdeyan e. Belaxat û retorîk tesnîf û hejmeta van qaîdeyan tesbît dike (Aktaş, 2014: 50)

Baweriya mirovan bi zimên hebû dibêje Octavio Paz (1995: 29-30), dema behsa zimên dike pûte bi peyvên dide. Girîngiya peyv û wateya wan dide ber çavan. Û wisa devam dike: “Bêyî ziman ne fikr çêdibe û ne jî tişt (obje). Yekem karê mirov binavkirin û pîrozkirin e, ji bo rasteqînîya ku nayê zanîn. Tiştê ku nav lê nehatibe kirin nikare bê zanîn. Paz, bîdengîyê jî wek zimanekî dihesibîne. Her çend zimanê heywanan jî hebe yê wan wek yê mirovan ne xwedî fikreke razber e. Lê ev ne babeta sereke ye, tiştê li vir cudabûna di astê de ye. Wate her du jî ziman in lê di navbera wan de cudabûneke merhaleyî heye.

Têkiliya ziman û şêwazê Çobanoğlu (2014: 9) wiha rave dike: “Ziman pêk tê ji îşaret û qaîdeyên

giştî yên ku bikaranîna wan diyar dike. Gramer, leksîkolojî (ferhengnasî) û fonolojî (dengnasî) bi van mijaran re eleqedar e. Lêkolînên şêwazê di asta metn û derbirînê (énoncé) de diqewime.

Şêwaz ne bêyî zimannasiyê dibe ne jî bêyî edebiyatê. Bi herduyan re di nav têkiliyê de ye û zanistekê serbixwe ye. Şêwaz bi metnê re tê tehlîlkirin. Tenê li ser maneya ferhengî ya peyvan ranaweste ku ev lêkolîn, xebatê dike xebateke leksîkolojîk. Lê dixwaze maneya peyvan bi metnê re der bixe ku ev jî şêwazê nîşan dide. Aktaş (2014: 50) vê yekê bi mînakê li ser semiyotîkê rave dike û têkiliya xwîner û nivîskar di nav rêbaza derbirînê (significationê) de dinirxîne ku xebatên şêwazê vê rêbazê piştguh nakin.

Wateya yekeyên peyvan hene. Wekî nimûne dema behsa avê tê kirin ev tîrên bîra me: av zelal e, diherike, tê vexwarin, di paqijiyê de tê bikaranîn, ji bo dewama jiyanê pêdivî pê heye û hwd. Ferheng wateyek an çend wateyên peyvan dide. Ji xwe ferhengnasî ji yekeyên wateya peyvan yên herî liberçav pêk tê. Qaîdeyên gramere jî li ser heman hukmê dimeşin. Ji qaîdeyên giştî pêk tên ku li gor şexsan naguhere. Heçî metn e, ew li gor rewşê di çarçoveya yekeyên wateyê de dikare bi metnê re wateyên nû bigire ser xwe. Ku ev jî dê me bibe taybetiyên şêwaza metne (Aktaş, 2014: 13-15).

## 2.7. Şêwaz û Ziman

Zimanê helbestê zimanê hunerî ye. Ji zimanê axaftinê yê rojane cudatir e, lê di nav wî zimanî de dikemile. Helbestvan divê zimanê dayîka xwe baş bizanibe ku karibe bi peyvan bilîze, wateyên dîtir tîxe nav, bi rêya sentaks û peyvrêziya zimanê xwe bikaribe hest, hizr û razên xwe vebêje an jî zimanê xwe berfirehtir bike. Bikaranîna zimên bi temamî, teserûfeke şexsî ye ku helbestvan bi hostetîyeke şairane berhemên xwe hildiberîne.

“Zimanê helbestê ne zimanê ragihandinê ye yê ku di nav civakê de tê zanîn. Fonsîyoneke wê ya wêdetirî ragihandinê heye. Zimanê helbestvan zimanekî nimayî û hestbar e. Binyada zimanê helbestê ji pergala zimanê asayî ciyawaztir e. Peyv û vegotin di destê helbestvên de dibin pêlîstok, helbestvan bi aliyê hestpêkirinê ve bi wan re tîkildar e.” (Çetin, 2015:171).

Her nivîskar (helbestvan) dixwaze hest û razên xwe, hizr û bîreweriyên xwe bigihîne xwînerên xwe wek daxwazekê siruştî. Belê daxwaz siruştî ye lê vegotina helbestvên çend dikare bi halê siruştî xwe biparêze? An jî xem û fikarên dersiruştî yên ku bandor li ser helbestvên dîkin gelo zimanê helbestvên çend diguherînin? Bersiva vê pirsê bi kamilî tenê helbestvan dizane, belkî ew bi xwe jî ji hinan bê xeber be.

Bîrdozî û her tiştê ku em wek hizr û raman bi nav dîkin, dema ew tebeqeya li jor a hişmendîyê ava dîkin helbest noqî nav avên kûr ên heyîneyan dibe. Helbest ji layê zimanê zindî yê civakê, efsane, xewn û daxwazên wan ên dêrîn wate meylên bixef û yên herî bihêz ên zimên ve tê xwedîkirin. Helbestê mirov diafirîne. Helbest jixwe-veçûn e di navbera civak û ya ku ew afirandî de. Heke Homeros nebûya, civaka yewnanan jî nedibûya wekî niha. Helbest bi rakirina çarşefa li ser me nîşan dide ku em kî ne û me vedixwîne wê tiştê ku em di rastîyê de ew in (Paz, 1995: 41).

Li gorî Paz (1995: 41), kesê (partiyên sîyasî yên modern) ku helbestê bike amraza propagan-

dayê nîrxê wê kêr dibe. Bangeşedêr (propagandakar), fikrên serkirdeyan digihîne gelheyan. Erka wî fermanên dîyar ji jor vediguhezîne bi jêr ve û şîrove û ravekirin ji bo van fermanan bi sînor e. Heçî helbestkar e ji jêr ber bi jor ve diçe, ji zimanê wan kesan ku bi wan re dijî berew helbestê diçe. Veberhênan bi vegera jêderka xwe dibe malê her kesî, malê hevpar. Peywendîya helbestkar û gel peywendîyeke organîk e.

Helbest xwe dispêre zimanê hevpar û civakî, lê ev veguhastin çawa çêdibe, ziman dema ji qalibên civakê derdikeve dibe peyvên helbestê çi dibe ji wan peyvên? Feylesof, xatîb û nivîskar peyvên xwe hildibijêrin li gorî wateyê, nîrxên wê yên edebî, rewîştî û rûhî. Helbestvan peyvên xwe hildibijêrin. Şairê ku li zimanê xwe digere ne wek wî kesî ye ku biçe nav pirtûkxaneyê mîna bazirgan ji peyvên nû û kevin hildibijêre, bê guman ew kes e ku ji destpêkê heta niha bê qerar di nav (peyvên) de digere û di rastîyê de jî her dem di nav wan peyvên aîdî xwe de digeriya. Şair peyvên xwe nas dike ji ber ku ew di nav peyvên xwe de ye û peyv jî di nav wî de ne. Hebûna wan têkelî hev bûye. Ew, peyv bi xwe ye. Fezaya peyvên şair ne ji nav rûpelên ferhengên, belbî ji peyvên wê civaka ku ew aîdî wê ye, pêk tê. Dewlemendiya helbestvên ne ji peyvên mirî lê ji yên zindî tê. Zimanê takekesî ew ziman bi xwe ye ku helbestvan razên wî kişf kiriye an jî formên wê guhertiye (Paz, 1995: 46).

Zimanê dayîkê hê dema mirov di stargeha xwe de ye û çavê wî bi ronahiya rojê neketiye bi mirov re xeber dide. Hest û raz û tiştên dîtir bi deng û rengên peyvên digel gelek tiştên binavne-bûyî di hiş û dilên me de bi awayekî bi cih dibin ku zimanê duyem an sêyem û hwd. xwe nikare bigihîne wê astê.

Paz, têkiliya di navbera helbest û zimên de jî wiha rave dike: “Peyv ku gav diavêjin nav cihana xeyal û xewnan çirûskên agir li wan dikevin û dişewitin. Lê agirê xwe zêde nadomînin. Axaftin esl û kana jiyanê ya helbestê ye belam helbest bi xwe nîn e. Helbest hewla zimên a ji xwe bihurtin e. Lê vegotina helbestkî digel axaftinê li ser heman zemînê ye. Her du jî kar in ne afirînerî ne, peyv ji nav lêvan derdikevin û digel hev danûstendinê dikin. Heçî helbest e ew zimanek e ku bi tena serê xwe bala dibe.” (1995: 34).

Piştî gelek mînak û nirxandinên li ser zimanên helbest û helbestvanan Eaglaton (2015:74), dibêje ku helbestvan materyalistên zimên in. Lê herçend wisa be jî helbest dixwaze xwe bikelimîne, di warê fezîlet û dilpakîya zelal û mutewazî de. Modernîzm digel çend tiştên dîtir qeyraneke bawerîyê jî dîtewisîne li ser zimên. Wate gumanek li ser zimên peyda dibe. Lewra metaforên îsraf û jestên devkî yên nejidil ji zimanên helbestvanan têne der. Li gorî hin nivîskarên modernîst ji bo ku tu xwe bigihîni heqîqeta zimên divê tu fişareke rêxistinî li ser wê pêk bîni. Eaglaton vê yekê bi mîna keke wisa rave dike: rewşeke wisa dişibe pergala wî serdestî ku dixwaze zarokê wî bibe xwedî exlaqeke pak ji bo wê jî bi darê zorê û kotekan heta zarok perîşan be, lê dide.

Moran dema behsa şêweparêzên Rûsî dike têkiliya helbest, ziman û bikaranîna zimanê wan bi vî awayî rave dike: Şêweparêzên Rûsî berê xwe dabûn berheman û berî her tiştî li pey bersiva vê pîrsê bûn: Taybetmendiya şêweyî ya ku berhemeke edebî ji berhemên din vediqetîne çi ye, wate edebîbûn çi ye? Wan edebîbûnê bi têgeha *ostraneniye* rave dikirin. Moran angaştê wan jî

wisa bi lêv dike: Dema em li cîhana derve, heyber, awayên hizirîn û tevgeran dinêrin hînbûnek li ser me peyda dibe. Helbest vê hînbûnê bi zimanê xwe yî resen dihejîne, bi awa û nêrîneke nû ji nû ve hest, raman, heyber û tevgeran nîşanî me dide. Lewra ev ziman ji zimanê me yê rojane, ciyawaztir e (2014: 178).

Özel (2014: 34) piştî cudahiya pexşan û helbestê ji aliyê wate û fonksiyonê ve rave dike, têkiliya zimên bi helbestê re wiha datîne; “helbest zimanê rasteqîn ê mirov û mirovayetiyê ye. Ji ber vê yekê ji çeşndariya vegotinê fikaran nake. Ji ber vê pirwatebûnê ye ku helbest li rastiye xwedî derdikeve. Helbet girîngiya mirov ji bo helbestê tenê ne taybetiya bibîrxistina helbestê ye, bi taybet mirov bi xwe bi awayekî siruştî hin wesfên dîtir dixê nav axaftin û zimên. Ji bo sewalan qêrîn û qijîn, ûrîn û nûrîn, xirîn û nalîn çî be ji bo însanan jî helbest ew e.

Özel di helbestê de girîngiya xwe zêdetir dide ser fahmbarî û têgihîştinê. Yanî ew sewal dema wan dangan derdixin dibe ku mesajek tê de be lê ya girîngtir yê ku deng derdixe, xwe ji bo hemcinsê xwe an jî yekî bîyanî dide nîşandan, bê ka ew afirînerêkî çawa ye? Wate peyama ku helbest radigihîne xwîner bo wî ew tişt e ku wê metnê dike helbest. Rol û fonksiyona ku ziman pêk tîne cureya metnê jî diguherîne.

Anday helbestvanan wekî dînan û helbestan jî wek gotinên dînan dinirxîne. Heke axaftinên dînekî ji devê şairekî derkeve ew axaftin dê bibe helbest. Lê şair dînekî bihiş e û wek zarokekî ye li gorî Anday. Bi zanebûn henekan dike û meknanan tevlihev dike û bi îradeya henekan di şûna zanîne de tercîh dike. Hem henekbaz e û hem gotinên tewş dike şair (Anday, 2015: 24).

### Encam

Ev xebat derbarê van mijaran de ye: Şewaz, dîroka şewazê, rewşa geşedana şewazê wekî qadeke zanistî û xebatên şewazê di edebiyata kurdî de. Şewaz di edebiyata kurdî de hêmaneke girîng e ku mîrasa dewlemend a çandî û rengê vegêrana edebiyata kurdî nîşan dide. Lêkolînên li ser şewazê di wêjeya kurdî de dê bikaribin kûrahî û cihêrengiya vê kevneşopiya edebî bi me bidin fahmkirin. Ji ber vê yekê ev xebat, di wêje û zimannasiyê de balê dikişîne ser girîngiya şewazê û diyar dike ku şewaz bi taybetî di edebiyata kurdî/kurmancî de têra xwe nehatiye lêkolînkirin û divê lêkolîn bê kirin.

Xebata me wek xebateke destpêkê behsa girîngî û dîroka lêkolînên li ser şewazê dike. Ji derketina peyva şewazê heta ku wekî şaxeke zanistî geşedan û serencama wê bi awayekî kurt hatiye behskirin. Çarçove û sînorên şewazê hatine ravekirin bi qasî ku sînorên gotarekê hilgire. Têkiliya ziman û şewazê û ji wir jî girîngiya tespîtîkirina ziman û şewaza helbestvan û nivîskaran hatiye vegotin. Ev xebat têkiliya ziman û şewazê jî kiriye mijara xwe. Jixwe şewaz di heman demê de awayê bikaranîna zimên e. Di lêkolînê de pêşketina şewazê ji Aristoteles heta Serdema Navîn û ya îroyîn, bi têkiliyên dîrokî yên şewazê re dinirxîne. Li ser mijarên wekî çawaniya şirovekirina şeweyê li Ewropayê di Serdema Navîn de, çawaniya şirovekirina têkiliya şewê û edebiyatê li Amerîkayê û rewşa niha ya edebiyata kurdî radiweste. Di vî warî de hin lêkolînên ku di van salên dawî de di vî warî de hatine kirin wek mînak hatine hilbijartin.

Şewaz di heman demê de rexneya edebiyatê ye jî. Xebatên bi vî rengî yên dê li ser pîvanên

akademîk û zanistî û li gor teorî û ekolên şêwazê bîn kirin rê li ber geşedana edebiyatê jî dê vekin. Şêwaznasî hêleke xwe bi edebiyatê re hebe hêla din jî bi zimannasiyê re têkildar e. Ji ber vê yekê xebatên şêwaz û şêwaznasiyê dibin pîvan ji bo rexnegîrî û rêbazên edebî.

Bi encama lêgerîna di nav sînorên vê xebatê de hat dîtin ku di edebiyata kurdî de lêkolînên şêwazê hê di asta destpêkê de ne. Ew jî ji aliyê teorî û hewsengandinê ve li ser beşek ji şêwazê rawestiyane. Şêwaza berhemên klasîk hindiktir hatine analîzkirin. Heçî edebiyata kurdî ya nûjen e temamê wan tezên masterê ne.



## ÇAVKANÎ

Acun, R. (2016). *Îmaj di Helbesta Kurdî ya Nû ya Bakur de* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, Mêrdîn.

Adak, A. (2017). “Dengê Ahengê di Helbestên Melayê Cizîrî de” *Mukaddîme*, 8(3), 41-76.

Ahmad, H. O., Ertekin, N. (2020). “Taybetiyên Sebka Iraqî di Helbestên İbn Adem(Wacim) da”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 6(11), 35-56.

Ahmed, A. N. (2019). *Di Xezelên Wefayî yên Kurdî de Rengvedana Taybetmendiyên Sebka Iraqî* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyîlê, Wan.

Aksan, D. (1995). *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim*. Ankara: TDK Yayınları.

Aktaş, Ş. (2014). *Edebiyatta Üslûp ve Problemleri*. Ankara: Kurgan Edebiyat.

Anday, M. C. (2015). *Şiir Yaşantısı Şiir Yazıları*. İstanbul: Everest Yayınları.

Aristoteles. (1996). *Retorik*. (Wer: Mehmet. H. Doğan), İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Arsalan, A. H. A. (2021). *Şêwaz di Helbestên Abdulla Peşêw de* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyîlê, Enstituya Zimanên Zindî, Wan.

Artemêt, M. (2020), *Îmaj di Helbesta Fêrîkê Êsiv da* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Bingölê, Bingöl.

Botanî, B. (1995). “Hunermendê Ahengbêj Beşîr Zaxoyî”. *Helwest*, 1, 45-46.

Çetin, N. (2019). *Şiir Çözümleme Yöntemi*. İstanbul: Akçağ Yayınları.

Çoban, A. (2004). *Edebiyatta Üslûp Üzerine*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Çobanoğlu, Ş. (2018). *Modern Şiir Dilinde Sapmalar*. Ankara: Hece Yayınları.

Divlekçi, C. (2007). “Tarihsel Süreç İçerisinde Üsluba İlişkin Tanım Çabaları ve Bir Tanım Denemesi”, *AÜİFED XLVIII*, II, 117-133.

Eaglaton, T. (2011). *Şiir Nasıl Okunur?* (Wer: Kaya Genç), İstanbul: Agora Kitaplığı.

Ebdulla, Î. (2010). *Şêwaz û Şêwaznasî*. Hewlêr: Kolêjî Zimanî Zankoy Selaheddîn.

Eminoğlu, N. (2022). “Estetik û Cureyên Wê di Şîrên Melayên Cizîrî de”, *Nûbihar Akademî*, 5(17), 101-115. <https://doi.org/10.55253/2022.nubihar.1111890>

Gîwî M. (1999). *Ferhengî Kurdistan*, Hewlêr: Weşanxaneya Aras.

Hareem H. S. (2017). *Hozanetî di Hozanên Sebrî Botanî da* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyîlê, Wan.

Hawar. (1932). 11, 2. Stenbol: Weşanên Belkî.

Hejar. (1369). *Henbaney Borîne*. Tehran: Sirûş.

Hemin K. M. S. (2016). *Runbêjî di Helbestên Ehmed Muxtar Caf de* (Teza Masterê ya Çapne-

bûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyilê, Wan.

Hough, G. (1969). *Style and Stylistic*. London: Routledge & K. Paul.

Karabulut, M. (2019). *Üslupbilim (Stilistik) ve Necip Fazıl Kısakürek'in Şiirleri Üzerinde Stilistik Bir İnceleme*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Karakaya, Z. (1996). "Üslup ve Üslupbilim Kuramları", *Akademik Açı*, Hj. 2.

Mevlevî, T. (1994). *Edebiyat Lügati*. İstanbul: Enderun Kitabevi.

Moran, B. (2014). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Orhan, Ö. (2020). *Temayên Bingehîn ên Poetîkaya Şikoyê Hesên* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyilê, Wan.

Özel, İ. (2014). *Şiir Okuma Klavuzu*. İstanbul: Tam İstiklal Yayıncılık Ortaklığı.

Paz, O. (1995). *Yay ve Lir-1: Şiir Nedir?* İstanbul: Era Yayıncılık.

Rohanî, M. M., Senendecî, M., Peşabadî, Y. Kerîmyan, M., Emînî M. J. (1397). *Ferhengî Zanistgay Kurdistan*. Senendec: Pexşangay Zanistgay Kurdistan.

Altınörs, S. A. (2012). "Rosseau'nun Dilin Kökeni Meselesine Yaklaşımı", *Bilig*, hj.63.

Rozhhelat, S. O. G. (2023). *Şêwazên Derbirîna Hizrê -Mînak: Devera Duhokê* (Teza Masterê ya Çapnebûyî), Zanîngeha Van Yüzüncüyilê, Wan.

Selah S. (1998). *Qamûsa Seaheddîn Îngilîzî-Kurdî*.

Spitzer, L. (1964). Üslûb Tedkikleri ve Muhtelif Memleketler (Wer. Fikret Elpe). *İstanbul Üniversitesi Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, 13, 151-164.

Subaşı, K. (2016). "Vegotina Hêmayî û Metaforîk di Mamikên Kurdî de" *Nûbihar Akademî*, 1 (1), 71-90.

TDK. (2011). *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu. Ankara.

Yıldırımçakar, M. (2017). "Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê", *Nûbihar Akademî*, 2 (7), 79-91.

<https://zimannas.com/ferheng/%C5%9F/%C5%9F%C3%AAwe> (Dîroka pêgihîştinê: 20.09.2022).



# KIRDEYA HOŞDARÎKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA

Araz Khalaf AMO

## Atasözlerinde Uyarı Eylemleri The Fact of Admonition in Proverbs

### Araz Khalaf AMO

ORCID: 0000-0002-8763-4182 | khalafaraz25@gmail.com  
Teaching Assistant, University of Duhok, College of Basic  
Education, Kurdish Language.

### Citation/Jêgir/Atif:

Amo, A. Kh. (2024). Kirdeya hoşdarîkirinê di gotinên mezinan da. Kurdiyat (9), 25-38. DOI: 10.55118/kurdiyat.1380067

### Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 23.10.2023

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 15.03.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi:  
30.06.2024

### Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Three anonymized-Triplet External/ Sê Nenas-Sê ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-Üç hakem

### Reviewing and Plagiarism/Nirxandin û İntihal:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism  
website./ Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hati-  
ye derbaskirin./ Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde  
taranmıştır.

### Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been  
followed while carrying out and writing this study and that  
all the sources used have been properly cited./ Hatîye be-  
yankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzikên  
zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî  
têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılır-  
ken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kay-  
naklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

### Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any  
parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti  
alîyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile maka-  
lede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması  
bulunmamaktadır.

### Grant Support/Alîkarîya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external fund-  
ing in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan  
wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu  
araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıkları-  
nı kabul etmektedirler.

### Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their  
work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisan-  
sa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./  
Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında  
lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

\* Ev xebat, bi îstifadeya ji teza me ya mastirê ya bi navê "Kirdeya Hoşdarîkirinê di Gotinên Mezinan de" hatîye amadekirin.

**Kurte**

Ziman gelek kirde û kiryanan radigihîne. Ew kirde, çi rasterast bihên ragihandin, an jî bi rêya hawirdorê hest pê bê kirin. Yek ji wan fakterên ku bi zengînkirina zimanî radibe pragmatîk e. Hoşdarîkirin sereketirîn kirdeya pragmatîkê ye, û roleke giring di nava zimanî da heye, bi şeweyeke taybetî, herwesa bi şeweyeke sertaserî rola xwe di nava civakê da dibîne. Çimkî ev kirde bi hoşdarîkirina komelgehê radibe, da ku bihêne parastin û dîrkerin ji ewan kar, kiryar, reftar û hizrên neguncav, ewên heyîn û dê hebin. Ev kirde di hemû mecalên jîn û jîyanê da dihêne bikaranîn. Gotinên mezinan, ew gencîneyên bi qîmet in, ku mayîndeyên ji bab û kalên me ne. Ew nexşeyên xwecihî ne, ew in ku heta îro jî qîmeta wan kêr nebûye, berewajî bihêztir lêhatîye û bûye tovê hemû kûr û danîştinên rewşenbîrî û asayî. Çimkî axêver ji bo selimandin û bihêzkirina axiftinê, û çendîn meremên din penayê ji bo vî janrê folklorê dibe. Kirdeya hoşdarîkirinê ji hêla formê ve kurt û sivik e, lê di warê naverokê da peyamek kûr û kêrhatî heye. Ev xala hevpar e, di navbera kirdeyê û gotinên mezinan de. Çimkî ev beşa edebîyatê ji hêla ruxsarê ve kurt e, û xwedî naverokeke kûr e, ev çende di pragmatîkê da rolek mezintir dilîze. Bi vî wateyê ev her du cure derbirinê ji naverokek berfireh dikin bi rêya kurtasîyê. Herweha amanca van xizmetkirina civakê ye, da ku hişmend bin û dîr bin ji nexweşî û belayan.

**Peyvên Sereke:** Ziman, Pragmatîk, Kirde, Hoşdarîkirin, Gotinên mezinan.

**Özet**

Dil birçok eylem ve durumu aktarır, bu eylemler ister doğrudan ister çevre aracılığıyla iletilir. Dili zenginleştiren faktörlerden biri pragmatiktir. İkaz etmek pragmatizmin en önemli işlevidir ve dil dünyasında önemli bir role sahiptir. Bu rol genel olarak toplumda karşılık bulur. Çünkü bu eylem, toplumu onları korumaya veya kaçınmaya teşvik ederek ortaya çıkar. Yaşamımızda yanlış eylem, davranış ve uygunsuz düşünceler vardır ve var olacaktır. Bu ikaz etme sayesinde hayatın bütün bağlamlarında kullanılmaktadır. Atasözleri, atalarımızın bize bıraktığı kıymetli hazinedir. Çünkü bugün bile değerini kaybetmeyen yerli harita, aksine güçlenmiş, derin ve entelektüel ve sıradan tüm tartışmaların sebebini oluşturur. Konuşmacı konuşmasını daha etkili ifade etmek için kelimelerin ya da ifadelerin temel anlam dışında folklorun derinliklerinden de istifade eder. İkaz etme eylemi biçim olarak kısa ve hafiftir, ancak içerik olarak derin ve anlamlı bir mesajla sahiptir. Bu gibi eylemlerin atasözleriyle ortak noktası budur, çünkü bu edebi sözler doğası gereği kısadır ve derin bir içeriğe sahip olduğundan pragmatizmde daha büyük bir rol oynar. Bu anlamda bu iki anlatım türü kısalık yoluyla bir içeriği genişletir ve bunların amacı toplumu mutlu etmek ve hastalıklardan ve felaketlerden uzak tutmaktır.

**Anahtar Kelimeler:** Dil, Pragmatik, Eylem, Uyarmak, Atasözleri.

**Abstract**

Language conveys many actions and situations. These actions are communicated either directly or through the environment. One of the factors that enrich language is pragmatics. Admonition is the most crucial function of pragmatism and has a vital role in the language world. This role is generally reciprocated in society. Because this action occurs by encouraging society to protect or avoid them, there are and will be wrong actions, behaviors, and inappropriate thoughts in our lives. Through this warning, it is used in all contexts of life. Proverbs are the precious treasure left to us by our ancestors. The indigenous map, which has yet to lose its value even today, has become more robust, profound, and intellectual and constitutes the reason for all ordinary discussions. To express his speech more effectively, the speaker uses the depths of folklore and the basic meaning of words or expressions. The act of admonition is short and light in form but has a deep and meaningful message in content. This is what such actions have in common with proverbs since these literary expressions are short in nature and play a more significant role in pragmatism because they have a more profound content. In this sense, these two types of expression expand content through brevity, and their purpose is to make society happy and keep it free from diseases and disasters.

**Keywords:** Language, Pragmatic, Action, Admonition, Proverbs.

## Destpêk

Kirdeya hoşdarîkirinê babeteke giring e, bi gelemperî di civakê de û bi taybetî jî di zimanî de. Di axaftina rojane û nivîsînê da berdewam tê bikaranîn û sûdeke baş bo xelkê heye. Çimkî wan ji metirsî û zîyanan diparêze û nahêle ku ew bikevine nav arîşeyan. Digel vê jî edebîyata folklorî bi şeweyeke giştî, ji gelek formên derbirînkirinê pêk tê. Nexasim gotinên mezinan, bêtir ji hemû cur û beşên din ên edebîyata folklorî ev babete di nav da tê xuyakirin. Ev jî ji ber forma wê ya kurt û hebûna hejmara wan ya zêde, bi kurtî gotinên mezinan rengvedana hizir, bîr, ketwar, dîrok û rewşenbîrî ya civakî ya miletî ye; bi erkê parastin, arastekirin, perwerdekirin û hoşdarîkirina kesan radişe. Giringîya vê xebatê ew e ku her du beşên edebî û zimanî bi hevdu ra bê têkilkirin.

Amanc ji vê lêkolînê ew e ku em bikarin kirdeya hoşdarîkirinê bidin xuyakirin û destnîşan bikin, ji aliyê giringî û çawanîya karanîna wê ve, û diyarkirina wê layenê hevbeş ê bihêz ewê di navbera kirdeya hoşdarîkirinê û gotinên mezinan da heye. Çimkî heta niha jî me serbûr ji ewan rûdan û karasatan wernegirtine, yê ku gotinên mezinan di derheqê wan da hatine gotin. Me ni-kariye kirdeya hoşdarîkirinê di gotinên mezinan da bi şeweyeke rast û durist bidine xuyakirin. Ji ber vê yekê jî ev gotinên mezinan bi tenê mayîne gotin.

Ev xebat hem di warê zimanî û hem jî di warê edebî da cih digire. Ji ber vê çendê sînore wê berfireh e. Ji aliyê zimannasîyê ve sînore wê lêkolînê bi rolê kirdeya hoşdarîkirinê di asta prag-matîkê da girêdayî ye. An ku di çarçoveyek pragmatîkê da tê berhevkerin û ji vî sînorî derneketî-ye. Herweha ev çende li gorî stratejîyên Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê hatîye encamdan. Ev stratejî li ser çend gotinên mezinan hatine analîzkirin.

Ev lêkolîn li dû rêbaza “wesfî-şîkarî” hatîye encamdan û piraktîkirina lêkolînê li dû dabeşki-rina zanayê zimanî Searle, ji bo stratejîyên hoşdarîkirinê hatîye analîzkirin. Ev xebat ji sê beşan pêk tê û di çarçoveya zanista zimannasî û edebîyatê da ye. Çimkî di vê xebatê da gotinên mezinan, li gorî stratejîyên Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê tene şirovekerin. Lê di vê lêkolînê da gotinên mezinan li gorî stratejîyên ziman tene tesnîfkirin. Ev yek bû sebeb ku kirdeya zimanî ya herî giring, bi beşa herî giring a edebîyata folklorî ra bê tevlihevkerin, ev yek ji bo vê xebatê bû navnîşan.

### 1. Kirdeya Hoşdarîkirinê

Di zimanê kurdî da peyva hoşdarîkirinê bi gelek awayan hatîye şirovekerin. Her ferhengek li gorî nêrîn, peymanên civakî û zarava hoşdarîkirinê rave dike. Di piranîya ferhengên kurdî da, zaravê hoşdarîkirinê bi zaravayê hişyarkirinê ra tevlihev kirine. Lê ger em ji nêz ve li vê yekê binêrin, diyar dibe ku yek ji erkên kirdeya hoşdarîkirinê, hişyarkirin e. Ev yek jî delîl e ku piranîya kirdeyên axaftinê di nava kirdeya hoşdarîkirinê da hatine razandin.

Têgeha hoşdarîkirinê gelek wateyên cuda dihewîne. Ev yek jî dewlemendîya wê kirdeya axaf-tinê nîşan dide, ji ber dewlemendîya wê kirdeyê hîn jî guman heye, negihîştîye tu wateyeke yek-girtî. Wateya hoşdarîkirinê girêdayî ye bi hawirdora ku lê diqewime û ji hêla her wergirî ve bi rengekî cuda tê şirovekerin. Hoşdarîkirin berhema çalakîyên wekî rêberî, razîbûn, şîret û girêdana wê bi komeka karên cuda û curbicir, yê ku ji hêla amûrên civakî ve tene piştgirîkirin.

### 1.1. Destpêkek ji bo Kirdeya Hoşdarîkirinê ya di Zimanî da

Hoşdarîkirin kirdeyeke axaftinê ye, wekî yek ji şêwazên zimanî û amanceke giring a pragmatîkê tê dîtin. Axêver hewl dide ku guhdêrî li ser tiştên ku jê ra hatine pêşkêşkirin hoşdar bike. Axêver radibe bi arastekirina guhdêrî bi kirin an nekirina karekî. Hoşdarîkirin wekî şîreteke ye, heke mirov wê bike, dê bihêr parastin, wekî din dê zirarê bibîne. Ev yek dimîne li gorî wê rewşa ku nameya hoşdarîkirinê tê da tê pêşkêşkirin, wekî van hevokên jêrîn:

Hişyar be otombêlê bi lez neajo.

Ez te hoşdar dikim ku divêt otombêlê bi lez neajoyî.

Ger ev her du hevok bi hawirdorê ra werin tevlihevkirin û bi dengekî rast werin gotin. Ew dê were vê wateyê gava ku otombêl bi lez were ajotin dê qezayek xirab çêbibe.

Hoşdarîkirin di hundirê xwe da wateyên daxwazî û fermanî hildigire. Axêver daxwazek an jî fermanekê ji guhdêran ra dike ku pêşîyê li kiryarên xirab bigirin, pêdivî ye ku hoşdarîkirinê naverokeka pêşnîyazkirî ya baş hebe da ku morala guhdêran zêde bike û bandorê li xebata wan ya paşerojê bike, wekî hevoka jêrîn:

Ez te hoşdar dikim ku dev ji cixare kişandinê berdî.

Ji aliyê pragmatîkê ve, ev hevok xwedî wateyeke pir xirab e. Nîşan dide ku kişandina cixareyê pir xirab e û ger neyê rawestandîna dê zirarê bide tenduristîya guhdêr û dê bibe metirsî li ser jîyana wî (Searle, 1975: 71-Parker & Rieley, 2005: 21). Li vir diyar dibe ku pîranîya kirdeyên axaftinê dibine erkên kirdeya hoşdarîkirinê û amanca wê ya sereke şîretkirin û rastkirina jîyanê ye, ji bo parastina guhdêran ji bûyer û belayan.

Bi nêrîna Rakman Save hoşdarîkirin şîreteke e ji bo kirin an nekirina tiştêkî tê dayîn. Hoşdarîkirina guhdêrî ye li pêşîyê, li ser xetera kirina tiştêkî nebaş dide, ku ev yek li dij xwestekên guhdêran be, da ku guhdêr ji van kiryanan dûr bisekinin (Silêman, 2021: 75). Axêver dema ku bizane rewşa guhdêrî ne baş e, peyama xwe pêşkêşî guhdêran dike. Lewra ger guhdêr guh nede axêver, dê kêşeyên guhdêrî çêbibin, li vir em dikarin bibêjin ku amanca vê wekî gefkirinê ye, da ku guhdêrî bitirsînin, lê cudahiya wê ew e ku tehdîd di berjewendîya axêverî da ye û hoşdarîkirin di berjewendîya guhdêran da ye. Gelek çalakî hene ku dibe ku hoşdarîkirin yek an çend ji van çalakîyan di nav xwe da bihewînin, lê ne merc e ku hemûyan bihewîne, ew çalakî wek: ragihandin, axaftin, şêwirmendî û her tiştê din ên bi vî rengî ne. Herweha Searle qebûl dike ku peyva hoşdarîkirinê nêzîk e ji bo peyvên din ên wekî şîret, agahdarî, hişyarî...hwd, û dibêje hoşdarîkirin têgehek giştî ye ku derbirinê ji xetereyeke rastîn an potansiyel îfade dike (Elî, 2020: 235).

Ji tiştê ku me berê niha behiskirî, ji me ra eşkere bû ku hoşdarîkirin li gorî awayê pêşkêşkirin û dariştinê, herweha çawanîya şirovekirina wê ji hêla hawirdorê ve dikare zêdetir ji yek rehendê watedar û bi bandor bi xwe ve bigire, wekî hevokên jêrîn:

Ez te hoşdar dikim xwe dûr bikî ji agir.

Ez te agahdar dikim ku agir xeternak e.

Axêver di van her du hevokan da hoşdarîyê dide guhdêran ku pirsgirêkek heye û divê were çaraserkirin, lê bi rengê din, di hevoka yekem da dibêje xwe ji agir dûr bigire û di hevoka duyemîn da jî bi eşkere dibêje ku agir xeternak e, digel vê yekê jî peyva agir bi wateya: şer, fitne, nexweşî... tê zanîn.

## 1.2. Pênaseyên Kirdeya Hoşdarîkirinê

Zana û zimanzanan kirdeya hoşdarîkirinê bi çend awayên ji hev cuda pênase kirine, bi vî awayê li jêr:

1. Zimanzanê Amrîkî Hinkle derbarê hoşdarîkirinê da dibêje: Hoşdarîkirin ew pêvajo ye ku tê da axêver peyamekê ji guhdêr ra dişîne û hoşdarîyê dide ku tiştê bike yan neke. Çimkî ew di berjewendîya guhdêran da ye (Hinkle, 1997: 5).

2. Hoşdarîkirin radibe da ku guhdêrî bitirsîne, ji bo ku nekeve tengasîyê, tê bikaranîn. Li vir ev tirsandin di berjewendîya guhdêran da ye, bi vî awayî kirdeya hoşdarîkirinê dibe rêbereke civakî (Îbn Menzûr, 1999: 92). Li gorî vê pênaseyê, di kirdeya hoşdarîkirinê da axêver ji bo baştirkirina jîyana kesên derdora xwe dixebite.

3. Lito û Miler dibêjin: Hoşdarîkirin piştgirîyeke eşkere ye ku hoşdarîyê dide bikarhêner da ku amade be. Ji ber ku xetereyek heye û ev xetere hewce dike ku guhdêrî gelek zanîn li ser hebe (Elî & Koçer, 2021: 28).

4. Solomon dibêje: Hoşdarîya rast û bi bandor ew e ku kurt û watedar be û du wate nebe, yek wate û yek peyam jî kurtirîn ferman bide (Solomon, 1995: 9). Di vê wateyê da dema ku axêver bi karê hoşdarîkirinê ra mijûl dibe, hewl dide ku axaftina xwe pir kurt bike û peyama xwe bi awayekî herî kurt pêşkêş bike.

Hemû bi pênaseyên xwe nîşanî me didin ku kirdeya hoşdarîkirinê giringtirîn kirdeya pragmatîkê ye û formeke zimanî ya giring e. Hoşdarîkirin axaftineke bi amanc e ku peyamekê hildigire, axêver hewl dide ku vê peyamê kurt û bi bandor bike. Ji ber ku ger guhdêrê vê peyamê werne-gire û nekeve bin bandora vê peyamê dê bikeve nav pirsgirêk û alozîyan. Ev ne tenê di ziman da di jîyana rojane da jî giringî û nirxa xwe heye.

## 1.3. Zimanê Hoşdarîkirinê

Hoşdarîkirin bîyaveke zimanî ye, û amanceke giring a pragmatîk e. Axêver hewl dide ku guhdêran hişmend bike, ku ji her bûyer û pirsgirêkê ra amade be. Ev pêvajo di berjewendîya guhdêran da ye. Axêver bi rola çavdêr û rênîşanderî radibe, ji ber vê yekê ziman û rêbaza pêşkêşkirina kirdeya hoşdarîkirinê pir giring e, ger bi zanistî neyê arestekirin, peyama hoşdarîyê ya rast nagihîje guhdêran.

Axêver berî ku peyama xwe ji guhdêran ra bişîne, divê li ser awayê bikaranîna ziman bifikire. Çimkî zimanê ku di kirdeya hoşdarîkirinê da tê bikaranîn pir giring e. Em dikarin bibêjin ku girîngiya ziman li hember naveroka wê peyama di hundirê nameya hoşdarîyê da tê pêşkêşkirin. Guhdêr berî bikeve bin bandora peyama hoşdarîkirinê, dikeve bin şewaz û zimanê ku di nameya hoşdarîkirinê da tê bikaranîn. Derbarê zimanê hoşdarîkirinê da divê axêver ji bo gihandina peyamê

bi zimanê xwe haydar bin. Çimkî kesê ku bi îngilîzî diaxive nikare peyamên hoşdarîkirinê yên bi zimanê almanî bixwîne û fam bike, ji ber vê yekê divê di peyamên hoşdarîkirinê da ji yek zimanî zêdetir were bikaranîn.

Galter û Lionerdu, me li ser pirsgirêka pîrzimanîyê hişyar dikin. Yek ji çaraserîyên pirsgirêka pîrzimanî, bikaranîna dîzayna pilêtan e ku dê li gorî rêjeya niştecihan bê dabeşkirin, heke 70% îngilîzî, 15% spanî û 15% mayî zimanên curbicur in, li wê demê pişka şêr wê bi îngilîzî be, tê wateya ku pîranîya nameya hoşdarîkirinê divê bi îngilîzî be û paşê bi zimanê spanî pîlanê nîşan bide (Elî & Koçer, 2021: 25).

Rêyeke din a giring a famkirina peyamên hoşdarîyê bikaranîna wêneyan e, divê ew wêneyê ku bê bikaranîn hilgirê hizra gelemperî be. Peyamên hoşdarîya taybet asta razîbûn û têgihîştina xetereyê berhemtîne. Gava ku peyama wan bandorê li temaşvanan bike dê bigihîje amanca xwe. Ji bo ku guhdêr ji nameya hoşdarîkirinê bandor bibe, divê peyam zelal û taybetî be. Ji ber vê yekê peyamên taybetî astek bilindtir bawerîya hoşdarîkirinê derdixîne û xetereyên ku têne dîtin, ji ber vê yekê xetereya kesane bi bawerîya bi hoşdarîyê ve girêdayî ye. Heke wesa be dê amanca hoşdarîyê bigihîje û dê bandorê li guhdêran bike (Thomas, 2012: 74). Ger name kurt be û wateya wê zelal be, anku name hilgira aborîyê be, wê demê encam dê baş be û bandorê li guhdêran bike. Ger nameyên hoşdarîkirinê ne zelal bin û xwedî wateyeke veşartî bin, wergir dê xwe di xetereyê da nebîne û dê bifikire ku name ji wî ra nehatîye şandin û ew ji xetereyê derketîye (Perry, 1981: 153).

Li gor van tiştên li jor, em dikarin ji bo zimanê hoşdarîkirinê hin taybetmendîyan dîyar bikin:

1. Zimanê hoşdarîkirinê aborîkirinê dihewîne, anku di nava xwe da kurtbirîyê bi kar tîne.
2. Zimanê hoşdarîkirinê zelal e.
3. Zimanê hoşdarîkirinê gelemperî ye, anku pîrzimanî ye.
4. Zimanê hoşdarîkirinê yek hizrê hildigire.
5. Zimanê hoşdarîkirinê amandardar e.
6. Zimanê hoşdarîkirinê arastedar e.

#### 1.4. Qadên Kirdeya Hoşdarîkirinê

Hoşdarîkirin di ziman da bi giştî karekî berfireh e û di jîyana civakî da xwedî roleke taybet e. Ji bo rêvekirina pêvajoya jîyanê tê bikaranîn da ku tu pirsgirêk û zehmetî dernekevin. Ji ber vê sînore berfireh ev kirde xwedî qadeke taybet e. Ev qad ji çar beşan pêk tê ku wê çalakîyê çêdikin.

1. Axêver “Hoşdarker”: Ev kes bi şandina nameyên hoşdarîkirinê ji komek mirovan ra an jî ji civakekê ra radibe, ku haya wan jê hebe û nekevîne tengasîyê. Axêver ji hêla hejmarê ve yek e, lê nameya hoşdarîkirinê dibe ku hilgirê fikir û ramanên komeke mirovan be. Di kirdeya hoşdarîkirinê da kesê ku nameyên hoşdarîkirinê pêşkêş dike, divê xwedî ezmûn be û bizane ku meriv çawa bi hişê mirovan ra mijûl dibe.

2. Guhdêr “Hoşdarkirî”: Kirdeya hoşdarîkirinê xwedî cihekî giring e û di gelek waran da xizmeta mirovahîyê kirîye. Ji ber vê yekê dema ku axêver nameyeke hoşdarîyê pêşkêşî kesekî yan



komek kesan dike, kesên ku ev name ji wan ra tê pêşkêşkirin dibêjinê guhdêr. Guhdêr ew kes e ku axêver rênîşanderîya wî dike, da ku di jîyana xwe da ji her xeletî û pirsgirêkan dûr bikeve. Dibe ku guhdêr yek an jî çend kes bin.

3. Mijar “Hoşdarî”: Mijara yan jî têkilîya di navbera axêver û guhdêran da, bi nameyên hoşdarîyê yan jî hoşdarî tê navkirin. Ev mijar ramanên axêverî ne, ev mijar bi xwe ra gelek peyamên ji hev cuda li xwe digirin. Hemû ji bo xizmeta guhdêran têne bikaranîn da ku ew ji hemû nexweşî û belayan bîn parastin.

4. Jîngeh “Hawirdor”: Axêver di derbarê civak û hawirdora guhdêran da xwedî agahdarî ye. Lewra dema ku nameyeke hoşdarîyê pêşkêş dike. Ji bilî ramana rasterast a di vê nameyê da gelek mijar û ramanên din jî hene, ku guhdêr wateya rast a nameya hoşdarikirinê fam bike, û bigihîje zanîna nîyeta axêver divê ew bi hawirdorê ra tevlihev bike, da ku nîyeta axêverê fam bike. Jîngeh ew jîngeh e ku hemû tiştên nezimanî di hundirê wê da hene, lê di kirdeya hoşdarikirinê da li ser hawirdora di navbera axêver û guhdêran da diaxivin.

## 2. Gotinên Mezinan

Gotinên mezinan di folklorê gelan da, wekî beşeke giring tê dîtin. Herweha yek ji amûrên herî binirx ên derbirinê û neynika zelal a şaristanîya gelan e. Ev xezîneyek mezin a serpêhatîyên mirovan e, ku hemû kevneşopîyên neteweyan dihewîne. Ji ber vê yekê miletan hertim giringîyeke mezin dane wê, gelek nixxên exlaqî, civakî, sîyasî û olî di xwe da dihewîne, anku gotinên mezinan ji bo mirov wekî makeqanûnan in. Her yek ji van gotinên mezinan derseke xweş dide me, ger em li gotinên mezinan binêrin, em dê bibînin ku wan di hemû aliyên jîyanê da cih girtîye û gotinên bikêrhatî ji bo her rewşê hene.

Di zimanê kurdî da, ji bo gotinên mezinan gelek peyv û têgeh hatine bikaranîn. Çimkî her herêmek li gorî dengnasî û zaravayê xwe peyvek bi kar anîye, weha: Gotinên Mezinan, Gotinên Pêşîyan, Pendên Pêşîyan, Pendî Pêşînan, Pende Bawekan...hwd. Ev yek ji ber dewlemendîya zimanê kurdî ye. Di *Ferhenga Kurdistan* da “Gotin” yanî pend tê wateya: Amojgarî, terin, moç, mûçyarî, amojyarî, rîyonî, bela, gêçel, ruşe, karasat, ketin, etik, hetik, serkone, bebirdin û namûsbirdinê tê bikaranîn. Herweha peyva “mazinan” tê wateya pêşîyan, bav, kal û rabirdûwan, yanî yên berî me tîn. Bi gelemperî gotinên mezinan tê wateya axaftin û serpêhatîya mirovên mezin ên berî me (Mokriyani, 1999: 165). Socadî li ser gotinên mezinan dibêje: Ew hevok in, yanî çend bêjeyên kurt ên kurdî bi hev ra hatine nivîsandin û wateyeke bilind di xwe da dihewînin. Ji mêj ve ketine ser zimanê kurdî, awayê jîyanê, urf û bawerîyan çî ji aliyê reftarên sîyasî, civakî, malbatî, dewlemendî û xîzanîyê li cîhanê dîyar dikin (Xankî, 2008: 13).

Gotinên mezinan di bingeha xwe da ji çîrok û serpêhatîyên rasteqîn hatine. Ev agahdarî bi devkî têne şandin û bi rengekî kurt û hêsan têne pêşkêşkirin. Amanc ew e ku hemû gel jê sûd wergire. Gotinên mezinan ji bo milet şîret û rêberîyê dikin. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku çendîn gotar û şîretên bi bandor û birêkûpêk ên bav û kalên me ne, gelek salan berî niha wekî çandek gihîştine me. Di jîyana xwe ya rojane da wekî delil û qanûn bi kar tînin, û sûd jê girtine (Şarezûrî, 1981: 7). Di serdemên kevnar da jîyan hêsan bû, û her tiştê ku dihat bikaranîn berhema wan bixwe bû, ev ders û çîrokên ku wan di bûyer û rewşên cuda da, di gotin çand û edebîyata wan

ya wê demê bû. Îro jî qanûn û destûr in ji bo ku em jîyana xwe pê bi rê ve bibin. Gotinên mezinan cureyekî edebî ye, ew bi kurtîya xwe, bedewîya wateyê, nazikîya hevgirtinê û rastîya têgihîştinê navdar e. Çi gel ji gotinên mezin vala nînin, yanî di nav hemû çînen millet da xuya dikin. Berevajî helbest û pexşana hunerî ya ku tenê ya çînen jorîn e (Herib, 1999: 146). Bi vê wateyê pêwendî û têkilîya gotinan bi civakê ra diyar dibe, anku ev gotin ji civakê hatine girtin. Milletê kurd rêzê ji gotinên mezinan ra digire. Di civaka kurdî da em dikarin bibêjin gotinên mezinan mil bi milê bîr û bawerîyên hemû olan, ayetên Qur'anê û hedîsên Pêxember (sxl) wekî qanonên civakî û aborî ji bo çareserkirina pirsgerêkên gel bikar anîne (Şareza, 1976: 12), Bi vê wateyê ev gotin di nav neteweya kurd da qanûn in, bîr û bawerîyên civakî yên neteweyê nîşan didin. Pîr caran bi van gotinan pirsgerêkên xwe çareser dikin.

### 2.1. Zimanê Gotinên Mezinan

Di gotinên mezinan da zimanekî sade û asan tê bikaranîn, zimanê rojane yê gel e. Yanî ne zimanekî felsefî ye. Vê yekê kir ku di nava gel da belav bibe û bikeve ser zarê her kesî. Çimkî zimanê gel, milkê hemû milletî ye, anku zimanê xwenda, nexwenda, dewlemend û feqîran e. Gotinên mezinan di civakê da derketine, yanî ev gotin berhema raman, dîtin, îdeolojî û têgihîştina neteweyê. Ji ber vê yekê zimanê ku di van gotinan da tê bikaranîn, zimanê rojane yê neteweyê ye. Loma jî derbirînê ji nax û dilê millet dike, û bi awayekî sivik û hêsan tê gotin. Ji bo ku civak bi tevahî têbigihîje û ji bo birêvebirina jîyana xwe bikar bîne. Gotinên mezinan di qonaxên destpêkê yên jîyanê da bi devkî dihatin bikaranîn, heta roja me ya îro bi piranî di nav kesên nexwendewar da têne bikaranîn. Yanî di qonaxên destpêkê yên jîyanê da, xwendin û nivîsandin kêmbû. Ji ber vê yekê axaftin bi awayekî melodîk dihate gotin, anku gotinên mezinan rîtmîk in, ew bi kurtî û hêza xwe ya rîtmîkî ji axaftina rojane têne cudakirin.

Gotinên mezinan afirandina herî biçûk ya devkî a zimanê neteweyî ye, di warê mantiq û rêzimanê da hevokeke temam e, bi piranî rîtmîk û kêşdar e, herweha kurt û sade ye. Lê ew ji bo ramanek taybetî pir dewlemend û ronî ye, ji serpêhatîya civakî û dîrokî ya neteweyê hatîye girtin (Ebdula, 2017: 95). Yanî gotinên mezinan kurt û dewlemend in, ger bê lêkolînkirin, ev dewlemendîya gotinên mezinan hemû vedigere zimanê wê. Çimkî bi zimanekî sade, hêsan, berfireh, zelal û ritmîk tê gotin û nivîsandin. Lewra her kesê gotinên mezinan bixwîne, dê fam bike û bifikire ku ji bo wî hatine nivîsandin. Çimkî civaka wî îfade dike. Loma jî tê gotin ku zimanê gotinên mezinan zimanê hemû milletî ye.

Zimanê gotinên mezinan bi awayekî xweş û lihevhatî hatîye nexşandin û xwedî rîtmeke xweş e. Carinan jî bi awayê helbestê tê gotin û nivîsandin, anku rîtmîk e û ziman jî pir sade û rewan e (Şareza, 1976: 15). Ziman di gotinên mezinan da rehendek giring e, bedewbûn, kurtbûn û sadebûna ziman, rûxsarên giring ên vê rehendê ne. Dema ku ev zimanê xweş bi naverokeke xweş ra were tevlihevkerin, dê gotinên mezinan wekî peykerê bedewîyê were dîtin, wekî vê gotinê “Bihar bi gulekê nayê”, di warê bedewîyê da hûn dê çend gotinan bibînin ku nîrxê wan bi zêr û koral e. Ev nîrx hemû vedigere ji bo ziman. Di gotinên kurdî da wêneyên zimanî yên xweş hene, bi kurdîyeke xweş, sivik, nazik, sade hatine nivîsandin. Peyvên ku ji bo nivîsandina gotinên mezinan têne bikaranîn, ji bo lêkolînê amûrên baş in. Çimkî hemû peyvên kurdî yên resen in, û hemû jî

yên milletê kurd in, ger peyvek bîyanî, wek: ‘erebî, farisî, tirkî..., tê da hebe, û ew peyvên bîyanî were lêkolînkirin, dê derkeve holê, ev peyv girêdayî zimanê kurdî ye, lê ew ji ber bazirganî an hatinûçûnê bi zimanên din ra tevlihev bûye. Ev ji bo ziman û ji bo gotinê nabe kêmasîyek, ji ber ku dîyardeyek zimanî ya normal e.

Gotinên mezinan beşeke giring a folklorê ne, û di jîyanê da cihekî giring digirin, di nava hemû civakan da têne zanîn û bi her qulaçên edebîyatê ra hatîye tevlihevkirin. Herweha ziman û gotinên mezinan têkilîyên dualî hene, anku zimanê gotinên mezinan berbelav û hêja kirine û ji aliyê din ve jî gotinên mezinan zimanê resen parastîye. Li ser zimanê gotinên mezinan tê gotin: Gotineke ji gotina hatî gotin cuda ye, lê ji aliyê wateyê ve nêzik in. Ziman û rîtim di gotinên mezinan da pir giring in, heta ku qaîdeyên rêzimanê jî dişikînin. Amanca vê yekê ew e ku rêzikên rêzimanê bişikînin, da ku rîtma axaftinê xirab nebe, wekî vê gotina mezinan:

Xwezîya sêwîya, ne hêvîya.

Gotin di nav gel da bi vî awayî hevpar e, lê gotina rastî ev e:

Xwezîya sêwîyan, ne xwezîya hêvîyan.

Belê da ku di warê formê da xweş be û di warê zimên da jî bi hêsanî û sivik were derbirîn, peyva xwezîya carekê hatîye bikar anîn û ji bo sivikkirina wê nîşana pir hejmarîyê hatîye rakirin. Gotinên mezinan xwedî zimanekî sade û zelal in, bi awayekî kurt têne pêşkêşkirin, ji ber vê yekê, ew bi hêsanî tên qebûlkirin û ji her babetên din ên wêjeya gelêrî bêtir belav bûne. Bi vê wateyê gotinên mezinan bi zimanekî bêasteng hatine naskirin. Destûrîbûna gotinên mezinan bûye sebeb ku piranîya mirovan ji wan gotinan bawer bikin.

## 2.2. Hoşdarikirin Wekî Rehendeke Gotinên Mezinan

Hoşdarikirin kirdeyeka axaftinê ya pir giring e, di çandê da bi gelemperî, û di gotinên mezinan da bi taybetî rolek mezin dilîzin. Ger mirov bi zanistî li gotinên mezinan binêre, dê dîyar bibe ku di hemû gotinan da hoşdarikirin heye, lê her gotinekê peyamek heye, anku nameyên hoşdarikirinê peyamên hoşdarî, şîret, tehdîd, tirsandin, rêberîyê hildigirin. Hoşdarikirin rehendeke giring a gotinên mezinan e, ji ber ku piranîya gotinên mezinan hoşdarîyan hildigirin. Gotinên mezinan û hoşdarikirin xwedî heman amanc in, û her du jî ji bo wê amancê dixebitin, ew jî xizmetkirina guhdêran e, û ji bo berjewendîya guhdêran têne pêşkêşkirin, ji bo ku pêvajoya jîyanê nesekine û bi pêş ve biçê. Ev nîşan dide ku peyamên hoşdarîyê yên ku di gotinên mezinan da hene bikêrhatî û bibandor in.

Herweha gelek taybetmendîyên hevpar û têkilîyên dualî hene, nameyên hoşdarikirinê yên di gotinên mezinan da hatine xemilandin bûne sedem ku millet bikeve bin bandora van gotinan, û ji bo jîyana xwe bike qanûn. Gotinên mezinan jî asta kirdeya hoşdarikirinê bilind kirîye û sînorê wê berfireh kirîye, heta wê astê ku hoşdarikirin di hemû aliyên jîyanê da cih girtîye. Zimanê hoşdarikirinê û zimanê gotinên mezinan wekî yek in, di warê kurtî, zelalî û pêşkêşîyê da rêbaza pêşkêşkirina van her du cureyan bi bûyeran ve girêdayî ye, ger hewce be, dê bi rengekî hişk û bi hêrs were pêşkêşkirin û heke rewîş aram be, dê bi rengekî sivik û xweş were pêşkêşkirin.

### 1.1.1. 3. STRATEJÎYÊN HOŞDARÎKIRINÊ DI GOTINÊN MEZINAN DA

#### 3.1. Modela Searle ji bo Kirdeya Hoşdarîkirinê

Di mijarên zimanî da bi gelemperî rêyên taybet yê analîzkirina kirdeyên axaftinê hene. Ji wan rêbaz û amûran ra stratejî tê gotin. Hoşdarîkirin bi gelemperî di ziman da û bi taybetî di pragmatîkê da karekî giring e. Loma ji bo ku ev çalakî bigihîje encam û nirxên rast divê bi stratejîyeke giring were şirovekirin.

Di vê beşê da em dê stratejîyên hoşdarîkirinê li gorî xwendina Searle bikar bînin. Gelek zimanzan ji bo kirdeya hoşdarîkirinê stratejî danîne. Lê piştî nirxandinek kûr, xuya bû ku stratejîyên Searle ji bo vê xebatê stratejîyên çêtirîn in. Bi van stratejîyan em dê hewl bidin ku bigihin têgihîştin û amancên rast ên gotinên mezinan.

Stratejîyên Searle li ser çar cureyan têne dabeşkirin (Elî & Koçer, 2021: 57-61). Bi vî awayî:

#### 3.1.1. Hoşdarîkirina Eşkere (Explicit Warning)

Ev stratejî bi awayekî eşkere ye. Zelalbûna vê stratejîyê vedigere ji bo wan huner û formên di nav da. Amanc ji vê yekê ew hêz û melodîya di vê stratejîyê da ye. Hin peyv hene ku têgehên cextkirinê “tekîdkirinê” hildigrin. Ev peyv hêza xwe di hevokê da digirin, wek: sond, formên nerêkirinê û formên pêwîstîyê...hwd (Elî, 2023: 89). Di vê stratejîyê da awaza “melodî” jî heye, her ku awayê gotina hevokê hat guhertin, yanî hin peyv tên girankirin an tên guvaştin an jî bi awayekî hêrs tên gotin. Ev yek wateya hevokê ya rast xirab dike. Bi vî awayî hevoka ragihandin dibe hevoka pirsî û fermanî. Ev cure hoşdarîkirin di gotinên mezinan da bi zelalî tên dîtin. Wekî ku li jor hatî behiskirin. Hoşdarîya eşkere ji hêla hêz û awaza xwe ve ji stratejîyên din ên hoşdarîyê tên cuda kirin. Amanca hêzê bikaranîna peyvên serdest û cextkirî ne, wek: sondxwarin, peyvên pêwîstîyê, peyvên redkirinê, peyvên nalîn, peyvên du‘akirinê. Herweha wateya awazê jî dema ku awayê gotin û bilêvkirina axaftinê diguhere, lê di gotinên mezinan da awaz tune ye. Ji ber ku gotinên mezinan bi awayekî xweş û bikêr tên gotin, dema ku awaz di gotinên mezinan da bê bikaranîn, dê wate û giringîya xwe winda bike, û namînin gotinên mezinan dê bibin gotinên rojane. Ev cureyê hoşdarîkirinê bi vî awayî di gotinên mezinan da tê bikaranîn:

Yê bi serî sond xwarî (Rêkêş Amêdî, 2019: IV: 1082).

Ev gotina mezinan bi eşkere hoşdarîkirinê dide, bi rêya bikaranîna peyva “sond”, dema ku şer an pirsirêk çêdibe, heke kesek were êşan an birîndar bibe, heke ew kes biryara tolhildanê bide, wê demê ev gotina mezinan tê gotin. Raman ew e ku sond xwarîye, ku dê heyfa xwe hilîne. Amanca vê gotinê hişyarkirina kesên gunehbar e da ku ji wî kesî dûr bikevin.

Emanet, emanetê Xwedê ye (Oncu, 2020: II, 1170).

Ev gotin hoşdarîyek xweş pêşkêş dike, bi rêya peyvên “emanetê Xwedê”, ev peyv ji bo vê gotinê formeke hêzê ye, ji bo parastina emanetê tê xuyakirin, anku ew emaneta Xwedê ye, yanî divê meriv hay jê hebe û dest nekinê. Herweha divê ew baş bîn parastin, heta xwedanên emanetî werin.

Heta bi çavê xwe nebînî, sondê li ser nexwîne (Amêdî, 2019: IV: 966).

Di vê hevokê da peyvên “sond nexwin” an jî sond nexwînin formeke hêzê ye, bi rêya vê formê tê zanîn, ku ev gotin bi eşkere hoşdarîyê dide mirovan. Mebesta vê yekê ew e her tiştê ku mirov dibêjin hûn bawer nekin. Çimkî her kes jî bo berjewendîyên xwe diaxive. Ev gotin mirovan hoşdar dike, ku heta hûn tiştêkî bi çavên xwe nebînin bawer nekin, û sond nexwin. Herweha dibêje ku nabe axaftinên xelkî bandorê li me bikin û em bibin dîvelankên wan. Ev gotina mezinan li jêr jî hatîye analîzkirin, jî bo wê yekê ku ev stratejî ji hev bînin cuda kirin.

### 3.1.2. Hoşdarîkirina Nepenî (Implicit Warning)

Ev stratejî wateya wê yekser nayê dîtîn, lê ramanek an xeyalekê hildigire. Bi vê wateyê ne awaz, ne hêz ne jî şeweya axaftinê û hevokê heye. Herweha wateya wê bi rêya derdorê jî yekser nayê dîtîn. Ji bo famkirina wateya rastîn a vê stratejîyê, divê em xwedîyê agahdarîyên baş bin. Ji ber ku hêza vê stratejîyê vedigere jî bo xeyalek taybetî. Ev fikrên xeyalî vedigerin bawerîyên olî, civakî, netewî, însanî...hwd, ev fikir di dilê civakan da hatine çandin, bi vî awayî dê asta têgihîştina gel derkeve holê. Ji ber ku her kes nikare wateya rastîn a vê stratejîyê fam bike. Navê vê stratejîyê jî wê yekê hatîye, ku her kes jî fikir û bawerîyên ku tene bikaranîn bawer nakin, û guman li cem wan derdikeve. Çimkî dibe ev civak xwedî asteke nizim ya zanîne be, an jî xwedî fikir û bawerîyên cuda bin. Anku jî her sê stratejîyên din cuda ye. Bi vê wateyê hêz û melodîya axaftinê nîne û wateya wê bi forma gotinê nayê îfadekirin û tu wateyên nerasterast jî nagire, yanî derdor di vê stratejîyê da rol nalîzin. Ev stratejî bi vî awayî di nava gotinên mezinan da tê xuyakirin:

Bawerîya kurdan her bi çîya tê (Oncu, 2020: III, 769).

Ev gotin fikra bêdewletbûn û bêxwedîyê hildigire. Ev fikir di nav piranîya kurdan da heye, dibe ku hinek bibêjin ev fikir derew e, lê ev bêdewletbûn jî bo kurdan bûye derd. Ji ber vê yekê, ev raman di vê gotinê da bi xweşikî hatîye xemilandin, bi vê fikrê kurdan hoşdar dike ku bibin yek û jî bo berjewendîyên neteweya kurd kar bikin. Rast e wê çîya kurdan bihewîne, lê çîya nikarin jî hemû Kurdan ra xwarinê amade bikin, lewma divê ev gotin bandorê li kurdan bike, ku bibin yek, ev fikir wekî bawerîyeke netewî ye.

Tûyek li hewşa xwe çand (Se‘îd, 2011: 49).

Di vê gotinê da peyva “Tû” û kurdayetî bi hev ve girêdayî ne. Dema kurd li cihekî binecî ban dareke tûyê di mala xwe da diçandin, yanî fikrên wan ên kurdewarî saxlem in. Li çîya nebin jî dê kurd bin û xizmeta kurdayetîyê bikin, eşkera ye her kesê ku kurdayetîyê bike, ew dê yan bê girtin yan jî bê kuştin yan jî neçar bimîne jî welêt bireve, ev qedera kurdan e. Amanca vê gotinê ew e ku ji xwe ra felaketek çêkir, vê ramanê wekî bawerîyeke netewî di jîyana kurdan da cihê xwe girtîye.

### 3.1.3. Hoşdarîkirina Rasterast (Direct Warning)

Ev stratejîya hoşdarîkirinê rasterast di gotinên mezinan da xuya dibe. Anku rasterast di navbera pêkhateya gotinê û erkê gotinê da têkilîyek heye. Ev yek bi awayên ragihandin, pirs û daxwazan tene îfadekirin, gelek caran peyvên rasterast jî hene, ku vê stratejîyê îfade dikin, ev stratejî bi vî awayî di nava gotinên mezinan da xuya dibe:

Gelê raze ranabe, lînexî hişyar nabe (Oncu, 2020: I, 54).

Ev gotin hoşdarîyeke rasterast pêşkêşî miletî dike, ev yek bi rêya peyva “hişyar”, anku şiklê ragihandinê ye. Ev çend delîl e ku ev gotin rasterast civak û mirovan hoşdar dike, ev tê wê maneyê ku ger civak û netewe hişmend û zana ne bin, ji bo hişmend kirina wan zordestî û lêdan hewce dike, bi vê wateyê ger civak bikeve xewa xefletê, ji bo şiyarkirina wan pêwîstî bi hêzê heye.

Ku mirov qenc be, dinya qenc e (Oncu, 2020: I, 845).

Ev gotina mezinan hoşdarîkirina rasterast pêşkêş dike, ev bi rêya forma ragihandinê tê kirin. Vê gotinê hoşdarîyek xweş bikar anîye, dibêje: Ger hûn dixwazin dinya, yanî mirov û civak ji me ra baş bin, divê hûn ji wan ra dilovan û rêzdar bin. Çimkî qencî û xirabî di destê mirovan da ye. Heke tu baş bî, hemû dinya baş e û heke tu xirab bî, hemû dinya xirab e. Anku hûn ji kirinên xwe berpîrs in, bi vê wateyê ger hûn vê gotinê bişopînin û di jîyana xwe da pêk bînin, jîyan dê pir çêtir be, ev yek ruhê lêborîn û dilovanîyê li civakê belav bike.

Heta bi cavê xwe nebînî, sondê li ser nexwîne (Amêdî, 2019: IV, 966).

Ev gotina rasterast û di şiklê ragihandinê da hoşdarîyek giring radigihîne. Ev gotina mezinan ji bo civaka me ya îro pir pêwîst e. Ji ber ku îro her kes li gorî daxwazên xwe behsa mirovan dike. Kesek rast behsa mirovan nake, mebesta vê yekê ew e, ku tiştê te gotin ne rast e, ji ber vê yekê divê meriv hişmend be, ku nekeve tengasiyê, tenê tiştên ku hûn bi çavên xwe dibînin bawer bikin. Herweha behsa sîfetên baş ên mirovan bike û yên nebaş veşêre. Çimkî Xwedê û civak ji kesê ku xirabîyên kesên din vedişêrin hez dike.

### 3.1.4. Hoşdarîkirina Nerasterast (Indirect Warning)

Ev stratejî bi awayekî nerasterast di gotinên mezinan da xuya dibe, wekî ku ji navê wê jî diyar dibe, di navbera forma axaftina mezinan û erkê wê da têkilîyek nerasterast heye. Di vê stratejîyê da jîngeh roleke giring dilîze. Ger gotinê tevî hawirdorê nekin, wateya wan a nerasterast xuya nabe. Ev stratejî di piraniya gotinên mezinan da heye. Ji ber ku piraniya gotinan peyamek nerasterast hildigirin, da ku bikarin di nav gel û civakan da hoşdarîyê bidin. Ev stratejî bi hemû awayan, wekî: ragihandin, pîrs, ferman, amaje, eger û encam tê îfadekirin. Ev stratejî bi vî awayî di nava gotinên mezinan da xuya dibe.

Hêrsa qîzê, kela dîzê (Oncu, 2020: III, 167).

Ev gotin bi awayekî nerasterast derbarê hêrsa jinê da agahîyan dide. Dibêje hêrsa keçikê wekî kela qazanê ye, yanî zû germ dibe û zû sar dibe. Mebesta vê yekê ew e ku gava keçek aciz dibe, divê hûn li ser xwe bin û bi gotinên xweş pê ra biaxivin, ji ber ku xwezaya jinê ye ku ji tiştên biçûk aciz bibe û hûn dikarin wê bi gotineke xweş aram bikin. Giringiya vê gotinê ew e ku dema ku jin aciz dibe, tu bi awayekî ciwan û bi rêz pê ra biaxve, ji bo ku tu pîrsgirêk dernekevin, dema tu vê serederîyê pê ra bikî, wê şerm bike û lêborîna xwe ji te bixwaze.

Ew bîra te av jê vexwarî, kevira navêjê (Şingalî, 2010: 10).

Ev gotina mezinan bi awayekî nerasterast hoşdarîyekê dide mirovan. Mebesta vê yekê ew e, ku nabe meriv bê nan û xwê be, yanî dema kar û berjewendîya meriv ji yekî yan tiştêkî ra xilas bibe, divê meriv bi xirabî qala wan neke. Ger ew mirovekî xirab jî be, divê tu xirabîya wî veşêrî û

ji mirovan ra nebêjî, ji ber ku ji we ra alîkarî û fêde kirîye, ger mirov vê gotinê bişopînin û jîyana xwe da bi kar bîne, di nav mirovan da dê ruhê hezîkirinê hebe.

### Encam

Hoşdarîkirin kirdeya axaftinê ya herî giring e. Bi gelemperî roleke girîng di ziman de û di pramatîkê da jî roleke taybet dilîze. Ev kirde di wêje û hemû qadên jîyanê da jî tê dîtin, çimkî nameyên hoşdarîkirinê bi zimanekî sade, zelal û kurt ji bo civakê tên pêşkêşkirin. Ji ber vê yekê pêşwazîyeke baş li van nameyên hoşdarîkirinê tê kirin. Ev îsbat e ku kirdeya hoşdarîkirinê bandorek baş li ser dil û mejîyê mirovan kirîye.

Gotinên mezinan beşeke giring a edebîyata folklorî ye, di encama bûyerên jîyanê da peyda bûne. Li gorî felsefe û asta zanîna neteweyan derbarê jîyana civakî da tê hejmartin, wekî çandekê pêşîn tê hesabandin, û mîna neynikekê ye, ku kevneşopî û serpêhatiyên neteweyê nîşan dide.

Modela Searle ji bo kirdeya hoşdarîkirinê, bi êşkere di gotinên mezinan da tê dîtin. Anku her çar stratejîyên hoşdarîkirinê, bi ciwanî li ser Gotinên mezinan hatine analîzkirin. Ew stratejî ev in:

Hoşdarîkirina êşkere di nav gotinên mezinan da bi awayekê zêde nayê dîtin, lê em nikarin bê-jin nîn e. Çimkî di gotinên mezinan da gelek awayên hêzê hene. Lewma awaz di gotinên mezinan da nîn e, ev stratejî bi kêmî tê dîtin.

Hoşdarîkirina nepenî di nav gotinên mezinan da gelek kême e. Çimkî asta vê stratejîyê bilind e, ji ber ku derbirinê ji gelek hizir, pirsgerêk û bawerîyên xurt dike. Civak gelek çaran ji van bawerîyan bawer nake û qebûl nake. Çimkî dibe ku ew bawerî li cem hemû civakê ne gunca be. Herweha hemû mirov ne xwedî asteke başzanînê ne, ku van ramanan fam bikin. Ev stratejî delîl e ku gotinên mezinan ramanên baş û hêja hildigirin.

Hoşdarîkirina rasterast, ev stratejî di nav gotinên mezinan da bi başî tê dîtin, anku di nav mîletî da zêde parve bûye, ji ber ku wate û mebestên vê stratejîyê bi rêya forma gotinên mezinan tê zanîn. Ev nîşana wê yekê ye ku gotinên mezinan bi zimanekî sade tene gotin, dixwazin kêrî civakê bînin, lewma bi awayekî rasterast peyamên hoşdarîkirinê pêşkêşî civakê dikin.

Hoşdarîkirina nerasterast di nav gotinên mezinan da bi awayekî zêde tê dîtin, anku di nava piraniya gotinan da heye. Mezinan xwastîye hin peyamên hoşdarîkirinê yê nerasterast bidin civakê, da ku hişmend bin, û di jîyanê da baş bifikirin. Herweha bi awayekî zanistî bûyer û pêşhatan bi rê ve bibin.

## ÇAVKANÎ

- Amêdî, R. (2019). *Ferhenga Gotinên Mezinan*. Dihok: Parêzgeha Dihokê.
- Aykaç, Y. (2022). Kêşeya Wergera Biwêj û Gotinên Pêşyan di navbera Tirkî û Kurdî de. *Bin-göl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 7(14), 69-83.
- Açar, Z. (2020). Wergera ji Tirkî bo Kurdî û Bikaranîna Hin Peyv û Qalibên Girîngê ên Kurdî di Wergerê de. *Kurdiyat*(1), 83-103. <https://doi.org/10.5281/zenodo.3895077>.
- ‘Ebdula, E. M. (2017). *Gotara Civakî di Gotinên Mezinan da “Devera Behdînan” Wekî Mî-nak*. Teza Lîsansa Bilind. Zanîngeha Dihok: Kolîja Perwerda Binyat.
- Elî, Ş. S & Koçer, D. X. B. (2021). *Ziman û Hoşdarîkirin*. Dihok: Gazî.
- Elî, Ş. S. (2020). *Şirovekirina Gotarê*. Dihok: Muksî.
- Elî, Ş. S. (2023). *Ji Watayê Bo Watayê “Komeka Vekolînan”*. Dihok: Gazî.
- Herb, T. (1999). *Ewlîyetu’l-Nes*. Lubnan: Weşanxana el-Mu’essestu’-Cami’îyye li’ d-Dirasat we’n-Neşri we’t-Tewzî’.
- Hinkle, E. (1997). “The Appro Priateness of Advice, Dtc and Multi Choice Date”. *London: Routledge*, 4(3), 49-68.
- Îbn Menzûr. (1999). *Lîsanu’l-‘Ereb*. (Çapa Sêyem). Lubnan: Îhya et-Turas el- ‘Erebî.
- Mokriyani, K. (1999). *Ferhengî Kurdistan*. Hewlêr: Aras.
- Oncu, M. (2020). *Gotinên Pêşyan*. Wan: Sîtav.
- Parker, F & Riley, K. (2005). *Linguistics for Non-Linguistics Library of Congress Cataloging in data*. Printed in USA.
- Perry & Etal. (1981). *Evacuation Planning Emergency Management*. Lexington. Massachusetts and Toronto: Lexington Books.
- Şareza, K. (1976). *Pendî Pêşînan le Şî’rî Kurdî da*. Bexda: Korî Zanyarî Kurd.
- Şarezorî, E. M. (1981). *Pendî Pêşîna*. Bexda: el-Hewadis.
- Searle, J. R. (1975). “Indirect Speech Act”. *New York: Academic Press*. 3(1), 54-82.
- Se‘îd, N. M. (2011). *Çend Gotin û Pejnên Kurdan Ji Devera Badînan*. Dihok: Hawer.
- Silêman, L. F. (2021). *Kirdeya Gefkirinê Di Zimanê Hozanê da “Dîwana Baxê Kurda”*. Dihok: Gazî.
- Şingalî, E. E. (2010). *Gotinên Mezinan û Îdyom Li Çiyayê Şingalê*. Silêmanî: Şivan.
- Solomon, K. A. (1995). *Warning: When Do They Help, When Do They Hurt*. Santa Monica Rand.
- Thomas, E. D. (2012). *Human System Responses to Disaster*. New York: Fifth Avenue.
- Xankî, K. (2008). *Gotinên Mezinan di Hozana Ceger Xwîn da*. Dihok: Azadî.





# KARWAN, EŞÎR Û BAZINBELEK: NÊRÎNEK LI VARYANTÊN FILÎTÊ QUTO

Tarık YORĞUN

Kervan, Aşîret ve Tüfek: Filîtê Quto'nun Varyantlarına Bir Bakış  
Caravan, Tribe and Rifle: An Overview of the Variants of Filîtê Quto

## Tarık YORĞUN

ORCID: 0009-0002-3576-2948 | tyorgun30@gmail.com  
Graduate Student, Institute of Living Languages, Department of Kurdish Language and Literature, Bingöl University, Türkiye.

## Citation/Jêgir/Atîf:

Yorğun, T. (2024). Karwan, eşîr û bazinbelek: Nêrînek li varyantên Filîtê Quto. Kurdiyat (9), 39-76. DOI: 10.55118/kurdiyat.1488769

## Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolînê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 23.05.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 20.06.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2024

## Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/  
Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

## Reviewing and Plagiarism/Nirxandin û İntihal:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./ Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

## Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyan:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî tîkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

## Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

## Grant Support/Alîkarîya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almamıştır.

## Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

**Kurte**

Kilama dirêj a bi navê Filîtê Quto tê nasîn, yek ji wan vegêrana ye ku di nava kurdan da gelek berbelav e û ji aliyê gelek dengbêjên ji herêmên cuda ve tête gotin. Ev vegêran xwe dispêre şerekî di navbera du eşîran da ku di dawîya sedsala 19an da li herêma Bişêriya Batmanê qewimîye. Qewama ku zêdetir bi navê Filîtê Quto belav bûye, di gewher de ji ber babeta bacwergirtina ji karwanên eşîra Etmanekan derketiye holê. Ji ber navdarbûn û berbelaviya xwe di nav çanda devkî û civaka kurdî da, ev qewimîn bûye babeta vegêranên cihêreng ên wekî stran, kilam û kilamên dirêj û herwiha bûye babeta xebat û vekolînan. Ji ber ku li qadeke berfireh tê vegêran, li gorî varyantan hin xalên vegêranê da guhertinên berçav derdikevin pêş. Ev xebat dixwaze xelekên sereke yên ku di navbera varyantan da diguherin, tespît bike û wan li gorî epîzodên varyantan bide ber hevdu. Her wiha ev xebat hewl dide rola çanda devkî û dengbêjiya kurdî binirxîne di çarçoveya belavkirin û navdarkirina van qewamên sedsala dawî di nav civaka kurdî da. Di vê xebatê de, kilama Nuroyê Meter ku yek ji vegêrana herî dirêj û kamil a li ser Filîtê Quto ye hate bernivîsandin. Di kilama Nuroyê Meter de, rêzêrûdana vegêranê ji amadekariya karwanê eşîra Etmaneka dest pê dike û gelek xalên sereke yên vegêranê yên wekî taybetiyên karwanan, armanca bazirganiyê, diyalogên bi bazirgana ra û her wiha daxwaza Elî Etmanekî ya dîtîna Almas Xanimê û kuştina Filîtê Quto tê da bi hûrgilî tîn behskirin. Çend xalên sereke yên cudahiya vê vegêranê ji bo danberheviya bi varyantên din re wekî bingeş hate bikaranîn.

**Peyvên Sereke:** Dengbêjî, Çanda devkî, Epîzod, Varyant, Filîtê Quto.

**Özet**

Filîtê Quto olarak bilinen uzun *kilam* Kürtler arasında çokça bilinen ve birbirinden ayrı coğrafyalardaki birçok dengbêjin söylediği bir anlatıdır. Bu anlatı 19 yy. sonlarında Batman'ın Beşiri bölgesinde yer alan iki aşiret arasında yaşanan çatışmayı konu edinmektedir. Daha çok Filîtê Quto olarak bilinen bu olay, özünde Etmaneki aşiretinin kervanından alınmak istenen yol haracından dolayı yaşanmıştır. Kürt toplumunun sözlü geleneğinde çokça bilinen popüler bir anlatı olduğu için, bu güne kadar dengbêjler arasında icra edilmiş ve çeşitli araştırmalara kaynaklık etmiştir. Çok geniş bir coğrafyada söylenen bir kılâm olduğundan varyantların bazı bölümlerinde gözle görülür farklılıklar gözlemlenmektedir. Bu çalışmada varyantlar arasında değişen, belli başlı farklı bölümleri tespit ettik ve bu varyantları çeşitli epizotlara göre karşılaştırdık. Çalışma kapsamında Kürt sözlü kültürünün, son yüzyıllarda yaşanan olayların aktarılması ve toplumun geniş kesimlerinde ulaştırmasındaki rolü de irdelenmiştir. Karşılaştırma çalışması için Dengbêj Nuroyê Meter'in söylediği uzun ve kapsamlı Filîtê Quto kılâmının varyantını esas aldık. Bu varyantta Nuroyê Meter, olay örgüsünü Etmaneka aşiretinin karvanlarını hazırlama aşamasından başlatıyor, ticaretin amacı, tüccarlarla olan diyalogları ve aynı zamanda Etmanekili Ali'nin Almas Hanımı görme ve Filîtê Quto'yu öldürme isteği gibi başlıca konular detaylıca işleniyor. Bu anlatının başlıca epizotları diğer varyantlarla karşılaştırmalı bir biçimde ele alındı.

**Anahtar Kelimeler:** Dengbêjlik, Sözlü gelenek, Epizot, Varyant, Filîtê Quto.

**Abstract**

The narrative, or kilam, known as Filîtê Quto, is widely known among Kurds and recounted by many dengbêjs across various regions. Originating in the 19th century, this narrative is based on a conflict between two tribes in the Beşiri region of Batman during the late 1960s. The incident, more commonly referred to as Filîtê Quto, happened mainly due to a road toll that was attempted to be imposed on the caravan of the Etmaneki tribe. As a well-known and popular event within the oral tradition of Kurdish society, Filîtê Quto has been the subject of oral tradition studies. Given its wide geographic dissemination, notable differences can be observed in various parts of its variants. In this study, we identified major divergent episodes among these variants and conducted a comparative analysis of the variants based on these episodes. Additionally,

we assessed the role of Kurdish dengbêjî tradition in popularizing and disseminating the events of the past century within Kurdish society. For comparison, we used the longest and the most detailed variant of the Filîtê Quto narrative, sung by Nuroyê Meter. In this version, Nuroyê Meter begins the story with the preparation of the Etmaneka tribe's caravans, and describes key elements such as the purpose of their trade, their dialogue with merchants, and Etmaneki Ali's desire to meet Lady Almas and kill Filîtê Quto. These main themes of the narrative were used as a basis for comparison with other variants.

**Keywords:** Dengbêjî, Oral tradition, Episode, Variant, Filîtê Quto.

### Destpêk

Di dawîya sedsala 19em da li herêma Xerzan a ku dikeve navbera bajarê Bidlîs û Batmanê, di navbera serokê eşîra Reşkotan Filîtê Quto û serokê eşîra Etmanekîyan Emê Etmanekî da şerêk diqewime û derdora pêncî mirovî di encamê da têne kuştin. Piştî vî şerê navborî dengbêj vê qewamê dikine nava vegêranên xwe û li seranserê welêt belav dikin. Li gor çavkanîyan şerê Filîtê Quto û Emê Etmanekî di navbera salên 1860-70î, an jî di navbera salên 1880-90î da qewimiye (Alpar, 2018: 4) û ji wê serdemê heya roja me ya îro bûye kilam/miqameke sereke di nava tradîsyona dengbêjîyê da. Herçiqas li gor varyantên berdest, sedema derketina vê qewamê jî hevdu cuda bin jî rastîyek li ber çav e ku di vê qewamê de gelek kes hatine kuştin. Kilama ku li ser vê qewamê derketiye, ya bi navê Filîtê Quto, ji heremên Qafqasyayê heya Şingal, Zaxo û Dihokê, ji Efrînê heya Serhedê di nava cimaet û civînên kurdan da tê/hatîye vegotin. Em dikarin bibêjin ku heta îro belkî bi sedan dengbêjî ev qewam bi kilamên xwe ve di nava civat û şevbihêrkan da gerandiye. Bi saya serê çanda devkî ya kurdî gelek qewam û serhatîyên ji bo civakê giring bi vî rengî di nava civaka kurdan de hatine parastin û rolên cihêreng ên civakî, çandî û adetî wergirtine. Her wiha vê çanda devkî kir ku dîroka kurdan a nêzîk, di hiş û bîra civakî da zindî bimîne û civak bikare di encama wan vegêranan da çendîn aliyên baş û xirab derxe û xwe bi pê ra rêk û pêk bike.

Li gorî dane û berhemên berdest, xebatên li ser şerê Filîtê Quto hatine kirin li gorî lêgerîna lîteratûrî ya ku me kirî wiha ne; varyanta Dengbêj Reso (Güneş & Şahin, 2019: 204 -209; Gültekin, 2013: 155-169), Dengbêj Huseyno (Güneş & Şahin, 2021: 269-275) û Dengbêj Silêmanê Hacî Osê Nemet (Akyol, 2015: 112-113), Dengbêj Salihê Qubinî, Cahîdê Dengbêj û Karapêtê Xaço (Kevirbirî, 2009: 60 - 74). Xêncî van, Gültekin li gel ya Dengbêj Reso, varyanteke Dengbêj Kerem (2013: 155-162) jî bernivîsandîye. Ji aliyê dî ve sê varyantên kilama Filîtê Quto ku ji hêla Dengbêj Reso, Karabêtê Xaço û Dengbêj Nesoyê Zado bûye mijara xebata lîsansa bilind a bêtez a Hikmet Alpar (2018). Herwiha Recep Çapan (2019) jî varyantên sê dengbêjan nîrxandiye. Dîsa Hecîyê Cindî di pirtûka bi navê *Folklorê Kurmancîyê* da ev kilam bi navê “Karwan Rabû” nivîsiye û belav kirîye (2016). Li gel van berhemên weşîyayî û çapbûyî, filmeke dirêj a Filîtê Quto di TRT Kurdî da hatiye pêşkêşkirin. Ev filma navborî ya bi kurmancî ku bi giştî 27 deqe ye, şerê Filîtê Quto aniye ser ekranê (TRT Kurdî, 2022). Bi pê ra Koma Weten ku yêkem koma *rocka* kurdî jî tê nasîn, bi awayekî hunerî li ser Filîtê Quto straneke bi navê “Filîtê Quto – Şemmê Rebenê” gotine û belav kirine (Koma Weten, 2010). Tevî van xebatan çend bernameçêkerên serbixwe û qenalên TV ên kurdî, şerê Filîtê Quto kirine bername û weşandine (Waar TV, 2022; Rudaw TV, 2019; Sorgul, 2022; Erkmen, 2019). Her wiha bi qasî ku em gihîştinê bi dehan dengbêjan jî ev

kilama Filîtê Quto gotine û li ser torên civakî hatine belavkirin.<sup>1</sup>

Em jî dê di vê xebatê da hewl bidin ji çar varyantên Filîtê Quto, çar epîzodan bidin ber hev. Wekî destpêka xebatê, me nirxandina çanda devkî kir û piştê da naveroka kilamê baştir bête nirxandin, kurteya çîroka şerê Filîtê Quto û kurteya her çar varyantên danberhevîyê berpêş kir. Di berdewamê da me derheqê epîzodê kurteagahiyek da û li gor çar varyantên kilamê çar epîzod dane ber hev. Herî dawî me di pêvekê da bernivîsa kilama Filîtê Quto ya ku me ji varyanta Dengbêj Nuroyê Meter wergirtî ku li gor daneyên berdest yek ji wan vegêranên herî dirêj û berfireh e, pêşber kir.

## 1. Çanda Devkî a Kurdî û Dengbêjî

Bi gelemperî têgeha çandê wekî tekiliyê avaker ya civakîbûnê hatiye pejirandin. Ev têgeh berê bi wateya çandina hin tiştan, hilberîna tiştên ku hatibin çandin dihate bikaranîn. Di sala 1871ê da antropologê bi navê Tylor wateyê zanistî li vê bêjeyê bar kiriye. Li gor Tylor, çand ji dema ku mirov wekî qebîleyan dijiyan û vir ve heye. Dîrokî ye, bi pêvajoyê re ava dibe. Di nav çî welatan da bi carekê derneketiye holê, belê mayînde ye ku ji nifşekê tê veguhastin ber bi nifşekê dî ve (Çiftçi, 2015: 111) û bi vî terehî hem rola xwe ya esasî pêk tîne û hem jî paşxaneyêke bîra hevpar a civakî ava dike. Di nava civaka kurdan da jî çanda devkî pêş ketiye. Çanda devkî ew çand e ku bi rêya deng û rûbirû bi pêş dikeve û bi taybetî di nava wan çandan da ku nivîs û teknoloji pêş neketiye. Hemî mijar, bûyer, binyad, teşe û fonksiyonên ku bikarin veguhastinê ava bikin, dikevî nava çarçoveya vê çandê ya ku bi tekiliyê û bi devkî di navbera nifş û kesan da digere (Kardaş, 2017: 3). Çend taybetiyên hunera devkî yê ku di pêvajoya vegêranê da pêk tîne wiha ne:

“Ya yekemîn vebêj di şuna hevokên dirêj, hevokên kin û bi pey hev bi kar tîne, ya duyemîn vebêj, di cihê veçirînê da, berhevkerîne esas digire. Tiştên ku tim li hev tîne bi kar tîne. Piştî demekê ev gotin, di nava vebêjan û çanda devkî de dibin qalib û zû bi zû ji bîr nabin. Xala sêyemîn, dubareya zêde û bi ber e. Bi vê rebazê ve vebêj plana xwe ji bîr nake û ji bo berdewama vegotina xwe ji xwe re demekê vediqetîne. Ahenga gotinê wînda nabe. Xala çaremîn, “kevneperestî” ye. Kesên ku çanda devkî diparêzin, ji bo ku tiştên ku bi kedê hîn bûne ji bîr nekin, hişk bi adetan digirin.” (Çiftçi, 2015: 113).

Bi pêkanîna vê çarçoveya taybetmendiyên çanda devkî kir ku bûyer, mîtoloji, evîndarî

<sup>1</sup> Me lêgerînek biçûk tenê li ser Youtubê kir û ji 50 kilamên ji dengbêjên cuda rastî me hatin. Hinek ji wan dengbêjên ji herêmên cuda ku ev kilam gotine ev in: Dengbêj Şakiro, Dengbêj Aydın, Karabête Xaço, Ferzoyê Rizo, Egîdê Cimo, Reşîdê Beso, Dengbêj Huseynê Muşî, Dengbêj Ehmedê Bêrtî, Dengbêj Zahiro, Dengbêj Teyîbê Qurtalanî, Dengbêj Reşîdê Patnosî, Dengbêj Salihê Beynatî, Dengbêj Sidîqê Qarlıova (Bozo), Dengbêj Elendê Usiv, Dengbêj Xenî, Dengbêj İsmailê Selîmîyê. Dengbêj Ehmedê Qilîçîyê, Mihemed Canê Xerzî, Tahiro, Mistefayê Cangoranî, Mihemedê Canşah, Hacî Aşur, Hekîmo, Fetoyê Hodik, Brahîmê Pirîkî, Hiznî Kizavî, Fadîlê Kufragî, Hesênê Şîlbê, Teyîbo, Tahir Çolak, Selîmê Batmanî, Maşalyê Qizilagacê, Kurmanç Bakurî, Mihê Xemo, Faîkê Kiffê, İsa Evdirrehman, Arif, Mihyedîne Hezêrxî, Evdilkerîmê Patnosî, Emerê Entaxê, Hecî Salih, Hekîmo, Remzî Moral, İsevê Evdirrehman, Dengbêj Museyib, Mehmet Emîn, Eskender Gulî, Celoyê Babiya, Dengbêj Elbarî, Şamilê Beko, Adil Dîlmaç û Dengbêj Henîfê İsmet û Çîrokbêjê Şengalî Mamê Emer û helbet gelek varyantên din ji hene ku diqewime ku me bi dest nexistibin.

û qewimînên girîng ên di dîroka kurdan da hatine pê, xwe bi asoya nîfşên nûjen ên civakê ra bigihînin. Her wiha ev feraset him ji bo neqşandina bîra civaka kurd bû bingehek qewîm, him jî bo avakirina hizra netewe û netewedewletê roleke karîger pêk anî (Alan, 2013: 31). Li gel van taybetiyên di çanda devkî da dengbêjî jî cih û roleke giring dilîze di vegêrana qewamên dîrokî yên di nava kurdan da. Wekî peyvê dengbêj ji peyvên ‘deng’ û ‘bêj’ê pêk tê û bi terîf û şiroveya navê xwe ve cextê dibe li ser deng û bêj(i)yê. Deng, îşaretê bi wê deqa devkî ya hunerî dike ku bi bêjê ve dibe meqamê ku tê vegêrandin. Bi vî awayî, îcrakirina performansa dengbêj a vegêraneke hunerî li ser du tiştên esasî ava dibe: çîrok (*deng*) û performansa wê ya hunerî ya vegêranê (*bêj*) (Delikaya & Ertekin, 2021: 16). Ji aliyê din ve Uzun (2006:11) dengbêjîyê bi kurtî wiha pênase dike; dengbêj ew kesê ku rih û can dide deng. Ew kesê ku ‘deng’ ji xwe re kiriye pîşe. Ew kesê ku kelim kiriyê kilam. Gelek taybetiyên kesê dengbêj hene ku yek ji wan jî gerokbûna wan e ku pê hem repertuvara xwe xurt dikin hem jî cografyaya xwe nas dikin:

“Dengbêj ku bi gerokbûna xwe ve mînanî mêşa hingiv ji gelek der û deveran qiset û çîrok, serhatî û qal û qewimînan hîn dibe. Ew, bi van gerên xwe ve ku bi gelemperî wekî parçeyeke karê wî bi xwe ye, -beşdariya li şahiyên, danîna kirîvatîyê û dawet- li ser cografyaya xwe ya fîzîkî û çandî gelek agahî û zanînen kûr bi dest dixê. Ji ber karên xwe dengbêj tim di nav civatê de li dawet û şahiyên digere û gund namîne ku ziyaret nekiribe. Dengbêj ji dawetekê ji bo yeke din, ji gundekî bo gundekî din tim rêwî ye û erdnîgariya xwe ya lokal bi tevî çiya, newal, gund, zozanan ve baş hîn dibe.” (Delikaya & Ertekin, 2021: 15).

Lewra dengbêj wan hîndarîyên xwe dike neqş bo vegêrana xwe, dike aheng bo melodîya xwe û ev jî dibin kereste, him ji bo tradîsyona çanda devkî ya kurdî him jî bo motîfên bîra civakî. Lê belê ev jî heye ku, nav û nasnavên dengbêjan li gor herêm, zarava û devokan diguhere. Bo mînak:

“Li bakurê Kurdistanê navê wan dengbêj e. Li herêma Riha û Semsûrê jî navê wan delal e û ji aliyê din ve kesek nikare bibêjê ku, şaxa ku filan dengbêj gotiye, ji sedî sed rast e. Ji ber ku her dengbêjekî/ê ev kilam li gor zanîn û hunera xwe jî nû ve afirandiye. Digel ku çarçoveya kilamê yek e jî, di nava xwe da taybetiyên wan - nav, naverok, devok û hwd- jî hene. Li gor lêkolînan dibe ku şaxên din jî lê zêde bibin. Zêdebûna van şaxan hîmê rastiya bûyerê, kilamê û hunerê naguherîne. Di ser da dewlemendiya zimanê kurdî û ciyawaziya devokan jî nîşan dide.” (Çiftçi, 2015: 155-122).

Naveroka mijarên vegêrana dengbêjan bi jîyana rastîyê ra gelek têkildar e. Bi piranî dengbêj di berhemên xwe da qala bûyerên dîrokî yên wek şerên eşîran, şerên eşîr û desthilatan (dewletan) (Karacan & Nayman, 2014: 366), qewimînên xwezayê yên wek erdhej, lehî û hwd. qala mijarên evîn, revandina jinê dikin. Di berhemên xwe da serpêhatiyên gel vedibêjin. Hunera xwe li hin herêman bi enstrûman li hin herêman bê enstrûman saz dikin, civakê ji her alî ve nas dikin, tore û edetên civakê baş dizanin û aliyan civakê yên baş û yên ne baş di berhemên xwe de vedibêjin (Kardaş, 2017: 10). Ji bo têkiliya di navbera bûyerên qehremanî û rasteqîniya wan jî Yaşar Kaplan ji İzzeddîn Mistefa Resûl wiha neql dike û dibêje; mijarên beyt û vegêranên strankî piranî li ser du babatên sereke tene dabeşkirin; babetên qehremanî û babetên dildarî, û didomîne; cureyê duyemîn her çend qehremanî tê da hebe jî wekî cureyê berê xeyal tê da serdest nîne. Vê cureyê

berevajî ya din realist dibîne. Bi dîtina wî gelek caran lehengê wê kesekî rasteqîn e. Di berdewama nirxandina xwe da Kaplan “ji aliyê naverokê ve vegotinên kurdî” dabeş dike û vegêrana Filîtê Quto jî di bin sernavê mijara “naveroka vegêranên sitrankî” da dinirxîne û li bin beşa “sitranên qehremanî” da disinifîne (Kaplan, 2022: 280-281). Li gor Kaplan em dikarin bibêjin vegotina kilama Filîtê Quto sitraneke qehremanî ya dengbêjîyê ye. Li aliyekî din mirov dikare şopa dîrokî ya kilam (Yüksel, 2023) û destanên kurdî (bo nimûne bnr. Subaşı, 2023) bi vekolinên nivîskî jî derxe meydanê, ji ber ku pareke mezin a van vegêranan xwe dispêre rastiyê.

Li kêleka van taybetiyên dengbêjîyê, dengbêjên ku îro çanda devkî îcra dikin bi piranî zilam in û hejmara dengbêjên jin gelek kême e. Rexmê ku gelek serpêhatî ji devê jinan jî hatine neqlkirin rola dengbêjên jin di îcrakirina vê hunerê da qels xuya dike. Em dikarin bibêjin gelek kilamên dengbêjîyê ji deng û keserên jina derketîne û ev kilama Filîtê Quto ya ku me bernivîsa wê kirî jî bi piranî ji devê Şema dîya Filît hatîye vegêran. Dîsa wekî gelek kilamên di kilama ku Dengbêj Şakiro ji bo Ferzende Beg vegotî ji devê Besraya jina Ferzende beg hatîye neqlkirin. Sedemên vê rewşa dengbêjên jin têkilî li gel rêxistinbûna civakê, bi hizra bavîksalarî ya serdest û bawerîya civakê ya olî ra heye (Schafers, 2016: 269). Ji ber ku ev mijar bi serê xwe xaleke lêkolînê ya berfireh e, em zêde nakevîne nava hurgilîyan û em ê balê bidine ser kilama Filîtê Quto.

## 2. Li ser Kanîya Badereşê Şerê Du Eşîran

Li Kevana Qîrê, li ser Kanîya Badereşê ya ku dikeve Xerzana Bidlîsê, di çaryêka dawî ya sedsala 18 an da şerek di navbera du eşîran da pêk tê ku dikeve nava vegêranên hemî dengbêj, kilambêj û çîrokbêjên herêmê. Ev şerê ku di navbera serok eşîrên Etmaneka û Reşkotî da qewimî wekî şerê Filîtê Quto bi nav û deng bûye. Di derheqê dîroka vî şerî da qasî ku me agahî bi dest xistî, Mihemed Seîd Temel dibêje qewimîn di salên derdora 1860 û 1870yan da çêbûye û Hacî Ehmed ê kurê Mistê ku neviyê Filîtê Quto ye dibêje, ev şer berîya 120 salan qewimîye (bnr. Alpar, 2018: 9; Kebirbirî, 2009: 65).

Serok û rihspîyê eşîra Etmaneka Mamê Emê, ji Geliyê Bidlîsê ji eşîra Etmaneka ye. Eşîra Etmaneka eşîreke mezin e. Li seranserê metropolên Tirkîyeyê û li Anatolya Navîn belav bûne. Hatina wî ya bi karwan re jî, li ser xatirê ku şêwr û mişewiran bikin, bi xwe ye. Temen ango emrê wî li gor sala qewamê, li dora 70-80 sal e (Kevirbirî, 2009: 61). Reşkotan hem navê eşîreke mezin e li Deştê Xerzanê, hem jî navê mintiqeyeke berfireh bi xwe ye. Sînoren herêma Reşkotan, ji ava Bişêrîyê dest pê dike û heta Pira Malabadê ku nêzîkî Farqînê (Silvân) ye, diçe. Her wiha jî hêlekê ve jî navçeya Hezoyê (bi tirkî, Kozluk) wekî sînore Reşkotan e ku ji berê de li vê herêmê file, êzidî û misilman bi hev ra jîyana xwe domandinê û hê jî wekî herêma êzidîya tê binavkirin. Bi vê babetê ve girêdayî Karapêtê Xaço di hevpeyvîna xwe ya rojnamevan Mehmet Aktaş pê ra kiribû wiha dibêje; wê demê hemû axa û beg ên kurdan xwedîyê hinek filehan bûn. Ew fileh wekî eşîra wan bûn. Di fermanê da, Filîtê Quto xwedî li filehên xwe derket û xwîna filehekî jî nerijand. Lê, ew dijminê bazirganan bû, diçû pêşîya karwanan. Bi siwarîyên xwe re li pey talanan digerîya (Kevirbirî, 2009: 65-60).

Çîroka vî şerê navdarbuyî bi qewlê Salihê Kevirbirî (2009: 61) ku ji M.Salih Yorulmaz ê (Salihê Hemê) li gundê Eyndara Misircê nişteci neql dike, wiha ye:

“Di wê sala ku ev şer diqewime ji ber sedema xela/nangiranî li Xerzanê çêdibe *û eşîra Etmaneka* ji ber bêmecalîyê berê xwe didin herêma Dîyarbekirê. Barê wan xwê ye û li gel ga û gamêşan pêncî û pênc mirov bargiran in. Dema digehine Kanîya Badereşê, konê xwe vedidin. Mamê Elê, gazî Elî dike û jê dixwaze ku ew pê re were nav konên Reşkotan ku dew an jî aveke cemidî vexwin û hinek bêhna xwe berdin. Mamê Elê Emê û Elî têne binê konên Reşkotîyan, bi navê Şîrîne ku kêça Kesperê File ye, çav bi Elî dikeve û aşîqî bejn û bala Elî dibe. Şîrîne ya ku bi hiznê dinyayê zehf bedew û xweşik bûye, radibe tê bi dêzgîne hespê Elî digire. Ev yek dibe sebep ku Mamê Elê zêde biqehire. Ji ber ku Mamê Elê aciz dibe bi birazîyê xwe Elî û Şîrîne re dike qarqar. Di vê navberê da Filîtê Quto, ku mêrxas û serekê eşîra Reşkotan e, ji ber xirecir *û qareqara Mamê Emê*, ji xew şîyar dibe, xwe berjêr qesrê dike û qesta van her du ciwanmêrên xerîb dike. Ew û Mamê Emê zirtan li hev dikin, başebaş ji hev re dibêjin. Mamê Emê ji Filît ra wisa dibêje:

- Lawo Filîto! Gava em ji rîya xwe dageriyan, tu mêrekî çê yî were pêşîya min

Piştî van gotinan, Mamê Elê *û Elî diçin ser konên xwe û berê xwe didin Dîyarbekirê*. Piştî ku karwanê Etmaneka, dunûstandinên xwe yên li Dîyarbekirê diqedînin berî ku karwan dagere, Elîyê birazayê Mamê Emê li “Sûka Şewitî” çav bi tivingeke şeşxane ku bi bazineke zivîn lê pêçaye, dikeve. Piştî ku “Bazinbelek”ê ji xwe ra diki-re karwan ber bi Xerzanê ve dadigere. Wexta ku tên dikevin nav axa Reşkota Kevanê Qîre, li wan dibe şev. Di vê navberê da Filîtê Quto tê pêşîya wan. Li wê derê Filîtê Quto tê daw û doza xerac û baca rê ji Etmanekiyan dixwaze. Mamê Elê dibêje; “Filît lawo, ji xwe ra hêstirek ji serî, yekê ji navê û yekê jî ji paşîyê ji xwe re bigire wekî xerac û baca rê bibe. Lê çavê Filît li şeşxana milê Elî ye û dixwaze wê tivingê bidine wî. Memê Elê dibêje Filît; “te li ku seh kiriye ku eşîran tivinga milê xwe, wekî bac û xeraca rê dane xelkê. Qey tu nizanî tiving namûs e. Tu ji karwanê kîjan hêstirî bibî, tu serbestî. Lê heger tu tivinga min dixwazî, encax ew tiving bibe qelene dayîka te Şemê”. Piştî van gotina Mamê Emê bi tivinga şeşxanê guleyekê li Filît dide û wî dikuje. Wê rojê, li Kevana Qîre li Dalana Paşo, serekê eşîrê Mamê Emê jî di nav da, eşîra Reşkotîyan wekî heyfa Filîtê Quto, 52 kesa ji eşîra Etmaneka dikuju. Tê salox-dayîn ku karwan ji 55 kesî pêk dihat û tenê sê (3) kes ji wan filîtine. Şakir Epözdemir, di nivîsareke xwe da dîyar dike ku navê wan her sê kesên ku ji şerê Qîre sax filîtine ev in; Ji mala Xîzê Resûlê Şênî, ji mala Seydê Silêmanê Têlo û ji mala Emê Resûlê Belik e.”

Çîroka kilama Filîtê Quto, ya ku me ji berhema Kevirbirî(2009) neql kirî wiha diqede. Lê ji ber ku ev kilam, gelek belav bûye û ji hêla gelek kesî ve hatîye vegêran, di xelekên serekê yen rêzerûdanê da guhetinên bingehîn pêk hatine. Ji aliyê dî ve di çend varyantan da guherîn ew qas xurtin ku mijar vediguhere ser hêlek dî. Li gor dengbêj Naîfê Hemo (Medya, W. 2021). ku wekî

dengbêjek navdar ê herêma Duhokê ye, dibêje; Filîtê Quto axayê Dêrezorê ye û neviyê Emê Etmanekî ye. Ango Şemê, ku wekî dîya Filîtê Quto tê zanîn, keça Emê Etmanekî ye. Her wekî vê varyanta dengbêj Naîf Hemo, li herêma Şingalê jî çîrokbêj Mamê Nemir di çîroka Filîtê Quto da neql dîke ku Mamê Genderê Etmanekî û Filît xal û xarza ne û hev kuştîne (Qîranî, 2022). Em ji van mînakên varyantan digehine wê encamê ku kilam çî qas berbelav bibe li gor naveroka çîrokê guherînên cihê pêk hatine. Loma ew varyantên ku em dê bidin ber hev, gelek nêzikî vê çîroka ku me neql kirî ye.

### 3. Kurteya Varyantên Danberhevîyê

Ji bo çanda devkî, taybet ji bo belavbûna kilama Filîtê Quto, mekanê qewamê xwedî roleke sereke ye. Wekî tê zanîn ev şerê navborî di herêma Xerzanê da pêk hatîye û ev herêm him di navbera çend herêmên cuda û navendî da ye, him jî li ser rêya bazirganî û hatin çûyîna wê serdemê da cih digire. Vê taybetîya herêmê ya ku lê qewimî, raste rast bandorekê li ser belavbûna varyantên vê kilamê dîke. Me jî ji bo babeta danberhevîyê, di nava dehan varyantên vê kilamê da varyantên Dengbêj Nuroyê Meter, Nesoyê Zado, Dengbêj Reso û ya Dengbêj Kerem hilbijartin. Gava niha em li jêrê kurteyên van vegêranan pêşber dikin dê ferq û cudahiyan wan çêtir bêne dîtin.

#### 3.1. Kurteya Varyanta Dengbêj Nuroyê Meter

Dengbêj Nuroyê Meter di sala 1941 an da li Dutaxa Agirîyê jî dayîk bûye. Kilam li ber destê Dengbêj Evidilselamê Koskê fêrî bûye. 1955 an dest bi dengbêjîyê dîke heya sala 1983 an distrê. Piştî Şêx Silhedin ku li Dutaxê Şêxeke bi nav û denge, Nurîyê Meter di xewnê da dibîne û Nurî karê dengbêjîyê berdide. Di salên piştî wê çend cara diçe Almanya û Fransayê tê û di sala 1996 an da mala xwe dibe Stenbolê û li wê derê medreseyekê vedike û dersdarîyê dîke. Di sala 2019 an da li Stenbolê koça dawî dîke.<sup>2</sup>

Di destpêka vegêranê da dengbêj Nuroyê Meter bi awayekî çîrokbêjî dest bi kilamê dîke. Rêzerûdana vê varyantê li gel Emê Etmanekî hatîye sazîkirin. Emê Etmanekî axayê eşîra Etmaneka ye û wê hingê li binya Bidlîsê dijî. Vêca carekê dema tena serê xwe diçe Bişêrîyê, li ser pira Balîşokê rastî çend Êzidiyan tê ku rêya kesekî girtine û zilmê lê dikin. Emê Etmanekî wî mirovî jî nava deste wan Êzidiya derdixe û dema hev nas dikin dizane ku ew Filîtê Quto ye. Bi vê minasebetê Filîtê Quto dibêje “te ez ji destê wan xilas kirim dê bixwaze ka tu çî ji min dixwazî”. Mamê Emê jî dibêje “ez dizanim ku dema karwan di Bişêrîyê ra derbas dibin tu baca rê ji xelkê distînî. Rica min ewe ku dema karwanê Etmanekîyan di vê derê ra derbas bûn, baca rê jê nestîne(1:52). Filîtê Quto jî dibêje “baş e” û soz dide ku bac û xeraca rê ji karwanên Etmaneka nestîne.

Di ser vê hevdiîna Emê Etmanekî û Filîtê Quto ra heft sal derbas dibin. Di wan serdeman da li herêmê baran nayê, genim ranabin û her wekî ku xelayek rabibe. Ji ber xelayê Mamê Emê radibe karwanekê amade dîke. Bi gel amadekirina karwanê Etmaneka, Dengbêj Meter dest bi vegêrana dengbêjkî dîke. Karwanê Mamê Emê jî çarsed hesp, dewar, qatir û gayan pêk tê û li gel birazayê xwe Elî serkarwaniya karwanî dîke û berê xwe didin Bişêrîyê da ji bo eşîra xwe pêdî-

<sup>2</sup> Me di roja 11.05.2024 ê da bi gel birayê wî yê bi navê Hecî Ehmed, ku li Stenbolê niştecihe, bi rêya telefonê hevdiîtin kir û ev agahiyên derheqê jîyana Nurîyê Meter ji wî hatine neqilîkirin.



vîyên wekî nan, genim, ceh, nal û hwd. bistînin û vegezin. Dema digehine herêma bi navê Kevana Qîrê, Kanîya Badereşê, Elî ji Mamê Emê ra dibeje “ev heft roj in em li rê da ne. Ez ê herim li wî konê xuya dike, tasek mast bixwim û werim”. Helbet Elî dizane ku li wê derê Şîrîn Xanima keça Kesfer Axa ya bi delalîya xwe ve nav û deng heyê. Şîrîn Xanim jî li gel Filîtê Quto ev sê heyv in destgirtî ne. Mamê Emê jî li gel Elî bi hev ra diçin wî konê mezin yê Kesfer Axa. Li wê derê dilê Şîrîn Xanimê dikeve Elî û dilê wan li hev dikele di dawîyê da gustîlên xwe li hevdu diguherînin û vedigerine gel karwanê xwe. Diçin Bişêrîyê danûstadinên xwe dikin. Di vê navberê da Elî ji xwe ra şexşaneke<sup>3</sup> bi zêr hatiye neqîşandî distîne. Vedigerine rêya xwe ya ber bi binya Bidlîsê.

Di vegeerê da dema carek dî digehine pozê Qîrê, kevana Qîrê li ser kanîya Badereşê karwanê xwe disekînin da vehesin. Elî careke dî siwar dibe diçe ba Şîrîn Xanimê. Vê carê Filît hay ji wan dibe û dibêje “erê min sond dabû ku ez bac û xeraca rê ji Mamê Emê nestînim. Belê vê carê ya te kirî nabe ku bê berdel bimîne”. Elî vedigere ji Mamê Emê ra hal û rewşê dibêje. Mamê Emê jî ji jê ra dibê “ma min ji te ra negot barê namûsê giran e, neçe nav konê Reşkota”. Belê gotin bêçare ye. Filît pêncsed zilamên eşîra xwe dide gel xwe û diçin berîya karwanê Etmaneka radiwestin. Mamê Emê dibêje “min tu cara bac û xerac nedaye, belê vê carê ezê sê qatirên barkirî bidime te tu ji xwe ra bibe”. Filîtê Quto de’w û doza bazinbeleka li milê Elî dike û dibêje “nabe ku heya ez wê bazinbeleka milê birazayê te nestînim rêya te vekim”. Bi vê gotinê Mamê Emê dibeje “kê dîtîye silaha li milê zilama bo bac û xeraca rê hatibe dayîn. Şerm e vê tiştê nebêje. Ez ê çawa vegeerime nava êla xwe bêyî ku şexşane nebe”. Filîtê Quto bi israr şexşanê daxwaz dike. Mamê Emê jî dibêje “ez ê bi wî qewlî şexşanê bidim ku bibe nextê dîya te ya Şemê”.

Bi vê xircirê şer derdikeve û Mamê Emê, Filîtê Quto dike. Bi gel kuştina Filîtê Quto şer mezin dibe û 60 karwanî yên eşîra Etmanekîya di encama şerê wan da tene kuştin. Beşa dawî ya kîlamê bi piranî ji devê Şema dîya Filîtê Quto hatiye vegêran. Şemê her tim dibêje Filît neçe berîya vî karwanî. Ew karwan yê Emê û Elî ye wan tu caran nedane kesê bac û xeraca rê. Filît guhdarîya Şemê nake û diçe. Şemê dibêje tu her çûyî pêşîya karwanî, belê ger tu xwe li ber şexşana wî bilivîni ez şîrê xwe li te helal nakim. Bi vî awayî dema Filît tê kuştin Şemê dibêje Êla Reşkotan “çê bin çê bixebitin herin tola Filît rakin (Koçersor, 2021)”.

Kilam herî dawî bi dengê gazin û lomeyên Mamê Emê diqede. Mamê Emê brîndare û ji Eliyê birazayê xwe ra dibêje “va ye ez birîndar im, piştî vî emrê xwe te şer bi me da kirin û zarokên me li ber dîwara mane bêxwedî û bêxwedan”.

### 3.2. Kurteya Varyanta Nesoyê Zado

Dengbêj Neso di sala 1932an da li gundê Zado ji dayik dibe. Navê wî yê rastî Nusret e û di zaroktiya xwe da qet naçûye dibistane, lê piştê fêrî xwendin û nivisandinê bûye. Di sala 1968 an da diçe bajarê Edenê û piştî sê çar salan vedigere gundê Zado û heya dawîya emrê xwe li wê derê dijî. Li ber destê nasekî xwe yê bi navê Feqiyê Mihê Qaso fêrî dengbêjiyê bûye û herî zêde dibin bandora Dengbêj Evdalê Zeynikê da maye. Dengbêj Neso di sala 1998an da li gundê Zado diçe ser dilovaniya Xwedê (Alpar, 2018:16).

<sup>3</sup> Şexşane tifenga lûle dirêj a leşkerên peyade ye. Di vê kilama Filîtê Quto da “şexşane” amûra herî giring a kîlamê ye ji ber ku hema hema di hemî guherto/varyantên vê kîlamê da sedema derketina şer ev tifeng e.

Dengbêj bi agahdar kirina rewşa xela/nangiranîyê dest bi kilama xwe dike. Serokê eşîra Etmanek Mamê Gindê ye û Emê yê birazîyê wî şeş meh in destgirtî ye. Parek mezin a vê varyantê ji bo bedewî û delalbûna Emê hatîye veqetandin. Etmanekî karwanê xwe bo rêya Deşta Heranê, Berîya Sirûcê, Xeta Helebê amade dikin. Destgirtîya Emê bi gel pêşniyazî û nesîhetan, çend daxwazên dîyarîya yên wekî Meya Mendana, Kevoka Kedî, Bisqê Beydûrê, Nesxoraçîyên Memorîyan û h.w.d jê dixwazê ku vegeerê bi xwe ra bîne.

Karwanê Etmaneka bi rê dikeve û bêyî ku li cihekê raweste diçe Berîya Sicûrê li nava eşîra Berêzan da bi cî dibe. Emê Etmanekî dema ji bo bazirganîyê li nava sûka Sirûcê digere, rastî du tivingên şeşxanê tê û wan dikire. Gelek dîyalogên dirêj û hûrgilîyên danûstandinên Emê bûne mijarên vê varyantê. Dema hatin wî cihê ku konên Reşkotîyan dibînin, Emê daxwazê ji Mamê xwe dike da ku biçê nava konan û hindek mast bixwe û vegere. Mamê Gindê dibêjê “neçe, rêya me maye yek an du qonax. Tu rabe hespê xwe siwar bibe here nava êla me, em dê karwan biajon û werin.” Emê dibêje “ez dê biçim, li hespê xwe jî peya nabim û hindek mast bixwim werim.”

Emê diçe li ber konê Almas Xanimê radiweste. Filîtê Quto ji berê da sond xwarîye ku mêrê bi Almas Xanimê ra xeber bide, wî bikuje. Emê Etmanekî li ber derê kon radiweste bêyî ku peya bibe tasek mast ji Almas Xanimê dixwaze. Almas Xanim dema Emê Etmanekî dibîne yek ser dilê wê dikeve Emê û jê dixwaze ku peya bibe lê bibe mêvan. Lê Emê vê qabûl nake û dibêjê “em rêya dûr tên, hatime tasek mast bixwim û herim.” Wê gava Emê û Almas bi hevra xeber didin, jinên Reşkotîyan dibînin ku zilamek li ber derê konê Almas Xanimê ye û pê ra xeber dide. Ev agahî diçe guhê jina Filîtê Quto û gava Filît ji xewa subê şîyar dibe jina wî jê ra dibêje.” Almas bi kesekê Etmanekî ra xeber daye.” Filîtê Quto bang li xulamên dike û dixwaze ji meselê serwest bibe. Ew jî dibêjin “karwanê Mamê Gindê va ye li Kevana Qîre, Emê vê subê hatîye ji Almas Xanimê ra xeber daye.” Li ser vê agahîyê Filît xulamên xwe dişîne ba Mamê Gindê û daxwaza şeşxana milê Emê û sê hêstirên barkirî dike. Mamê Gindê dibêje “bila Filît me li nava eşîra serçemandî neke. Vê carê jî weke her car em bac û xeracê nedin. Ez bigehime mala xwe soz be ku sê hêstira bi girêdana Mamê Gindê û bihayê şeşxanê ezê zêra bo bişînim”. Li ser van xeberdanan Emê Etmanekî dibêje xulamên “herin bibêjine Filîtê Quto bila rêya xwe nemîne û were Delava Qîre bibe mêvanê me. Eger go na, barê hêstira û şeşxane qelenê dîya wî, Şemê ye.” Piştî van gotinan Emê ji Mamê Gindê ra dibêje derdê wan ez im. Tu were piştî min veke, Meya Mendana, Kevoka Kedî, Nesxoraçîyên Memorîyan here bide bûka xwe bila gazincan bike (Alpar, 2018: 22-38).

### 3.3. Kurtêya Varyanta Dengbêj Reso

Dengbêj Reso di sala 1902 an da li Îdirê gundê Kerîmbeylîyê ji dayik bûye. Mala bavê wî berîya werine Îdirê li Rewanê gundê Sehatulî û Varansofka yê nişteci bûn. Dengbêj Reso li ber destê apê xwe Evdoyê Dengbêj ferî kilam gotinê bûye. Evdoyê Dengbêj gelek caran li gel Dengbêj Gulê û Evdalê Zeynikê ra kilam gotîye. Jîyana Reso ji ber bêdebarîya aborî di nava koçberîyê da domîye. Gelek gund û bajaran maye. Her wiha sê çar salan li bajarê Manîsayê dimîne. Di sala 1983 an vedigere Muşê, 24 ê Kanûna, sala 1984 an da li Enqerê di nexweşxaneyê da koça xwe ya dawî dike (Güneş & Şahin, 2019: 27-30).

Dengbêj Reso kilama Filîtê Quto ji vegera karwanê Etmaneka dide destpêkirin. Di vê varyantê

da serkarwanîyê Elî û Mamê Gindê dikin. Dema karwanê Etmaneka ji bazirganîya Mûsilê vedigerin têne Kevanê Kêrê li ser Kanîya Qîrê ji bo vehesînê radiwestin, Filît tê pêşîya wan digire û pîrsa barê karwanê wan ji Elî dike. Elî bersivê dide û jêra dibêje ger tu ji bo baca rê hatibî du hêstirên barkirî ji xwe ra bibe. Lê Filît dibêje ez hatime baca rê û ji xwe ew her du hêstir yên min in, ez bazinbeleka/şexşana milê apê te yê Mamê Gindê dixwazim ji bo baca rê. Gava Elî van gotina digehîne Mamê Gindê, pîr aciz dibe lê dîsa jî dixwaze navberê germ bike.

ژن له کلتوری ئیمه‌دا له‌زۆر باردا سته‌م لیکراو بووه و له‌هه‌مان کاتیشدا جیگه‌ی گرنگی و بایه‌خی پیاوه، دیاره‌مه‌به‌ستی له‌رووی جه‌سته‌یه‌وه بووه، خۆ ئەگه‌ر وانه‌بیت ئەوا بۆچی زیاتر له‌ شیعری کۆندا گرنگی به‌ جه‌سته‌ی ئافره‌تان دراوه و که‌متر باسیان له‌ کێشه‌ سه‌ره‌تاییه‌کانی ژبانی ئافره‌تان کردووه، له‌زۆر باریشدا شاعیرانی میلی زیاتر گرنگیان به‌ کێشه‌ی ئافره‌تان داوه، به‌لام نووسه‌ری ئەم بابته‌، ئەم مه‌سه‌له‌یه‌ی روون نه‌کردووه‌ته‌وه، که‌ پێویستبوو ئاماژه‌ی بۆ بک‌ردبا، ته‌نانه‌ت له‌ دوو‌خاله‌ش که‌ خسته‌وه‌یه‌تیه‌ روو نه‌یتوانیوه‌ پێگه‌ی ژن و مامه‌له‌کردنی شاعیر له‌ ئەو ده‌قه‌دا به‌ته‌واوی روون بکاته‌وه.

بۆ نووسین و خسته‌نه‌رووی هه‌ر بابته‌یک پێویسته‌ به‌پێی میتۆد، یاخود تیۆریکی دیار بابته‌که‌ت بخه‌یته‌روو، به‌تایبه‌ت بۆ بابته‌تیکی له‌م شیوه‌یه‌، چه‌ندین میتۆد و تیۆری جیاواز هه‌یه، به‌تایبه‌ت میتۆده‌کانی رەخنە فیمینستی و تیۆره‌کانی فوکۆ و ... هتد، نه‌ک هه‌رئوه‌ بگه‌ ده‌بوو پۆل و مافی ژبانی له‌ کۆمه‌لگه‌ی کوردیدا به‌ر ئاماژه‌بدایه، چونکه‌ هه‌ر له‌ شیعری خودی قوبادی جه‌لی زاده‌دا ئاماژه‌ی پیکراوه، به‌لام نووسه‌ری ئەم وتاره‌ نه‌یتوانیوه‌ به‌شیوه‌یه‌کی روون و پشتبه‌ستن به‌ میتۆدی زانستی و تیۆری هاوبابه‌ت و ته‌نانه‌ت ناوه‌روکی مه‌به‌سته‌ شیعرییه‌کانی شاعیر بابته‌که‌ی ده‌وله‌مه‌ند و زانستی تر بکات.

**دووه‌م:** بانه‌مايه‌کی دیاری میتۆدی رەخنە کۆمه‌لایه‌تی رەتکرده‌وه و هه‌له‌وه‌شانده‌وه‌ی دیارده‌ کلتورییه‌ نه‌رێنیه‌کانی ناو کۆمه‌لگه‌یه‌، که‌ ئەم دیاردانه‌ رینگن له‌ به‌رده‌م پیشکه‌وتن و کرانه‌وه‌کانی کۆمه‌لگه‌دا. سه‌باره‌ت به‌م بانه‌مايه‌ی رەخنە کۆمه‌لایه‌تی له‌ پاشکۆی رەخنە چاودێردا وتاری رەخنەیی به‌دی ده‌کریت. له‌ ژماره‌ (١) ی (٥٠٠٢) و تارێک به‌ناونیشانی (پیره‌مێرد و پرۆژه‌یه‌کی نوێگه‌ری له‌ شیعری نوێی کوردیدا) بلاوکراوه‌ته‌وه له‌لایه‌ن محمد نوری ئەحمده‌وه، به‌پێی هه‌لوێست و بۆچوونه‌کانی نووسه‌ر له‌ خسته‌نه‌رووی بابته‌که‌دا، ده‌کریت بیخه‌ینه‌ چوارچۆیه‌ی میتۆدی رەخنە کۆمه‌لایه‌تییه‌وه، له‌ پیشه‌کی وتاره‌که‌یدا نووسه‌ر ده‌لێت: ((په‌یوه‌ندی نیوان کاری ئەده‌بی و ده‌سته‌یه‌کی کۆمه‌لایه‌تی له‌ هه‌مان سیسته‌می په‌یوه‌ندی نیوان به‌ش پیکدیته‌ له‌ناو کاری ئەده‌ب خۆیدا)) (ئەحمه‌د، ژ، ١، ٥٠٠٢: ١)

له‌م وتاره‌دا نووسه‌ر به‌روونی ئاماژه‌ به‌ شیکردنه‌وه‌ی شیعره‌کانی پیره‌مێرد ده‌کات و بوێرانه‌ هه‌ندێ مه‌سه‌له‌ی ورژاندووه، که‌ له‌ناو کۆمه‌لگه‌دا بوونی هه‌یه، هه‌روه‌ها چه‌ند بابته‌تیکی هه‌ستیار له‌ناو کۆمه‌لگه‌ی کوردیدا، که‌ جیگه‌ی هه‌له‌سته‌ له‌سه‌ر کردن بووه، ئاماژه‌ی بۆ کردووه و به‌پێی نمونه‌ی شیعری و سنوری کاره‌که‌ی به‌لگه‌ی زیندوو و به‌رده‌ستی هه‌تاوه‌ته‌وه، بۆیه‌ نمونه‌ی به‌ شیعری مزگه‌وتی گه‌وره‌ی پیره‌مێرد هه‌تاوه‌ته‌وه، که‌ به‌شیوه‌یه‌کی راسته‌وخۆ له‌بری ئەوه‌ی باسی لایه‌نه‌ پیرۆزییه‌کانی ئەم شوێنه‌ بکات، باسی له‌ به‌لگه‌م و ده‌نگی که‌ری مه‌لا کردووه، نووسه‌ر ده‌لێت: ((هه‌موو رەخنه‌گرتنیک له‌ سروشتی ناو کۆمه‌لگه‌ وه‌ک جه‌سته‌یه‌کی ناکامل و پینه‌گه‌یشته‌وه، به‌لام ئەگه‌ر ئەم رەخنه‌یه‌ له‌ هه‌ناوی جیهانبینی سه‌رده‌م نه‌هاتبێته‌ ده‌ر ئەوا به‌ تیکده‌ر و هه‌له‌وه‌شینه‌ره‌وه‌ی پرۆسه‌ی ناوه‌کیه‌کانی کۆمه‌لگه‌ دانراوه‌)) (ئەحمه‌د، ژ، ١، ٥٠٠٢: ١). ئەمه‌ به‌و واتایه‌ دیت، که‌ پیره‌مێرد به‌ به‌رده‌وامی رەخنە له‌ دیارده‌ کۆمه‌لایه‌تییه‌کان و سیسته‌می ناو کۆمه‌لگه‌ گرتووه. ئەمه‌ راسته‌وخۆ ده‌مانباته‌وه‌ ناو چوارچۆیه‌ی رەخنە کۆمه‌لایه‌تییه‌وه، چونکه‌ راقه‌کردنی دیارده‌کانی ناو کۆمه‌لگه‌، هه‌ولیکه‌ بۆ دۆزینه‌وه‌ی په‌یوه‌ندی نیوان کۆمه‌لگه‌ و ئەده‌ب، جا

ئەو بابەتەنى كە رەخنەى لیدەگىریت كلتورى، فەرھەنگى، ياخود رۆشنىبرىيى بىت. نووسەرى ئەم وتارە لە كۆتايىدا دەلەيت: ((بۆيە گەرەنەوہى ئەم جارەمان بۆ لای پىرەمىرد گەرەنەوہى بۆ كلتورىك، كە دەنگى خەفە دەكات و لەناو پىچەكانى خۆى دەيشارىتەوہ)) (ئەحمەد، ژا، ٥٠٠٢: ١).

ئەوہى لەم وتارەدا جىگەى ئاماژە پىكردەنە، ئەوہى كە نووسەرى ئەم وتارە توانىوہىتە پەيوەندى نيوان ئەدەب و كۆمەلگە بەپىي تىورىيەكانى گۆلدا مان پوون بكا تەوہ، كە كارىكى زانستى و جوانە، بەلام ئەوہى كە دەيەويت برىار لەسەر پىرەمىرد بەت ئايا بۆچى دەستى لە شيعر نووسىن ھەلگرتووە و كارى رۆژنەمەوانى ھەلبژاردووە، تويژەرانى ئەم بابەتە دەخاتە ھەلەوہ تارادەيەكى زۆر كارىكى نازانستىيە، چونكە ئاستى رۆشنىبرىيى خۆدى پىرەمىر برىار دەدات، كە ئايا چ كارىك و چ بواريكى ژيان ھەلدەبژىریت، نە نووسەرى ئەم بابەتە و نە كلتور و دابوونەريت و نە تويژەرانى ھاوسەردەمى شاعىرىش ناتوان برىارى ئەوہى لەسەر بەدەن. دواجار پىرەمىرد ئەو ساتانەى، كە لە رۆژنامە و رۆژنامەگەريشدا بوو دەستى لە نووسىنى شيعر ھەلنەگرتووە، تاوہكو ئەو برىارەى لەسەر بەدەى، پاشان شاعىر لە چەند جىگەيەكدا باسى لە كلتور و فەرھەنگى كۆمەلەيتەى كردووە و رەخنەى لىگرتووە، كەچى لە چەندىن جىگەى تر و شيعرى تر دا پەستى كۆمەلگە و تاكەكانى كۆمەلگەى كوردى كردووە، كەچى نووسەرى ئەم بابەتە، بەھىچ شىئوہىك باسى لە وەھا سوژەيەك نەكردووە، دەبوو لەپال مەبەستە سەرەككىيەكەى خويدا ئاماژەيەكى كورتى بۆ بكردبا.

**سنيەم:** ئاين لە ديارترين بنەماى رەخنەى كۆمەلەيتىيە، بەشىكى زۆرى بىرمەندانى رەخنەى كۆمەلەيتى و كۆمەلناسان، بەھەستىارترين مەسەلەى كۆمەلەيتى و تەنانەت نەتەوہىي و فكرى دادەننن، بەشىكى زۆرى كارەكانيان بۆ پوونكردنەوہى ئەم بابەتە تەرخانكردووە. لە رۆژنامەى چاودىردا وتارىك لەلایەن نووسەر د. ئازاد عبدالواحد كەريمەوہ نووسراوہ بە ناوئىشانى (ئەسىرى لەنيوان ناسيؤناليست و ئايدىي ناليستى) دا لە ژمارە (٦٢) ى سالى (٦٠٠٢) بلاوكراوہتەوہ. نووسەر لە پيشەكى وتارەكەيدا بەھوى چەند رەگەزىكى رۆشنىبرىيى و سياسىيەوہ باس لە قوناعى نوپكردەوہى شيعرى كوردى دەكات. ھەر وەھا چەند رەگەزىكى ترى وەك گۆرانكارىيە كۆمەلەيتىيەكان و ھەر وەھا باسى شيعرى نوپى كوردى، كە ھاوھەنگاوى ژيانى ناو كۆمەلگە بوو كردووە. ھەر بۆيە دەلەيت: ((دروشمى مەرگەسات و گيانى بە كۆمەلەيتى بوون بە دىرپكى نوپوہ شۆرشىك بوو دژ بە واقعى گەندەل و تەعبىرىكى نوپى بوو لە خەون و ئازارەكانى گەل و فەلسەفەى نەتەوہخووزى)) (كريم، ژا، ٦٠٠٢: ٢).

نووسەر لەم وتارەيدا ئاين و بىرى نەتەوايەتى، كە لە شيعرەكانى ئەسىرىدا رەنگى داوہتەوہ، وەكو ھەولتەك بۆ خستەنەرووى فەلسەفەى شيعرى ئەسىرى دەخاتەروو. ھەر وەھا پىي واىە تايبەتمەندى نەتەوايەتى و كۆمەلەيتى كۆمەلەيتى كوردى لەگەل كەلەپوورى شيعرى كۆنى كوردى و واقە نوپيەكە ھاوتەباى شيعرەكانى بوون، ھەر بۆيە باسكردن لە گوتارى سۆسپۆ يان سۆسۆجىيائى ئەدەب لە زادەى شيعرەكانى ئەسىرى بوون، نووسەر دەيەويت پيمان بلى شيعرەكانى ئەسىرى بەشىئوہى گوتار لە ميانەى دەقەكانەوہ ئەركىكى كۆمەلەيتىيە و نەتەوايەتى بەجى گەياندووە. باسكردن لە پرۆژەى ژيارى كۆمەلەيتى كورد، ھەر وەھا باسكردن لە كيشەى نەتەوايەتى بەكيشەى كۆمەلگەى زانىوہ، ھەر بۆيە نووسەر دەلەيت:

((ئەو فاكته رەش پۆلیكى سەرەكى هەبوو لە سەپاندنى قۆناغىكى نوێى شیعەر، كە بە قۆناغىكى سۆسیۆویالیزم دەناسریتەو، كە سەرەتاكانى بەرجهسته كردنى بیری نەتەوايه تى سەرى هەلدا، پاشان بە شیعەرى نیشتمانی و ئەوجار سیاسى و پاشان بە شۆرشگێرى بەردهوامى هەبوو)) (كەرىم، ژ ٦٢، ٦٠٢: ٢). هەموو ئەو رەگەزانه رەگەزى سیاسى و نەتەوايه تى بۆ باسكردنى لە كۆمەلگە گوزراشته لە پەيوەندى نێوان ئەدەب و كۆمەلگە.

ئەو هەى جیگەى سەرنجه نووسەر تەنها باسى لایەنى ئاینى و وابەسته كردنى بە نەتەو هە دەخاته روو، دیاره بەهۆى ئەو باگراونده ئاینیهى كە شاعیر هەیبوو ئەم بۆچوونانەى خستوه تەروو. خو دەرگا جگە لە بیروباوەرى ئاینى، چەندین فاكتهرى تری كۆمەلایەتى و نیشتمانی لە ناوهرۆكى شیعەرەكانى شاعیردا بەدى بكرایه، دەبوو نووسەر باسى تەواوى لایەنەكانى ژيانى كۆمەلایەتى شاعیرى كردبا بۆ دروستبوونی ئەو هەسته نەتەوايه تیهى شاعیر، سەربارى ئەو هەى كە نووسەر توانیوییه تى زۆر بە زانستیانە بۆچوونەكانى خو بخاته روو.

**چوارەم:** ئەدەب و كۆمەلگە سەرباسى بیرمەندانى رەخنەى كۆمەلایەتى بوو، لە زۆر باردا هەولیاندا ئەو پەيوەندییه روون بكەنەو. لە رۆژنامەى چاودێرىشدا لە دوو ژمارەى (٨٠١ – ٩٠١) لە سالى (٨٠٢) بابەتیک بەناو نیشانى (پەيوەندى نێوان ئەدەب و كۆمەلگە بە پێى میتۆدى سۆسیۆلۆژى میژوویى) لە نووسینى ئەحمەد میره بۆلاو كراو تەو، گەرچی بابەتەكە پەيوەندى راستەوخو بە ژانرى شیعەرەو هە نیهى و زیاتر باسى ئەدەب بەگشتى دەكات

رەخنەگر لە سەرەتای نووسینه كانیدا دەلێت: ((قسە كردن لە سەر پەيوەندى نێوان ئەدەب و كۆمەلگە قسە كردنیکى ئالوز و فرە رەهەندە، كە ناتوانیت راستەوخو ئاماژە بە چۆنیەتى رایەلى نێوان ئەدەب و كۆمەلگە بكات)) (میره، ژ ٨٠١ – ٩٠١: ٦). لە چەندین گوشه نىگای جیاوازهو دەكریت ئەو پەيوەندییه لیک بووبیتەو، هەموو لیکدانەو هەكان دەچنە خانەى زانستى كۆمەلناسى ئەدەبەو. ئەم رەخنەیهى لە بەر دەست دایه هەولیکە لە بواری كۆمەلناسى ئەدەب، بە سەرنجدان لە بنەماكانى سۆسیۆلۆژى میژوویى، كە تیايدا هەولدهریت كاریگەرى میژوو و بەستنهو هەى بابەتە كۆمەلایەتییه كان بە ژانەر ئەدەبیه كان، پاشان لە شیوهى شیعردا پیشان بدریت.

رەخنەگر ئاماژەى بەو كردوو، كە روانگەى جیاجیا بۆ چۆنیەتى پەيوەندى نێوان ئەدەب و كۆمەلگە لە لایەن بیرمەندان و رەخنەگرانەو هە ئاراسته كراو، كە هەموویان لە سەر ئەو خالە ناکۆكن ((ئەدەب یه كێكە لە كارە دیارو بنەرەتییه كانى كۆمەلگە، بۆیه هەرگیز ئەدەب ناتوانیت بە شیوهیه كى دابراو لە كۆمەلگە بژی، بەلكو ئەدیپ بوونەو هەریكى كۆمەلایەتییه و لە ناو ژینگەى كۆمەلایەتییه دهژی)) (میره، ژ ٨٠١ – ٩٠١: ٦). لە روانگەى ئەم بۆچوونەو هە ئەدەب بەگشتى بەهەموو بەشه پیکهینه رەكانیهو هە هیچ كات لە بۆشاییدا بەرهم ناهیندریت، واتە ژانەر ئەدەبیه كان هەر یه كە یان لە ژیر كاریگەرى میژوویى كۆمەلایەتییه كان بوون، كە واتە بەمەبهستى تیگە یشتنى باشتەر و وردتر لە ژانەر ئەدەبیه كان پێویسته سەرەتا لەو چوارچێوه كۆمەلایەتییه تیگەین، كە بەرهمه كەى تیايدا نووسراو. رەخنەگر سەرەتا بە باسكردن لە سەر كۆمەلناسى فەرهنسى (دوركهايم) دەست پێدەكات و هەولدهدات پەيوەندى نێوان ئەدەب و كۆمەلگە لە روانگەى ئەو هەو روون بكاتەو. دواتر دیتە سەر باسكردنى هەمان پەيوەندى، بەلام ئەم جارەیان لە روانگەى كۆمەلناس و بیرمەندانى ترهو. رەخنەگر ئاماژە

بۆ (ئەفلاتون و ئەرستۆ و ئیین خەلدون) دەكات و پىی وایە بەرەھەمى ئەوان لە ژیر كایگەرى ئەو كۆمەلگە یەدابوون كە تیایدا ژیاون، لەلایەكى ترەو دەكریت بۆ باشتر لیکدانه وەى پەيوەندى نیوان ئەدەب و كۆمەلگە سود لە پروانگەكانیان وەر بگيردریت.

رەخنەگر ئاماژە بۆ میژووی پەرەسەندنەكان لەم جۆرەدا دەكات، بۆیە جەخت دەكاتە سەر سى قوناغى جیاوازی پەيوەندى نیوان ئەدەب و كۆمەلگە، كە زیاتر پشتى بەستووە بە بیر و هزرى بیرمەندانى سەردەمانى كلاسىك و رابردوو، رەخنەگر بە شىكى زۆرى نووسینەكەى تەرخاكردوووە بۆ ناساندن و شىكردنه وەى پروانگەكانى زانای عەرەبى بواری كۆمەلناسى ئەدەب (عمر على بەدەوى) بەتایبەت لە كتیبى (علم الاجتماع / الأدب)، لە كۆتاییدا بەم ئەنجامە دەگات ((لە پى رۆحەكە یەووە كە زمانە بەتەواوەتى بە كۆمەلگەووە گرى دەردیت)) (میره، ژ ۸۰۱ - ۹۰۱: ۶). دیارە ئەدەب بیجگە لەم بابەتانه لە زۆر رەهەندى ترەووە سەرچاوە دەكریت. لە چوارچێوەى كۆمەلایەتییه وە بۆ لیکدانه وەى زیاترى ئەم باسە رەخنەگر دیتەسەر ئاماژە كردن بۆ هزرى بیرمەندانى ئیستای بواری كۆمەلناسى ئەدەب و لە چەندین شویندا ئاماژە بۆ تیۆرەكانى ئەم بواره دەكات.

رەخنەگر لە بەشىكى تری وتارەكەیدا ئاماژە بە زالبوونى ژانرى شىعەرى دەكات. لە ئەدەبى سەردەمانى رابردوو بە حوكمى كەمى ژانرە ئەدەبیهكانى تر، پىی وایە ژانرەكانى تر جگە لە شىعەر بەرەھەمى سەردەمى مۆدێرن، كەواتە رەخنەگر سود لە زاراوەى ((كۆمەلگەى شىعەرى)) وەر دەگریت، بۆ پیناسە كردنى جیگە و پىگەى شىعەر لە سەردەمانى رابردوو، كە تاكە ژانرى بە هیز و زالى ئەدەبى بوو.

رەخنەگر لە بەشىكى تری نووسینەكەیدا دووبارە پرودەكاتە بۆچوونەكانى (على وەردى) سەبارەت بە جیگە و پىگەى شىعەر لە كۆمەلگەى عەرەبى سەردەمانى رابردوو. رەخنەگر پەنجە دەخاتە سەر كتیبى (أسطورة الادب الرفيع) دەلیت: ((قورەیشییهكان چەندە توانای خۆیان سەرفەهە كرد لە مەراسیمى حەجدا هیندەش لە شىعەردا توانای خۆیان سەرفەهە كرد بە شىوێهەكى گشتى قورەیشییهكان توانیان نمونەى خۆیان لە هۆزەكانى تری عەرەبیدا بەرز رابگرن و بازگانیهكانیان بپاریزن لە پىگەى دووشتەووە بوو یەكەمیان: پەرسەشیهكان و ئەنجامدانى حەج، دووهمیان: هاندانى شىعەر و كەمكردنەوى بازارە ئەدەبیهكان كە شىعەریان تیدا دەخویندرا یەووە)) (میره، ژ ۸۰۱ - ۹۰۱: ۶).

شىعەر هیندە زال و كاریگەر بوو، تەنانەت لەلایەن هۆزى قورەیشییه وە لە سەردەمى هاتنى ئیسلامدا بەكار دەهێنرا، بۆ خزمەت كردنى ئامانجى هۆزى قورەیش هەر وەكو د. على وەردى ئاماژەى بۆ كردوووە و دەلیت: شىعەر یەكێك بوو لە ئامانجە دیارەكان، بۆیە نووسەر دیتەووە سەر باسكردنى پەيوەندى نیوان ئەدەب و كۆمەلگە، بەلام ئەم جارەیان لە پروانگەى بیرمەندانى هاوچەرەووە، باسى چەندین میتۆدى زانستى دەكات، بۆ لیکدانه وەى ئەم پەيوەندیه وەكو ((میتۆدى میژووی، بەراوردكاری، شىكاری، وەسفى)) (میره، ژ ۸۰۱ - ۹۰۱: ۶) رەخنەگر راي وایە لەو جۆرە میتۆدهى سەرەووە ئەوەى یەكەمیان بەكار هێناو، كە بریتیه لە میتۆدى میژووی و تیشك دەخاتە سەر ناوهندیتىرین بابەتى بەرباس، كە هەمان كۆمەلناس پىی وایە: دوو ئەركى سەرەكى لە ئەستۆیه، ئەوانیش بریتین لە شىكاری میژووی و خویندنه وەى پىكەتە و میژووی.



ئەوێ جیگەى ئاماژە بۆکردنە، نووسەر زۆر لە بابەتەكە لایداوه و زیاتر سەرقالی یاریکردن بوو بە وشە، چونكە بۆ بابەتێكى رۆژنامەوانى هیچ پێویست بەو هەموو رۆونکردنەوێهە و باسکردنى بابەتى لایەلایە، هەرۆهكو چۆن بەپێى ناوێشانى بابەتەكەشى رۆونه و دەبوو تەنها باسى لە ناوەرۆكى ئەو میتۆدە بكردابایە، ئەگەرچى خودى میتۆدەكە و بابەتەكەش تارا دەیهەكى زۆر كۆنە و پێویستى سەردەم نییە، جگە لەوێ نووسەر نەهاتووە باسى میتۆدى رەخنە رۆون بكاتەو، كە ئایا بەپێى میتۆدەگە رایی نوێ كاریكردوو، یاخود میتۆدى رەخنەى میتۆدی، یاخود میتۆدى رەخنەى كۆمەلایەتى؟ لە راستیدا هەم ناروونى و هەم تێكەلاویش بە بابەتەكەو دیارە، سەربارى ئەوێش كە چەندین بیروكەى وەرگرتوو و ئاماژەى بە سەرچاوەكەى نەكردوو، بەلام لە بابەتەكانى تردا ئاماژەى بە سەرچاوە كەردوو، بەتایبەت كاتێك بە مانشیتێكى گەرە دەلیت: ((ئەدەب رەنگدانەوێ واقیعی كۆمەلە، بەهەموو رەهەندە جیاوازەكانییهو، یان بەدیوێكى تردا، ئەدیب گوزارشتكەرە لەو واقیعی كۆمەلایەتییهى تیايدا دەژیت لەماوێهەكى میتۆدی دیاریكراویدا)) (پیشوو: ٦).

نووسەر هیندەى خەرىكى سەرقالکردنى خوینەرە بە بیروبوچوون و خستنه رۆوى ناوى نووسەر و كۆمەلناسانى تر، نیو هیندە خەرىكى ناوەرۆكى كارەكەى نەبوو.

## ئەنجام

لەم توێژینهوێهەدا گەشتووین بە چەند ئەنجامێك لە گەرنگترینان:-

- رەخنەى رەخنە، بابەتێكى گەرنگە و خزمەت بەبواری رەخنە دەكات و تا ئاستى كامبۆونى دەبات.

- پاشكۆى رەخنەى چاودێر، لە دیارترین ئەو رۆژنامانەیه، كە بابەتى رەخنەى ئەدەبى تیايدا بلاوكراتەو، ئەگەرچى رۆژنامەكە تەنها بۆ بلاوكردنەوێ بابەتى ئەدەبى نەبوو.

- رەخنەى شیعەى لە دوو توێژى رۆژنامەكەدا گەرنگى پیدراو و (٢٤)

بابەتى لەم چەشنە بەدى دەكریت.

- ئەو بابەتانەى، كە دەكەونە چوارچۆهە رەخنەى كۆمەلایەتییهو تەنها (٤) وتارن، نووسەرانى ئەم چوار ژمارەیهش زیاتر پشیمان بە بوچوونى تاكەكەسى خۆیان بەستوو و لە روانگەى تیوریکى دیاریكراو كارەكەیان ئەنجام نەداو، جگە لە وتارەكەى (ئەحمەد میرە)، كە بەپێى تیورەكانى (گۆلمان) كارى كەردوو.

-- تیورەكانى گۆلمان جەخت لەو دەكاتەو، كە ئەدەب گوزارشته لە كۆمەلگە و دەتوانیت كۆمەلگە ئاراستە بكات، ئەمە بەو واتایە دیت كە ئەدەب بۆ كۆمەلگەیه، نەك تاكەكانى كۆمەلگە. ئەو وتارانەى لێرەدا خراونەتەر و ئەگەرچى نووسەرەكانیان ئاماژەیان بە تیورەكانى گۆلمان نەكردوو، بەلام شیکارییهكانیان دەچنە ئەو چوارچۆهەیهو.

## سەرچاوەكان

### كتیب:

ئینگلتون، تیری (٢٠١٧)، ماركسیزم و رەخنەى ئەدەبى، و. هاوړى یوسفى، چاپخانهى گەنج،

### سلیمانی.

دیویس، رۆبەرت کان و فینک، (۲۰۱۷)، رەخنەى ئەدەبى سەدەى بیستەم، رەخنەى ئەدەبى هونەرى هەلسەنگاندنى دەقى ئەدەبى، وەرگێرانی ریبین هەردى، چاپخانهى سەردەم، چاپى یەكەم، سلیمانی.

سالج، ئاوارە كەمال (۲۰۱۲)، میتۆدى رەخنەى كۆمەلایەتى و پراكتیزەکردنى لە شەئەرى گۆراندان، چاپى یەكەم، چاپخانهى حاجى هاشم، هەولێر.

مەعرف، كەمال (۲۰۱۲)، تیۆرە نوێیەكانى رەخنەى ئەدەبى، چاپخانهى دەریا، سلیمانی. مەنتك، حەمە (۲۰۱۸)، میتۆدەكانى رەخنەى ئەدەبى، چاپخانه نوسینگەى تەفسیر، چاپى یەكەم، هەولێر.

نوورەدین، بوار (2021)، بیلۆگرافیای رۆژنامەى چاودێر (۴/۱۰/۲۰۰۴ \_ ۲/۴/۲۰۱۸)، چاپى یەكەم، چاپخانهى تاران، تەهران.

### گۆفار:

قادر، ریبین خەلیل (۲۰۱۱)، میتۆدى رەخنەى كۆمەلایەتى لە لیکۆلینەوهى ئەدەبدا، گۆفارى رامان، ژمارە (۱۶۷)، هەولێر.

### سەرچاوهى عەرەبى:

شراد، شلتان عبود (۱۹۸۸)، مدخل الى النقد الادبى الحديث، دار مجدلاوى للنشر، ط ۱، عمان فضل، صلاح (۱۹۹۸)، مناهج النقد المعاصر ومصطلحاته، مبرت للنشر و معلومات، القاہرہ.

### وتارەكانى رەخنەى چاودێر:

ئیبیراھیم، ھیدایەت (۲۰۰۵)، كەسیتی ژن لە شەئەرى گریانى ھەنارى قوبادى جەلى زادەدا، ژمارە (۴).

ئەحمەد، محمد نوری (۲۰۰۵) پیرەمێرد و پڕۆزەییەكى نوێگەرى لە شەئەرى نوێى كوردیدا، ژمارە (۱).

كەرىم، ئازاد عبدولواھید، (۲۰۰۶)، ئەسیری لەنیوان ناسیۆنالیست و ئایدیای نالیستیدا، ژمارە (۶۲).

میرە، ئەحمەد (۲۰۰۸)، پەیوەندى نیوان ئەدەب و كۆمەلگە بەپێى میتۆدى سۆسیۆلۆژى میژوووی، ژمارە (۱۰۸ - ۱۰۹).



Nirxandina Sempozyûmê  
Sempozyum Değerlendirmesi  
Symposium Review

## V. SEMPOZYÛMA NAVNETEWYÎ YA KURDIYATÊ MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ & ALEKSANDRE AUGUSTE JABA Û MÎRASA WAN 30-31/05/2024

Sinan ÇAKAR

### Sinan ÇAKAR

ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr  
Dr., Department of Kurdish Language and Literature,  
Faculty of Letters, Van Yüzüncü Yıl University, Türkiye.

### Citation/Jêgir/Atrf:

Çakar, S. (2024). Nirxandina V. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê: Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan. Kurdiyat (9), 113-120. DOI: 10.55118/kurdiyat.1495360

### Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Symposium Review/Nirxandina Sempozyûmê/Sempozyum Değerlendirmesi

Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 03.06.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 25.06.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.06.2024

### Peer-Review/Hekemî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı Kör Hakemlik-İki hakem

### Reviewing and Plagiarism/Nirxandin û İntihal:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./ Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatîye derbaskirin./ Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

### Ethical Statement/Beyana Etik/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanîn û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etik hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têtûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunduğu beyan edilir.

### Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendîyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

### Grant Support/Alîkarîya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

### Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Enstîtûya Zimanên Jîndar a Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê di sala 2012an de hatîye damezrandin û di sala 2013an dest bi karûbarên xwe kirîye. Heta niha gelek xwendekarên ji vê enstîtûyê pîleya masterê wergirtine û jê derçûne. Ji bilî karûbarên perwerdehîyê, di enstîtûyê de gelek xebat û organîzasyonên akademîk jî tên lidarxistin. Yek ji van xebatan jî sempozyûmên navnetewî ne. Pêşengên edebîyata kurdî weke tema di van sempozyûman de tên hilbijartin. “Sempozyûma Zanîstên Îslamê yên bi Zimanê Kurdî” weke yekemîn sempozyûm hatibû lidarxistin. Piştî vê, di sala 2021an de “II. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê Ehmedê Xanî û Mîrasa Wî”, di sala 2022an de “III. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê Feqiyê Teyran û Mîrasa Wî” û di sala 2023an de “IV. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê: Melayê Cizîrî û Mîrasa Wî” ji van rêzesempozyûman bûn. Îsal jî di 30-31ê Gulanê de V. Sempozyûma Navnetewî ya Kurdiyatê bi temaya “Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan” hate lidarxistin. Ji hêla lijneya sempozyûmê 35 teblîx hatibûne qebûl kirin. Beşdarvan hem bi awayê onlîne û hem jî rûbirû beşdar bûn. Sempozyûm bi heşt rûniştinan û du rojan berdewam kir. Ji bilî lêkoler û akademîsyenên ji zanîngehên Tirkîyê, ji Almanyayê Philipp Bernert, Swêdê Mahir Taha, Swîsreyê Perwîz Cîhanî, Georgiyê Mariam Gureşidze, Hollandayê Michiel Leezenberg, Iraqê Tehsin İbrahim Doski û Rûsyayê Anjelika Pobedonostseva bi teblîxên xwe ve beşdar bûn.

Sempozyûm di bin berpirsiyarîya Yakup Aykaç de; Abdulhadi Timurtaş, Haşim Özdaş, Sinan Çakar, Mustafa Acar û Hacı Yılmaz ji zanîngeha Wanê bûn ku di lijneyê de cih girtin. Herwiha Zafer Açar ji zanîngeha Bingolê piştgirîya lijneyê kir. Ji bilî van kesan lêkolerên wek Mehmet Nur Yavuzer, Sami Çeliktaş, Mehmet Yıldırımçakar û M. Xalid Sadîni jî di lijneya lidarxistinê de peywirdarbûn.

Sempozyûm bi alîkarîya hin kesayet û sazîyan pêk hat. Rektoriya Van Yüzüncü Yilê ji bona beşdaran cihê mayîne û salona Cengîz Andîçê terxan kir. Herwiha VAN-TSO, Weşanxaneyê Peywend, Urartu Yapı û Vamede û hinekên din bûne sponsorê sempozyûmê.

Temaya sempozyûmê li derdora pêwendîya Mela Mehmûdê Bazîdî û Aleksandre Auguste Jaba de pêk hat û li dor vê yekê gelek pêşkêşî hatin teblîx kirin. Ne tenê li ser pêwendîya wan; li ser arşîva St. Petersburgê ya ku ji hêla van her du kesayetên ve hatîye tomarkirin; bû mijara sempozyûmê ya sereke. Serokê lijneya lidarxistinê Yakup Aykaç, gerîndeyê enstîtûyê Abdulhadi Timurtaş, alîkarê rektor Murat Kayrı, serokê VAN-TSOyê Necdet TAKVA, serokê Urartu Yapıyê Abdullah Aras, lêkoler M. Xalid Sadîni, Abdurrahman Adak û Ziya Avcı axiftinên sempozyûmê yên destpêkê kirin.

Yakup Aykaç di axiftina xwe de mebesta lidarxistina sempozyûmê anî ziman û armanca sereke arşîva St. Petersburgê derxînin holê û da ku di zanîstê cîhanî da bê nîqaş kirin. Herwiha Aykaç bal kişande ser pêwendîya kurd û rûsan. Li gorî wî, rûsan bi çavekî kolonyalîst û oryantîst xebatên kurdolojîyê lê nihêrîne û ji ber vê yekê jî serê ewil Jaba jî wek peywîr ev karê hanê hilgirtîye ser xwe. Lê pişt re her ku çûye pêwendîya Jaba û Bazîdî germtir bûye û Jaba bi dil can ev kar meşandîye. Li gorî Aykaç; Jaba berhevkarîya keresteyên kurdolojîyê bi hezkirin rêve dibe. Vê yekê jî di nameyên xwe yên ku ji bo hin hevalên xwe yên kurdolog de -ên wek Peter Lerch re şandî- tîne ziman û di van nameyan de Jaba, Bazîdî weke seydayê xwe pêname dibe.

Gerîndeyê enstîtûyê Abdulhadi Timurtaş di axiftina xwe de rola enstîtûyên zimanê jîndar anî ziman û li gorî Timurtaş bi rêya van enstîtûyan xebatên kurdolojîyê gihîştine astekî bilind. Timurtaş, Jaba û Bazîdî wek du kaşîfên gencîneya kurdî pêname kirin.

Abdurrahman Adak li ser sempozyûmê axiftineke dirêj kir û di axiftina xwe de Bazîdî li gelek alîyan ve nirxand. Adak di axiftina xwe de anî ziman ku Bazîdî bi gelek alîyan de weke pêşeng karê xwe encam daye. Cara yekem tezkîreyek bi zimanê kurmançî ku tê de qasî bîst helbestvanan cih girtiye ji aliyê Bazîdî ve hatiye nivîsîn. Berhemên edebîyata klasîk jî dîsa di vê serdemê de ji aliyê Bazîdî ve hatine berhevkerin. Bazîdî li ser folklorê kurdî, ferheng, fêrkirina zimanê kurdî, dîroka kurdî hin berhem nivîsîne. *Şerefname* wergêrandîye kurdî û li vê yekê jî nesekîniye pirtûkeke din ya li ser dîroka kurdî bi navê “Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan” nivîsandîye. Ji ber van taybetmendîyên xwe ve Bazîdî wek muellif, mutercim, berhevkar, civaknas, etnolog û ferhengnûs e. Bi vî şiklî wek kesayetekî pîralî derdikeve pêş. Ji ber vê yekê jî li gorî Adak; xebatên Bazîdî di nava kurdan de dibe yekemîn qonaxa destpêka zanistên civakî. Adak herwiha dîyar kir ku ev arşiv bi şîyana Bazîdî ve pêk hat. Bazîdî jî ev şîyan û hêza xwe ji paşxaneya Bazîdê wergirtiye ku ev paşxane ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye danîn. Li ser pexşannûsiya Bazîdî jî Adak dîyar kir ku Bazîdî feyza xwe ji Elîyê Teremaxî hildaye. Li gorî Adak xebata Jaba di wê serdemê de dikeve şûna desthilatdarîya kurdan.

Di sempozyûmê de beşdarvan û mêvanê rûmetê jî Ziya Avcî bû. Avcî wek ku tê zanîn ji bilî kar û xebatên cuda bi taybetî jî li ser vê arşivê xebitiye. Berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradîye* û *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmançî* ji aliyê Ziya Avcî ve hatine amadekirin û çapkirin. Avcî hem bi xebatên xwe yê di biwarê kurdolojîyê û hem jî xebatên xwe yê navborî ve ji hêla lijneyê ve weku mêvanê rûmetê hatibû vexwendin. Avcî, qala serpehatîya xwe ya amadekirina van berheman kir û di axiftina xwe de giringî û rola van çalakîyan dîyar kir ku di pêşketina edebîyata kurdî de wê bibin bingeş.

Sempozyûm di çapemenîyê de jî cîyekî berfireh girt û ji aliyê gelek ajansan ve hate şopandin. Hem çapemenîya heremî û netewî de û hem jî çapemenîya navnetewî de di derbarê sempozyûmê de gelek nûçe hatine belavkirin. Yek ji van ajansan jî Rûdaw bû. Rûdaw her dû rojên sempozyûmê jî bi eleqeyekî mezin beşdar bû bi gelek akademîsyenan re hevpeyvîn pêk anîn û nûçeyên sempozyûmê wek “Li Wanê li ser Mela Mehmûdê Bazîdî Aleksandre Jaba sempozyumek tê lidarxistin” û ev nûçe di malperên xwe de jî da weşandin. TRT Kurdîjî beşdarê sempozyûmê bû û hevpeyvînen sempozyûmê li ser malperên xwe belav kirin. Di sempozyûmê de ajanseke din jî ajansa Dengê Amerika VOA Kurmanji bû. VOA Kurmanji di “Bernameya Nû ya Heftrengê” de dîmenên ji sempozyûmê bi awayekî berfirehî dan nîşandan. Ji xeynî van ajansan, ajansên heremî yê wek Şehrivan, Vanekspres, Gazetevan û hwdli ser malperên xwe cih dane sempozyûmê.

V.Sempozyûma Kurdiyâtê Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan têr û tijî bû û her awayî mijar hatine nirxandin. Qadên curbicur lêkoler beşdar bibûn û vê jî rengîni û dewlendamîyek dabû sempozyûmê. Beşdarên sempozyûmê ne tenê di qada kurdîyolojîyê de bûn; ji dîroknasan heta civaknas û îlahîyatnasan ev curebûn zêdetir kiribûn. Ji ber vê yekê jî sempozyûm weke sempozyûmeke înterdîsîplîner derkete pêş. Ji bilî van mijaran; mijarên li ser edebîyatê jî ji hev cihê bûn. Hem teblîxên mijarên modern û hem jî yê klasîk û zimannasîyê jî hebûn. Di sempozyûmê de hin lêkoleran jî li ser xebatên rûsan yê kurdolojîyê teblîxên xwe pêşkêş kirin. Teblîx ne tenê kurdî bûn herwiha teblîxên tirkî û îngîlîzî jî di sempozyûmê de hatine pêşikêşkirin. Ji van teblîxan bîst û pênc heb kurdî, neh heb tirkî û yek jî bi îngîlîzî bû.

Xebata Mela Mehmûdê Bazîdî û Aleksandre Auguste Jaba di cîhana zanistî de weke koleksiyona Jaba yan jî wek arşiva Jaba tê pênasekirin. Ji ber vê çendê jî mijarên sempozyûmê her çiqas

curbicur jî bin lê piranîya wan li ser vê koleksiyon/arşîvê bûn. Em dikarin di sempozyûmê de teblîxên ku derketine pêş wiha bidin nasandin. Michiel Leezenberg bi teblîxa ya bi navê “Mela Mehmûdê Bazîdî û Rojhilatnasên Rûsan” de li ser pêwendîya kurd û rojhilatnasên rûsan sekînî. Leezenberg dîyar kir ku Bazîdî ne tenê ji bo kurdan û edebîyata kurdî herwiha ji bona rojhilatnasîya rûsan jî kesayetekî giring e. Leezenberg nihêrîna oryantalist ya li hemberî kurdan jî weke karekî kolonyalist pênase kir. Li gorî wî Bazîdî kamîlbûna xwe ji paşxaneya berîya xwe digire. Di nava kurdan de berîya Bazîdî kevneşopîya hişmendîyeke kurdî heye û Elîyê Teremaxî, Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî pêşengên vê kevneşopîyê ne. Fîrat Sözerî teblîxa xwe ya bi navê “Simmon Palas’tan Aleksandre Jaba’ya Rusya’da Kürdoloji’nin Ana Merhaleleri” li ser dîroka pêwendîya rûs û kurdan amade kiribû û di vê çarçoveyê de qala serborîya kurdolojîya Rûsyayê kir. Sözerî anî ziman ku bi awayekî giştî tê zanîn ku pêwendîya rûs û kurdan di sedsala 18an de dest pê dîke. Lê li gorî Sözerî di çavkanîyên erebî de pêwendîya van her du gelan digihije sala 943an. Bi awayekî zanistî li derdora salên 1782-83an yekem car xebatên ferhengnasîya kurdî tên kirin û ev dîrok berîya Garzonîyê Îtalî ye. Li rûsyayê merhaleyêke giring jî weşandina *Şerefnameyê* ye. Piştî şerên navbeyna Îran û Rûsyayê, ji pirtûkxaneya Erdebîlê rûs gelek berheman dibin Rûsyayê. Yek ji van berheman jî *Şerefname* ye. *Şerefname* cara ewil li Rûsyayê di sala 1862an de bi farisî tê weşandin dûv re jî 1868an frensî tê weşandin. *Şerefname* herwiha ji wendabûnê tê parastin. Sözerî di pêwendîya rûs û kurdan de mînakêk din jî li ser şerê Qirimê dest nîşan dîke. Di derdora salên 1870an de vê carê kurdologêkê din Solomon Adamoviç Yegîzorov wek kesayeteke muhîm derdikeve pêş. Sözerî, Yegîzorov û berhema wî ya bi navê “Di Nava Kurdan 12 Sal” çavkaniya sereke ya kurdolojîya nûjen a Rûsyayê pênase dîke. Yegîzorov diwazdeh salan li Erîvanê di nava kurdan de dimîne û kurdan ji nêz ve nas dîke. Di vê hevnasînê de Yegîzorov di warê çand û ziman de gelek daneyên giring dest dixê.

Li ser xebatên kurdolojîya Rûsyayê teblîxeke din jî ji aliyê Anjelîka Pobedonostseva hatibû amadekirin. Pobedonostsewayê teblîxa ya bi sernavê “19.yy’da Rusya’da Kürt Araştırmaları” pêşkêşkir. Pobedonostsewayê helwesta rûsan ya sedsala 19an ya li hemberî kurdan anî ziman û di derbarê van xebatên wan de hin kurdolog derxistin pêş. Herçiqaq wek kurdolog neyê pênase kirin jî di vê serdemê de Aleksandre Puşkîn jî mirov dikare qal bike. Li rûsyayê cara ewil kurdên êzîdî di berhema Puşkîn ya bi navê “Rêwitiya Erziromê” de derbas dibe. Pobedonostsewayê dîyar kir ku di vê serdemê de kurdologê herî namdar û çalak jî Peter Lerch e. Necat Keskin jî wek mijar dîsa sedsala 19an hîlbijartibû. Di pêşkêşîya xwe ya bi navê “Biçavê “jihundir” û “jîderve” etnografîyaya kurdan a sedsala 19mîn: Bazîdî û Millingen” de li ser çavdêrîyên Mela Mehmûdê Bazîdî û Major Frederick Millingen ên di derbarê kurdan de axivî. Keskin nihêrîna van her du kesayetan bi du terman anî ziman û yek ji van terman *emîk* û ya din jî *etîk* e. Ji çavekî hundir ve vegotina çand û jîyana gelekî re *emîk*, ji nihêrîna çavê derve jî *etîk* tê gotin. Bi vî awayî Bazîdî dibe çavekî *emîk* û Millingen jî dibe çavekî *etîk*. Millingen di rêwitiya xwe ya Erziromê ber bi Wanê de di derbarê jîyana kurdan de gelek daneyan berhev dîke û van daneyan di sala 1870an da li Londrayê bi sernavê *Wild Life Among Koords* dide çapkirin.

“Berhemên Perwerdeya Kurdîya Kurmancî” ev teblîx ji aliyê Tahirhan Aydın ve hate pêşkêşkirin. Aydın, di vê teblîxa xwe de bala xwe dabû biwarê perwerdeyê di berhemên Bazîdî de. Aydın, bo vê yekê jî berhemên Bazîdî yê *Rahênanên Zimanê Kurdî*, *Qewa ‘îdêd Serfa Kurdî (I û II)*, *Sefheî Sibyan* û *Tuhfetu’l-Xullan fi Zimanê Kurdan* ji bona teblîxa xwe wek mînak hîlbijartibûn. Ev berhemên navborî hem ji bona hînkirina kurdîya kurmancî, hînkirina alfabeya kurdî-erebî

û rêzimana kurdîya kurmancî hatine amadekirin.

Phillip Bernert di pêşkêşîya xwe de li ser berhema Mela Mehmûdê Bazîdî ya *Kitaba Tewarîxê Cedîdê Kurdistan* sekinî. Li gorî Bernert ev berhem di salên 1858-59an da hatîye nivîsîn. Berhem niha ne li ber dest e. Tenê em pê haydar in ku Jaba di derbarê vê berhemê de di salên 1867an û 1881an de hin agahîyan dide û li gorî saloxdayînên Jaba xwe ev berhem di wê serdemê de wer-gêrandîye zimanê frensî. Bernert neql dike ku Jaba vê berhemê weke berdewamiya *Şerefnameya Şerefxanê Bîdlîsî* dibîne. Mijareke din jî di derbarê *Tewarîxê Cedîdê Kurdistanê* de ji aliyê Kenan Subaşî ve hate pêşkêşkirin. Subaşî di vê pêşkêşîya xwe de li ser mijareke evînî ya Xelîl Beg û Têlî Perîşanê sekinî. Ev destana evînî li gorî ragihandinên Jaba di berhema Mela Mehmûdê Bazîdî de derbas dibin. Kenan Subaşî jî li ser vê yekê îddîa dike ku Bazîdî di nivîsîna berhema xwe ya dîrokî de ji tarîxa devkî jî istifade kirîye. Subaşî dibêje “Çimkî Bazîdî hem behsa Xelîl Beg û Gewrê û esl û esasên wan dike hem jî şêst sal piştî rûdanê stranên ku li ser navê Gewrê û Xelîl Beg ên di nav gel da belav bûne, berhev kirine û bi me ra parve kirine.” Serdar Canan jî bi sernavê “Bi çavekî Etno-Muzîkolojîk Vekolana Serhatî û Varyasyona Şekir Axa di Arşîva Jaba de” teblîxek pêşkêşî kir. Canan, bi vê pêşkêşîya xwe bi taybetî bal kişande aliyê etno-muzîkolojîya xebatên kurdolojîyê. Ji ber ku gelek caran gava dibêjin kurdolojî bêtir di hişê mirovan de ziman, edebiyat û dîrok çêdibe. Ji vî aliyê ve pêşkêşîyeke cihê bû. Wî di vê pêşkêşîyê de li ser serhatî û guhertoyên nimûneya Şekir Axa rawestîya û li dor etno-muzîkolojîyê nixandinek kir.

Mikail Bûlbûl jî bal kişandibû ser mijarên zimannasî yê. Bûlbûl, di berhemen Bazîdî yê *Tuhfetul Xîlan fî Zîmanê Kurdan, Kêşana Karên Kurdî* (1866) û *Xeberdana Zîmanê Kurmancî* ye (1865) de li ser mijara ristesazîyê rawestabû. Li gorî Bûlbûl ev berhemen navborî da ku Mela Mehmûdê Bazîdî Jaba hînî kurdî bike hatine amadekirin. Perwîz Cîhanî jî dîsa weke mijareke zimannasîyê li ser devokan axivî. Cîhanî bi navê “Devokên Şêwezare Kurmancî û Devoka Mela Mehmûdê Bazîdî” teblîxa xwe pêşkêş kir. Cîhanî anî ziman ku mirov dikare bibêje her eşîreteke kurdan xwedîyê devokeke cuda ye. Herwiha li gorî Cîhanî Mela Mehmûdê Bazîdî di berhemen xwe de devoka Elbakê bi kar anîye. Cîhanî herwiha dîyar kir ku ji nivîsên Bazîdî kifş dibe ku Bazîdî ji eslê xwe ne ji Bazîdê ye.

Îlyas Suvağci “Mijara Jina Kurd di Adat û Rusûmatnameyê Ekradîyeyê de” berê xwe dabû mijara jinê. Suvağci di vê mijarê de çend taybetmendiyên sereke derxistin pêş. Yek ji van mijaran jî zewac bû. Di zewaca jinan de vîneke jinan nebûye û jin bi xwesteka bav û birayên xwe zewicîne. Herçend di warê zewacê de îmaja jinan ya bi vî rengî hebe jî lê di têkilîyên rojane de jin bi mêran re mil bi mil ketine şer, car bûye birîndar bûne û car bûye hatine kuştin. Suvağci ji Bazîdî neql dike ku jinên kurdan weku jinên frensî serbest û aza bûne. Mijarek heman awayî ji aliyê Leyla Kaplanê ve hate pêşkêşkirin. “*Jin ji Alîyê Zayenda Civakî ve di Adat û Rusûmatnameê Ekradiye de*” Kaplan di teblîxa xwe de li ser zayendê rawestabû û zayend weke mefhûm rave kir. Statûya jinê bi nihêrîn û neqilkirina Bazîdî anî ziman.

Hakan Kaya, teblîxa xwe ya bi sernavê “Rewşa Sosyo-Polîtîk a Mîrektîya Kurdan di Sedsala 19an” de bal kişande mijarên dîrokî yê serdemê û rewşa Bazîdê ya wê serdemê rave kir. Li gorî Kaya Mîrektîya Bazîdê piştî şerê Çaldêranê li derdora 1578an tê avakirin. Ji sedsala 16an heta 19an heta Fermana Tanzîmatê, Mîrektîya Bazîdê vê statûya xwe didomîne. Bazîd di van sedsalan de di navbera Osmanî û Îranê piştî sedsala 19an jî di navbera Osmanî û Rûsan de dibe qada şer. Herhiwa lêkoler Nihat Gültekin jî di teblîxa xwe “Çend Belgename derbarê Mela Mehmûdê

Bazîdî da” de li ser belgenamêyên derbarê jîyan û kesayeta Mela Mehmûdê Bazîdî sekinî. Li gorî Gültekin, Bazîdî di serdema xwe de yekî navdar e. Bazîdî berîya ku Jaba nas bike di herêmê de pir tê naskirin. Li ser vê yekê jî Gültekin, bîranînên rojhilatnasê polonî, di kovareke Ewropî de hatibûne weşandin, seyaheta xwe ya di derbarê bajarên wek Qers, Erzirom û Bazîdê de qala Mela Mehmûdê Bazîdî jî dike. Zaremba, Bazîdî weke melayê kurd, zanayê hêja û alimê herî mezin dide nîşandan.

Di sempozyûmê de berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî ji gelek alîyan ve hatine nixandîn. Yek ji van berhemên jî hikayetên Bazîdî bûn. Remezan Alan û Umran Altinkılıç hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî ji hêla form û têşeya wan ve nixandîn. Alan, “Serpêhatî û Cihê Camî’eya Hikayetan di Hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî de” hem hikayetên Bazîdî û hem jî di çanda kurdî de şeweya hikayetan pêşkêş kir. Wî diyar kir ku di kurdî de “serpêhatî” bo çîrokên rasteqîn hatîye gotin. Ev yek xwe di çîrokên Bazîdî de jî dide der. Di vî cureyî de mebesta vegotina tecrûbeyan heye. Ev çîrok dersa tecrûbeyekê yan jî nixekî exlaqî vedigêrîne. Umran Altinkılıç jî di teblîxa ya bi sernavê “Hêmanên Vegêranên Modern di Hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî de” de angaşt kir ku hikayetên Bazîdî “çîrûskên” çîroka modern di hewînî û herhiwa hikayetên Bazîdî di navbera hikayetên gelêrî û çîroka modern de rola pîrekê digirin. Li gorî Altinkılıç, ev çîrok di nava xwe de homojenîyekê nahewînî. Ji aliyê form û naverokê ve curbicur in. Hin çîrok dişibin destanên kurdî û hinek jî di forma çîrûskan de ne. Lê hin çîrokên Bazîdî ji hêla dem, mekan û vegêrandinê ve “di navbera çîrokên gelêrî û çîrokên modern de wek formekî navberî xuya dikin”.

Serdar Şengül bi teblîxa xwe ya bi navê “Mela Mehmûdê Bazîdî, Ram Bam Basu Tevlîbûna li Pexşana Dinyayê” de Mela Mehmûdê Bazîdî û Ram Bam Basu Bengalî weke du kesayetên wekhev da şayesandin. Li gorî Şengül, çîroka Mela Mehmûdê Bazîdî û ya Ram Bam Basu dişibe hev. Ram Bam Basu li Bengala Hindistanê jîyaye. Rola ku Bazîdî di dîroka edebîyata kurdî de girtî Basu jî di edebîyata Bengalîyan de hilgirtîye ser xwe. Şengül diyar kir ku gelên xwedî dewlet û xwedî dîrok heman demê de xwedîyê pexşanê ne. Xwedîbûna dewlet û xwedîbûna pexşanê li gorî felsefeya Hegel ji bo gelekî asta pêşketinê dide nîşandan. Piştî ku felsefeya Hegel belav bû û weku heqîqet hat qebûl kirin gelek kes hewl dan di dîroka xwe de pexşanê peyda bikin. Lewra hebûna pexşanê xwedîbûna dewletê diyar dike. Ram Bam Basu li ser daxwaza mîsyonerê Îngîlîz William Carey dîroka qralîya Bengalê dinivîse û ev berhem ji bona Hindî û Bengalîyan dibe destpêka pexşannûsîyê. William Carey di vê derê de di dewsa Jaba de derdikeve holê.

Tehsîn Îbrahîm Doskî di teblîxa xwe de li ser berhemên Ehmedê Xanî yê di arşîva Jaba de ne sekinî. Li gorî Doskî, bi saya Bazîdî û arşîva Jaba gelek berhemên destnivîs yê edebîyata kurdî hatine parastin û gihiştine roja me. Di arşîvê de behsa çardeh helbestvanên wek Melayê Cizîrî, Elîyê Herîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Miradxaê Bayezîdî û hwd tê kirin. Doskî herwiha got ku wî, di kar û xebatên xwe de gelek mifa ji vê arşîvê hildaye. Doskî dibêje ku 55 destxetên ku yê xwe gihandî de 16 hebên wan bi berhemên Xanî ve pêwendîdar in. Di arşîvê de 8 destnivîsên Mem û Zînê peyda dibin.

Mijareke sereke jî di sempozyûmê de mijara ferhengnûsî û alfabeyê bû. Li ser vê yekê sê pêşkêşî hatine kirin. Mehmet Yonat pêşkêşîya xwe ya bi navê “Elîfba û Alfabeya Bazîdî” de li ser alfabeyê sekinî. Yonat ji Farouk Ismaîl neql dike ku di koleksiyona Jaba nimreya “kurd “6”ê de qala alfabeyekê tê kirin. Li gorî Yonat “Lê esasê xwe de ev elîfba ne ji bo xwendina bi kurdî bi tîpên erebî lê xwendina erebî bi tîpên erebî lê bi terîfa kurdî ve hatiye nivîsîn.” Yonat herwiha



fonksiyona vê alfabeyê hem di berhemên Bazîdî de û hem jî ji bona zimanê kurdî nirxandinên xwe anîn ziman. Ümit Işık jî li ser ferhenga Jaba pêşkêşîya xwe kir. Li gorî Ümit Işık, Jaba ferhengeke Kurdî-Fransîzî, Fransîzî-Rûsî-Kurdî û Kurdî-Fransîzî-Rûsî çêkiriye. Di vê ferhengê de bi qasî 15000 peyv hene û ferheng bêpergalî hatîye amadekirin. Işık, di vê pêşkêşîya xwe de li ser termên folklorîk sekini ka çawa hatine berhevkerin û di ferhengê de çawa cih digirin. “Latînîzasyon di Ferhenga Kurdî-Fransî ya Auguste de Jaba de” Sevda Orak Reşitoğlu li ser ferhenga Jaba ya ku bi alîkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî amade kirîye pêşkêşîya xwe kir. Reşitoğlu dîyar kir ku ev ferheng di sala 1879an li St. Petersburgê bi fransî-kurdî çap bûye. Di ferhengê de peyvên kurmancî hem bi tîpên erebî û hem jî bi tîpên latînî hatine nivîsîn. Ne tenê herfên latînî û erebî hin alfebeyên din jî herf hatine bikaranîn. Reşitoğlu anî ziman ku di vê ferhengê de zayend tune ye. Hebekî nêzê mijara ferhengnûsî û alfbayê Mustafa Aslan jî li ser wergêrvanîya Jaba sekini. Aslan teblîxa bi ser navê “Nirxandinek Giştî li ser Rêbaza Aleksandre Jaba ya Wergerên Kurdî Bo Frensî” amade kiribû û di xebata xwe de li ser rêbaza Jaba rawestabû.

Di sempozyûmê de kesayet û rola Aleksandre Auguste Jaba zêdetir lêkoler piranî li ser kesayet û berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî rawestan. Ji bilî koleksiyona Jaba hin lêkoler jî rewşa sîyasî ya serdemê weke mijar derxistin pêş û di vê çarçoveyê de jî rewşa mîrektîya Bazîdê ya wê serdemê hate nîqaşkirin.

Sempozyûm bi du rojan berdewam bû û di roja dawî de jî bi moderatorîya Abdulhadi Timurtaş, Abdurrahman Adak, Tahirhan Aydın, Michiel Leezenberg û M. Xalid Sadînî sempozyûm nirxandin. Tahirhan Aydın qala serborî û serencama arşîva Jaba kir û daxwaz û hêvîyên xwe anîn ziman ku berhemên di vê arşîvê de weke faksimile ji aliyê Wezareta Çandî ya Turkiyeyê ve bîn çapkirin. Aydın, pêşnîyaz kir ku sala bê li ser *Şerefnameyê* û dîroka kurdan sempozyûmeke nû bê lidarxistin. Abdurrahman Adak dîyar kir ku berîya van berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî kurd di çavên Ewropîyan de weke miletekî folklorîk dihatin dîtin. Lê piştî van berhemên Ewropîyan fehm kir ku kurd xwedîyê çandekî nivîskî ne. Li gorî Adak, Mînskî di amadekirina mijara kurdan ji bona Ansiklopedîya Îslamê de paşxane û çavkanîya xwe xebatên Bazîdî wergirtîye. Li gorî dîyarkirina Adak, ger mirov bixwaze qala çand, ziman û edebîyata kurdî bike divê mirov vê yekê weke berîya Bazîdî û piştî Bazîdî dabeş bike. Di serdema klasîk de vekolînên herî ilmî û zanistî ji aliyê Bazîdî ve hatine pêk anîn. Li ser vê xalê Adak îddîa kir ku xebatên ku Bazîdî pêkanîne di wê serdemê de di edebîyata tirkî de jî nehatine dîtin û kirin. Abdulhadî Timurtaş jî li ser rewşa akademîya kurdî rawesta û li gorî wî xebatên akademîya kurdî ghiştîne asteke bilind. Herwiha Timurtaş bang li qadên zanistên din jî kir; gotar û nivîsên xwe bi kurdî binivîsin da ku di wan qadan de jî termînolojîyeke kurdî ava be.

### Encam

Di vê sempozyûmê de Mela Mehmûdê Bazîdî wekî pêşeng û nirxekî edebîyata kurdan ê veşartî, ji her alî ve hate nirxandin. Ev xebat ji bo nasîn û danasîna koleksiyon Jaba hêz û hêvîyên mirov zêde dike. Lewra gelek mijarên giring û gelek teblîxên hêja hatin pêşkêşkirin. Mirov dikare bibêje ku Enstîtûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê di vê qadê de kedekî mezîn derxistîye holê. Bi rêya van rêze sempozyûman hem mijar û şahkarên edebîyata kurdî tîn guftûgokirin û hem jî rol û rista wan di zanista akademîyê de tê pêşkêşkirin. Ji keynî vê yekê di vê sempozyûmê de jî me dît ku ev çalakîyên edebî yên bi vî rengî bi xwe re tevgerêkî jî ava dike. Lewra ji gelek zanîngehan lêkolerên kurd û kurdologên bîyanî tîn ba hev û hevnasînek pêk tê.

Ger em li ser vê sempozyûmê bibêjin, beşdarîbûna Michiel Leezenbergê hollandî û Anjelîka Po-bedonostseva'ya rûsî mirov dikare weke mînak nîşan bide.

Curebûna teblîxan jî nîşan da ku Mela Mehmûdê Bazîdî kesayeteke giring e û karê ku bi Aleksandre Auguste Jaba re jî kirî ji bona dîroka edebîyata kurdî karekî pîroz e. Bi vî awayî jî derkete holê ku Bazîdî her çend bi alîkarî û piştgirîya Jaba ev karê hanê pêk anî be jî lê mirov dikare bibêje di warê çand, edebîyat û dîroka kurdî de Bazîdî jî şareza bûye.

Wek encam em dikarin bibêjin ku di vê sempozyûma navneteweyî de li ser mijarên wek dîrok, cîvaknasî, mûzîk, çand û edebîyata kurdî gelek pêşkêşiyên giranbiha hatine vegotin. Herwiha hem ji hêla beşdaran ve û hem ji ji hêla naverokê ve ev sempozyûmeke dewlemend bû. Em hêvîdar in ku dê ev rêze sempozyûm di sala bê jî berdewam bibe.

## ÇAVKANÎ

Vîdeoyên YouTubeê yên V. Sempozyûma Navneteweyî ya Kurdiyatê Mela Mehmûdê Bazîdî & Aleksandre Auguste Jaba û Mîrasa Wan.

[https://www.youtube.com/watch?v=eYELJditeu4&t=64s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=eYELJditeu4&t=64s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (23.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=u0V3CzgxHWU&t=37s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=u0V3CzgxHWU&t=37s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (23.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=9oMQFnaaBJs&t=286s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=9oMQFnaaBJs&t=286s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (24.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=ef6EN\\_ABpYY&t=5s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=ef6EN_ABpYY&t=5s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (24.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=j\\_G7sHTd9qY&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=j_G7sHTd9qY&ab_channel=KurdiyatDergisi) (25.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=5f9OeVpMgVg&t=3s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=5f9OeVpMgVg&t=3s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (25.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=mbwNBUI608o&t=13s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=mbwNBUI608o&t=13s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (26.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=bWGbrb8w1lc&t=2s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=bWGbrb8w1lc&t=2s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (26.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=s1CEtxWIDSI&t=4s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=s1CEtxWIDSI&t=4s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (27.06.2024).

[https://www.youtube.com/watch?v=kMvxO1A4\\_Jw&t=666s&ab\\_channel=KurdiyatDergisi](https://www.youtube.com/watch?v=kMvxO1A4_Jw&t=666s&ab_channel=KurdiyatDergisi) (27.06.2024).